Mele Yûnisê Helqetînî

Terkîb û Zurûf

SARA

LIV.-K.L.-K.A
4092

Mele Yûnisê Helqetînî

Terkîb û Zurûf

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

SARA

Terkîb û Zurûf
– Ji zencîra berhemên klasîkî yên kurdî 1

Mele Yûnisê Helqetînî
Bi tîpguherandina: Emîn Narozî

Weşanên SARA'yê
Dalagatan 42
S-113 24 Stockholm - Sweden
Tel / fax: +46 / +8 - 331 229

Weşanên SARA'yê
ISBN 91 87662 46 9

PÊŞGOTİN

Karê tîpguhertina Zurûf û Terkîba Kurdî ji mêj ve serê min tevî hev dikir, lê ji ber ku zimanê wan Kurdiyeke têkel û bi pirranî jî term û navlêkên Erebî bûn min qet li weşandina wan lez nedikir. Mebesta xebata min li ser herdu pirtûkan, amadekirina wan ji bo rêzimaneke Erebî ya nûjen bû ku di pêş de piştî azadiya Kurdistanê, di dibistanan de bihatina xwendin. Lêbelê, hem alozîya xebata li ser vî karî ku demeke dirêj dixwest û hem jî navtêdanên hin hevalên ku haya wan ji van berheman hebûn û rûmetê didan wan, dîtina min dane guhertin. Li gor wan baştir bû ku ev kitêb zû bigihana destê xwendevanan û mîna klasîkên din bubûna malê edebyata kurdî.

Di van kitêban de gelek navlêkên (termên) Erebî yên rêzimanî hebûn ku bi kêmanî be jî diviya bû ew bêne manekirin. Ji xwe qet pêwîst nake ku ez li vir qala zoriya dîtina wan terman bikim. Min ji bo Kurdiya van navlêkan gelek alîkarî ji rêzimana Kamuran Bedirxan, ji rêzimana dawiya ferhenga Kurdî-Turkî ya D. îzolî, hinek jî ji rêzimana Murad Cuwan a "Turkçe açıklamalı Kurtçe Dilbilgisi" û bi pirranî jî ji rojnameya taybetî ya Enstituya Kurdî ya Parîsê, "Kurmancî", sitand. Lê mixabin di van gişan de jî bersiva hemû terman nedihate dîtin û pêwîst bû ku hinek jî bihatina peydakirin. Ji ber vê yekê jî min hinek ji wan jî ji nav wanên ku hê ji dema xwendina van pirtûkan ve di bîra min de mabûn, bijart. Ez ji bo kêmasî û şaşiyên ku aloziya peydakirina van terman ew hê pirrtir kirine, ji hemû xwendevanan hêviya lêborînê dikim.

Zurûf û Terkîb du pirtûk ji wanên Kurdî ne ku beşek ji rêzimana Erebî şirove dikin. Ji ber ku herdu tîmî bi hev re bûn, li pey hev dihatin xwendin û jiberkirin, bi hev re dihatin nivîsîn û bi hev re jî çap bûne, li vir jî min ew ji hev veneqetandine. Heçî Zurûf li ser hokerên Erebî radiweste û wan bi şagirtiyên nû yên rêzimana Erebî dide zanîn. Herweha bi kurtî be jî ew rewşa hevokên zimanê Erebî, rewşa

tewange û netewangeya bêjeya û rewşa dawiya wan jî ji şagirtî û feqiyên rêzimana Erebî re rave dike.
Bes Terkîb bi tenê rûpelê pêşî yê "'Ewamil"a *'Ebd el-Qahîr el-Curcanî* (kitêbeke kurt a rêzimana Erebî ye), bi awayekî gellek fireh analîz û şirove dike û pê re jî li ser rêzimana Erebî, li gor cih û rewşê, gelek agahdariyên din yên berfireh û hêja dide xwendevanan.

Xeyn ji yên ku min berê jî dîtibûn, du çap û du destnivîsên van kitêban di destên min de hene. Min di karê tîpguhertina Zurûfê de teva da ber hev û cudahiyên wan di beşa ravekirinê de anî pêş çavên xwendevanan. Herçî herduyên çapkirî ne ew mîna hev in û ji wê bûnê jî min wan pêkve bi navê "Çapkirî" nîşandaye. lêbelê yên destxet min ew bi tîpa serê navê destnivîskarê wan binav kiriye, yanî "Destnivîsa H." û "Destnivîsa C.", bes "Destnivîsa H."wek bingeh hatiye girtin. Her weha ji bo terkîbê jî yeke destnivîs û du hebê çapkirî li cem min hene. Min wan jî da ber hev û bi navê yên çapkirî û ya destxet yan jî destnivîs daye. Di hinek cihan de cudahiya navbera wan tenê bi guherandina cihê lêkerê yan jî awayê (şeklê) wê çêbûye; Hinek caran jî ew cihêtî tenê bi "we" û "û" yê ye, ew cudahiyên wusa hûrik min nedane ber çav. Min bi tevayî ji bo tîpa (ج) û (ج) ya Erebî ev niçikê (nîşana) han " ' " û ji bo (ء)ya Erebî jî evê han " ' " bikaraniye. Min li vir di guhertina tîpan de ji standardên Ewrûpiyan bêhtir ên Kurdan dane ber çavên xwe û li gorî wê nivîsandiye. Ji xwe divê ez li xwe deynim ku ta niha ez rastî standardeke weha sererast jî nehatime.
Bi guhertina tîpên van berheman re, çewa li pêş jî bihûrî, min xwest ku tevî ferhengkirina navlêkan ez hebekî cih bidim wan qaîdeyên rêzimana Erebî ku nivîskar xwestiye bide zanîn û wan hê berfirehtir bidim nasîn. Bes ji ber tirsa dirêjiyê min di gelek cihan de dev ji dayîna mînakan berda. Lêbelê piştî vê raveya dirêj dema ez car din lê zivirîm û min xwe xiste dewsa yekî ku haya wî ji rêzimana Erebî ya serdema navîn tinebe, min dît ku têgihştina wê ne hêsayî ye û hingê ez covan (poşman) bûm ku li ser şiroveya wê ewqas rawestiyame û min gellekî wê jê derxist. Li gor xwestina wateyê di hinek cihan de jî min peyvikne piçûk li metnê kitêban zêde kirine û xistine nav kevanekê.
Min ew şirove wek not li bin metnê kitêban rêzkirine û bi xeteke nîvco ji wan veqetandine. Lewra diviya ku herdu tekst li cem hev bin ta ku meriv karibe wan rûbarî hev bike, nexwe têgihştina wan hê bêhtir zor dibe. Hernotek bi reqemeke ku ji metnên kitêban diçe, hatiye nîşandan lê carna jî dibe ku çend heb bi hev ve girêdayî bin û hingê jî reqemeke tenê

bo wan navlêkên Erebî daniye û di nav kevanekê de jî hem Erebiya wan û hem jî înglîziya wan nivîsandiye.
Min gotinên "Ewamila Curcanî" yên ku "Terkîb" wan şirove dike qalind nivîsandine, bes yên ku di metnê de tinin lê şirovekarî ew li gor wateyê jê hesab kirine dîsa qalind lê di nav dunikê de nivîsandine. Her weha bêje û hevokên Terkîbê ku di têbiniyan de tên jî qalind hatine nivîsandin.

Pir mixabin ku di van çapan tev de jî tu agahdarî li ser nivîser û li ser dema nivîsandina van berheman tine. Di vî warî de agahdariyên me bi tenê ew çend lêkolîn in ku li ser wîjeya kurdî çêbûne. Yek ji wan, lêkolîna Malmisanij ya li ser edebiyata Kurdî ye ku di kovara "Tarih ve Toplum" (Dîrok û Civak) de, di sala 1989'an de hatiye weşandin. Li gor wê lêkolînê ku ji D. Fuad hatiye wergirtin nivîsevanê kitêbên Terkîb, Zurûf û Tesrîfa Kurmancî M. Yûnisê Helqetînî ye. (1) Herweha di "The Encyclopeadia of Islam" beşa Kurdî de jî Mînorskî li ser devê A. Jaba vê yekê tîne zimên. Ew di çapa pêşî ya 1927'an de (mixabin ku ev agahdarî ji çapa dawî ya Ansiklopediya Islamî hatiye derxistin) dibêje ku "Elî Teremaxî rêzimaneke Erebî bi zimanê Kurdî nivîsandiye û Mele Yûnisê Helqetînî jî sê berhemên rêzimanî bi navê Tesrîf, Zurûf û Terkîb [li ser rêzimana Erebî bi Kurdî] li pey xwe hiştine. (2) Xeyn ji van jî M. Xeznedar di lêkolîna xwe ya li ser rêzimana Elî Teremaxî de diyar dike ku ji aliyê Mele Mehmûd Bayezîdî ve li ser wê pêşgotinek hatiye nivîsandin. Di wê pêşgotinê de Bayezîdî navê kitêbên rêzê ku hingê feqiyan dixwendin, li pey hev rêz kirine û di nav wan de Terkîb, Zurûf û Tesrîfê jî li ser navê Mele Yûnisê Helqetînî jimartine. (3)
Di dawiya berhema xwe ya Zurûfê de nivîser bi kurtayî hinek qala lêkemasiyê dike û piştre xwendevanan bi ser Tesrîfê ve dişîne. Wek ku min li wir jî got ger ku mebest pê ew kitêba Tesrîfê be şandina bi ser ve dide xuyakirin ku nivîserê herduyan yek e, lê bi rastî qet nayê bîra min ku di nav feqiyan de Tesrîf û Zurûf bi navê Mele Yûnis re hatibin gotin. Bes gelek caran "Terkîba mele Yûnis" dihate gotin, lê gere meriv têxe hesabê ku zimanê hersê berheman pir nêzî hev e heta meriv kare bibêje: "yek e" jî.
Herçendî rasterast nebe jî dîsa di mijara parenga çalak de şandiniyeke ku ji Zurûfê bi aliyê Terkîbê ve diçe, vê dîtina yekbûna nivîsevanê wan xurttir dike. Çiku ew di Zurûfê de dibêje: "îsmufa'il (parenga çalak) digel fa'ilê (kirde) xwe tenê di sê cihan de hevok e...". Dîsa di Terkîbê de di rûpelê 71-72'an de nivîser vê yekê car din bi hevokê "Ev e yek ji wan hersê cihê ku ..." ta dawî, tîne ziman û hersê cihan li wir jî li pey hev rêzdike.

Heçî Ebdur-Reqîb Yûsuf bi xwe di vî warî de hinek tevîhevî çêdike, çiku ew di "Şairên Klasîk ên Kurd" di rûpelê 23'an, di bahsa Mele Xelîlê Sêrtî de weha dibêje: " Her wusa kêtêbeke wî ya Kurmancî ya din jî heye ku navê wê Zurûf e" û wê dike malê Seydayê Mele Xelîl. Bes di cihekî din di rûpelê 24'an de jî ew weha dinivîsîne: "Dibêjin Mela Husên kurê Mela Mistefayê kurê Mela Xelîlê Sêrtî kitêba Zurûf nivîsiye"; lê ne diyar e ka kî vê yekê dibêje. Li gor wî (Ebd ur-Reqîb) "Tesrîfa Kurmancî" jî yan ya Elî Teremaxî, yan jî ya Mele 'Huseyn Teremaxî ye; çiku ew di rûpelê 21'ê de weha dibêje: "Min di kitêba xwe ya destnivîs ya bi navê el-E'lam Min Meşahirî'l Kurd we Kurdistan a ku çend sal berî niha hatiye nivîsandin û niha jî 2000 hezar tê tercumekirin de, gotiye: Mele Huseynê Teremaxî tesrîfa kurmancî daniye. Ew li Muksê seyda bûye û gorra wî li Muksê di nav gorristana Mîr Behdîn de ye. Eva han min ji hinekan bi vî awayî wergirtibû, lê ne dûr e navê danêrê vê kitêbê Mele Elî Teremaxî be, ne Mele Huseyn be û ew malûmatên han ewan xelet ji min re gotibin".

Li ser "Terkîb"ê jî ew di rûpelê 21'ê de wusa dibêje: "Hewceyî gotinê ye ku kitêbek din jî wek Tesrîfa Kurmancî bi navê Terkîba Mela Yûnis heye". Ew pê ve diçe, Terkîbê dide nasîn û dawiyê weha didomîne: "Mele Yûnis bi navê Mele Yûnisê Erqetînî bi nav û deng e. Lê ez nizanim gundê Erqetînê li ku derê ye û jiyana Mele Yûnis jî qet ne ronî ye. Lê wisa tê xuyakirin ku Terkîba Mele Yûnis jî wekî Tesrîfa Kurmancî kitêbeke kevn e. Ne dûr e ku ev zanayê Kurd, Mele Yûnis berî Mele Xelîlê Sêrtî be. Yanî berî çerxa 19'an. Mihemed Merdûxî, di rûpela 196'an a cildê yekê ya tarîxa xwe de dibêje; Mele Yûnis xwedanê terkîb, tesrîf, û zirûfê ye, di çerxa 12'ê hicrî de li gundê Helkatînê ji diya xwe bûye". (4)

Ji bilî van gişan Qenadê Kurdo jî vê yekê ji A. Jaba weha werdigre: ". . . . Îbaretê Tesrîfê û Zurûf û Terkîba Mele Yûnisê Helqetînî dixwînin, ku ewê hersêna bi zimanê Kurmancî ne. . ." (5)

încar Mele Yûnis kî ye, kengê, çewa û çi demê jiyaye? Niha di vî warî de tu agahdariyên bi rêk û pêk di destê me de nînin. Herweha tu haya me jê nîne ka gelo hinek berhemên wî yên din jî hene yan na û ka ev berhemên xwe kengê nivîsandine? Bes li gor Marûf Xeznedar ku ji Mînorskî û ji Mihemmed Merdûxî Kurdîstanî girtiye, ew di sala 1200 / 1785'an de miriye û ev yek bi me dide zanîn ku wî ev berhem (ku giş yê wî bin) di nîvê sedsala 18'an (1800) de nivîsandine (6).

Emîn Narozî

Zurûfa Kurdî

YA

MELE YÛNISÊ HELQETÎNÎ

Tu bizan! Hingî eşya´ (1) di dinyaê da hene zerf in (2) yan xeyrê zerf in. (3)
Zerf jî munqesimê (4) li du qisman e: (5)
Zerfê 'heqîqî (6)
Yan zerfê mecazî (7)
Zerfê heqîqî 'hulula 'halekî ye di me'hellê xwe de (8) wekî niha zeman (9) we mekan (10) dibêjî.
Zerfuzeman (11) 'îbaretê (12) ji yewm (13) û leylan e (14), hem ji maê (15) weku yewm û leyl jê têne terkîb kirin (16) wekî niha: sa'et we le'hze (17) we

---

1. **eşya´**: piraniya şey' e yanî tişt
2. **zerf**: hoker, hevalkar, adverb
3. **xeyr**: ji bilî, xeyn, ne, bê
3. **xeyrê zerf**: ne hoker, ne adverb
4. **munqesim**: dabeşkirî, (beşkirî) parvekirî (parêvekirî)
5. **qism**: beş, par, pişk, tar
6. **zerfê 'heqîqî**: hokera rasteqînî, hokera eseyî
7. **zerfê mecazî**: hokera mînandî (mînahî), yanî ne hoker e lê mîna hokerê ye. Di destxeta H. û ya C. de weha ye: *"zerfê heqîqî ye yan zerfê mecazî ye"* yanî lêkera **"ye"** tê de heye
8. **'hulûl**: ketin, bûyîn, çêbûn
8. **'hal**: rewş, li vir tişt
8. **mehell**: cih, dews, şûn (şûnd)
8. **'Hulûla 'halekî ye di me'hellê xwe de**: yanî ketin û bûyîna tiştekî ye di cihê xwe de.
9. **zeman** : dem, kat, gav, heyam
10. **mekan**: cih, dews, şûn. Ev dem (zeman) û cih (mekan) mînak in ji bo hokera rasteqînî.
11. **zerfuzeman**: hokera demkî
12. **'îbaret**: pêkhatî, çêkirî
13. **yewm**: roj
14. **leyl**: şev
15. **maê**: tiştê
16. **terkîb**: hevdudanî, hevoksazî li vir çêkirin, sazkirin
16. **terkîb kirin**: çêkirin, sazkirin
17. **le'hze**: kêlîk

lem'he(18) we ân (19) we sîne (20) ne. Hem ji maê weku ew ji yewm û leylan têne terkîb kirin (21) wekî niha: usbû', (22) şehr (23) û sene (24) ne. Hem 'îbaret e ji maê weku waqi' bibit (25) di cewaba (26) "meta"ê (27) da ne'hw (28) "Meta el-qîtalu?" (29)
Zerfumekan (30) îbaretê ji wê firaxa (31) weku meşxûl (32) dikit wê cîsmek (33) bi keyfiyet, (34) weku eger meşxûl nekit dê bimînit xalî (35) wekî niha daxilê kûzê (36) ye ji bo avê. Hem ji maê waqi' bibit di cewaba "eyne" de, (37) nehw "eyne Zeydun". (38)

---

18. **lem'he**: qasik
19. **ân**: bîstik
20. **sîne**: gavik, bêhnik. Ev peyvik tev dibinê seetê de ne û her yek ji wan ji ya dî kêmtir e, lê ew mîna hevmane jî tên bikaranîn. Weha reng e yên Kurdî jî, lê min wan jî, bê ku ez cudahiya nav wan bidim ber çav, bi vê mebestê li pêşber yên 'Erebî rêzkir. Di destxeta H. de lêkera "ne" tuneye.
21. **Maê weku ew ji yewm û leylan têne terkîb kirin**: yanî ew tiştên ku ew bixwe ji şev û rojan têne çêkirin û sazkirin.
22. **usbû'**: hefte
23. **şehr**: meh, hîv, mang
24. **sene**: sal
25. **waqi'**: ketî, bûyî
25. **waqi' bibit**: bibe, bikeve
26. **cewab**: bersiv
27. **meta**: hokera pirsiyarkî ye yanî kengê
28. **ne'hw**: weke, mîna, fena, layî, mînak, berpê, bi aliyê
29. **Meta el-qîtalu?**: Şer/ceng kingê ye? Bersiva vê ku yewm el-xemîsî, roja pêncşemê, ye (şer roja pêncşemê ye) hokera demkî ye çiku demekê tîne holê. Ji *"hem îbaret....."* heyanî *"Meta el-qîtalu"* di yên çapkirî û di destxeta C. de nîne, lê di destxeta H. de heye.
30. **zerfumekan**: hokera cih û hindavê
31. **firax**: firaq, derdan, denê avê, kunê avê, valahî
32. **meşxûl** : mijûl, tije, dagirtî, lepikî, egle
33. **cism**: girş, qelafet, gewde, ji tiştê ku cihekî dadigre re "cism" tê gotin.
34. **keyfiyet**: awa, rewş. Di destxeta H. de weha ye: " *Bi keyfiyeteke werengî eger* ", di ya C de jî "bi ketfiyetekî weku" ye.
35. **xalî**: vale. Di destxeta H. de *"vale û xalî"* ye.
36. daxilê kûzê: hundirê cêr, nava cêr. Di destxeta H. û C. de weha ye: *"daxilê kûzê ye ji bo maê"* yanî avê.
37. **Waqi' bibit di cewaba eyne de**: bê weku bibe bersiv ji hokera pirsê, "eyne" re, yanî li ku, li kur, li kuderê.
38. **eyne Zeydun**: zeyd li kur e. Bersiva vê pirsê, ku dibe "fi el-beytî " li mal e (yanî Zeyd li mal e), hokera cih e, çiku cihekî tîne holê. Ji *"hem ....."* heya bigihê dawiya beşê di ya çapkirî û di destxeta C. de nîne.

Tu bizan! La budde(39) ji bo zerfê jî te'elluqgirtina(40) wê bi fi'lê ve yan bi maê weku bi mana fi'lê ye (41) ku: îsmufa'il e (42) we (43) îsmumef'ul e (44) we sîfet el-muşebbeh e (45) we ef'el et-tefdîl (46) we mesder e (47). Yan bi maê weku mue'wwelê(48) bi mana wan e.

Tu bizan! Zerfê 'heqîqî (49) mef'ulu fîhî (50) dibêjinê eger mensûbê (51) bi teqdîra "fî"(52) bit; eger 'herfa cerrê (53), mezkûr (54) bit zerfê lexw (55) dibêjinê hem mef'ulu bîhî yê xeyrê serîh jî dibêjinê (56).

---

39. la budde: pêwîst e, divê, gerek e

40. te'elluq: pêgirtin, xwepêgirtin

41. fi'l: lêker, kar. Di destxeta H. de ev hevok weha ye: *"La budde te'elluqgirtina zerfê bi f'i'lê ve ya bi maê weku bi mana fi'lê ye "*, yanî di zimanê Erebî de hoker bi tena serê xwe nayê ku bê jî maneyekê nade, divê ya ew bi lêkerekê re bê wekî niha:*"ca'e yewm ul- cum'etî* " ew roja înê hat, çiku roja înê bi serê xwe maneyekê nade, ango roja înê çi? Divê kirinek pê re hebe heya ku wateyekê bide. Yan jî bi yek ji wanê ku wateya lêkerê didin re bê, ku ji wan re bi tevayî *îsm sîfet* (navrengdêr) tê gotin, ku ew jî ev in:

42. îsmufa'il: parenga çalak

43. we: û

44. îsmumef'ul: parenga neçalak

45. sîfet el-muşebbeh: rengdêr. Ew jî mîna parenga çalak e lê ji lêkera têneper diafire.

46. ef'el et-tefdîl: kemper, lapekemper, bêtirker

47. mesder: rader

48. mue'wwel: manedar, watedayî, yanî mana yek ji vanê me gotî dide mîna "mîet" (sed) ku bi wateya " me'dûdet" (hejmar, jimartî), parenga neçalak, e. Ev hevok di herdu destxetan de weha ye " yan mu'ewwlê bi mana yekî ji wan e".

49. zerfê 'heqîqî: hokera rastî. Peyva 'heqîqî ji destxeta C. kêm e.

50. mef'ûlu fîhî: hokera serveyî, serveyê neyekser

51. mensûb: servebar, ziberbar, yanî bi dengdêra "e" ku nîşana servebariyê ye, tê xwendin.

52. teqdîra " fî ": nitirandina daçeka zêrger, "fî" (فی)

53. 'herf: tîp, daçek, paşdanî, pêşdanî, veqetandek, gihanek, gihandek

53. cerr: balvedêrî, zêrbarî, xwdîbarî yanî ger bi dengdara "î i", ku nîşana balvedêriyê ye, bête xwendin.

53. 'herfa cerrê: daçeka zêrger. Di zimanê Erebî de hinek daçek hene ku navdêrê pey xwe bi dengdara "i,î " didine xwendin; zimanzanên Ewropî ji wan daçekan re "preposition" û ji karê wan re jî "genitive" dibêjin.

54. mezkûr: gotî, berbiçav, bihûrî, qalkirî

55. zerfê lexw: hokera neçalak/netêrker, hokera tewş/bêkêr

56. Hem mef'ûlu bîhiyê xeyrê serîh jî dibêjinê: ango ji vê hokera bêkêr re serveyê neyekser jî tê gotin. Ev hevok di destxeta H. de tune.

Zerfuzeman qebûla nesba (57) bi teqdîra "fî" li xwe dikit mutleqen (58) yanî çi mubhem (59) bit çi ne! Zerfumekan (60) qebûl nakit îlla (61) cara weku mebhem bit (62), ku cihatê sitte ne (63). Wekî niha: emameke (64) we xelfeke(65) we yemîneke (66) we şîmaleke (67) we te'hteke (68) we fewqeke (69); hem 'înde (70) we leda (71) we dûne (72) we me'e (73), ji bo îbhamê (75), we lefzu (75) "mekan" (76) we ma ba'dê (77) "dexeltu" (78) we "nezeltu" (79) we "sekentu" (80) lî kisret îl-îstî'malî (81).

---

57. nesb: servebarî, ziberbarî, ger bi dengdara "e", ku dirûvê servebariyê ye, bê xwendin.
58. mutleqen: bê bend, bigiştî, bê merc. Ev peyv di destxeta C. de nîne.
59. mubhem: nekufşe. Yanî hokera demkî çi kufşe be çi nekufşe be daçeka zêrger li pêşia wê tê nepenîkirin.
60. zerfumekan: lê hokera cih û hindavê wê nepenîkirinê qebûl nake
61. îlla: bil, xeyn ji.
62. cara weku mubhem bit: gava ku ew nekufşe be, hingê nepenîkirina daçeka zêrger li pêşia xwe, dipejirîne.
63. cihat: piraniya "cihet" e, yanî hindav, alî, hêl
63. sitte: şeş
63. ku cihatê sitte ne: yanî cihên nekufşe, ew şeş hokerên hindavê ne. Di destxeta C. de *"wekî niha cihatê sîtte, n'hw xelfeke.....* " ye û di rêzkirina wan de jî guhertin heye.
64. emameke: pêşia te, pêş berî te, pêş te
65. xelfeke: paş te, piştte
66. yemîneke: rastê te, aliyê te yê rastê
67. şîmaleke: çepê te, aliyê te yê çepê
68. te'hteke: bin te, xwara te, jêra te
69. fewqeke: raserî te, ser te, jora te.
70. 'înde: li cem, li bal, li ba, li nik
71. leda: li ba, li cem, li bal, li nik
72. dûne: bil, xeyn, jor, pêş, paş, jêr
73. me'e: digel, tevî
74. Îbham: nekufşeyî, neeşkeretî. Di yên çapkirî de ev der weha ye: " *Bi sebeb el- îbham"* û di destxeta C. de jî *"bi sebeb îbhamê" ye* , Ji ber nekufşeyiyê. Yanî ev hokerên hindavê hêlekê didin nîşandan lê ew der dibe ku hema li cem meriv be jî lê dibe ku, ji meriv û wirde, cihekî dûr be jî.
75. lefz: peyv, bêje, tiştê ji dev dertê
76. mekan: cih, hindav, yanî peyva "mekan" ku bi wateya cih e.
77. ma be'dê: peyva piştî
78. dexeltu: ez ketim, ez ketimê, ez çûme hundur.
79. nezeltu: ez peya bûm, ez hatim xwar, ez çûm, min xwe berda.
80. sekentu: ez rawestiyam, ez sekinîm, ez... mam, ez..... runiştim.
81. lî kîsret îl-îstî'malî: ango ji ber pir bikaranînê daçeka vanê dawî jî nepenî dibe.
82. Hem tu bizan! Herçî cihê weku waq'i: ev der di yên çapkirî û di destxeta C. de weha ye: "Tu bizan! Wekî zerf waqi'... " . Yanî gava hoker bibe

Hem tu bizan! Herçi cihê weku zerf waqi' (82) bibit xeber (83) yan sîfet (84) yan 'hal (85) yan sille (86) dê mute'elliqê (87) bi muqedderekî (88) ve bit ku fi'l e yan îsmufa'il e (89). Îlla cara weku zerf waqi' bibit sille dê mute'ellîqê bi fi'lê ve bit, (90) lewra sille nabit îlla dê cumle bit; (91) îsmufa'il digel fa'ilê xwe (92) mufred e (93) îlla (94) di sê cihan da.

Hem tu bizan (95)! Weku ne bûrî bit li zerfê tiştek ku (96) bixwazit lizûmen (97) bê weku bibit xeber (98) yan sille, dê hal bit (99) eger di pey me'rîfeyê (100) me'hd (101) ve bit, dê sîfet bit (102) eger di pey nekîreyê me'hd ve bit (103).

---

83. xeber: pêgir, pêveber

84. sîfet: xuyadar, diyargîn (pesindar)

85. 'hal: rewş, rewşdêr, rewşîn

86. sille: peywendî, peywendehevok

87. mute'elliq: xwepêgirtî, xwelêgirtî, girêdayî, xwepêvegirtî

88. muqedder: nepenî, (nitirandî)

89. Ku fi'l e yan îsmufa'il e: ewa nepenî kare lêker be jî û dibe ku parenga çalak be jî. Yanî zerf bi tena serê xwe nabe pêveber, xuyadar, rewşdêr û peywendî, gava ku bibe divê yan xwe bi lêkereke nepenî yan jî bi parengeke çalaka nepenî ve bigre û tevî wan hê bibe yek ji wanê me gotî.

90. îlla cara weku waqi' bibit sille dê mute'elliqê bi fi'lê ve bit: yanî di yên din de firq nake çi lêker çi pareng be, lê gava ku bibe peywendî (peywendehevok) hingê gere xwe bi lêkerekê ve bigre.

91. Lewra sille nabit îlla dê cumle bit: ev bersiva pirsekê ye, yanî çima peywendî gere bi lêkerê ve be? "Çiku peywendî gereke hevok be".

92. îsmufa'il digel fa'ilê xwe: parenga çalak tevî kirdeyê xwe

93. mufred e: xweser e, biwêja xweser e, nabe hevok

94. îlla: bil, xeyn. Di yên çapkirî û di destxeta C. de, ji "lewra"yê û pê ve weha ye: *"Lewra fi'l digel fa'ilê xwe cumle ye, îsmufa'il digel fa'ilê xwe mufred e îlla di sê cihan da"*. Di destxeta C. de sê rêz lê hatine zêdekirin, lê ji ber ku ew rêz bi 'Erebî bûn û di van çapên din de jî ne wek tekstê lê wek kurteraveyeke bi zimanê Erbî li bendê hatibûn nivîsandin min jî wan nexiste nav eslê pirtûkê.

95. Hem tu bizan! di yên çapkirî û di destxeta C. de "hem" nîne.

96. tiştek ku: di yên çapkirî û ya C. de *"t işteki weku "* ye.

97. luzûmen: pêwîstî, daxwzeke pêwîstî.

98. bibit xeber: di yên çapkirî û di C. de *"bikit xeber "* e. Yanî ger li pêşî *"mubteda"* (serwer, kirdeya navdêrî) bihûrî be divê hingê ew bibe pêveber; yan jî ger pronava peywendiyê (peywendîgar) li pêş derbasbûbe hingê jî gere bibe peywendî.

99. dê 'hal bit: yanî gava ne di rewşek ji wanê pêwîstî de be hingê wê bibe rewşdêr (rewşîn).

100. me'rîfe: binavkirî, naskirî

101. me'hd: xwerû, xalis

102. dê sîfet bit: wê xuyadar be

103. nekîreyê me'hd: navdêrekî nebinavkirî û xwerû

Muhtemel e(104) ji bo herduyan eger di pey xeyrê mehd(105) ve bit. Weha reng e 'hukmê cumleî(106).
Tu bizan (107)! Zerf di van herçar cihan de, (108) hem di cihê weku waqi' bibit di pey 'herfa nefyê (109) û îstîfhamê (110) da (111) caiz e (112) ku ref'a fê'ilê xwe yê zahir bikit (113) her wekî fi'lê (114), li nik Besriyan (115). Li nik

---

104. mu'htemel e: dibe, çêdibe. Di destxeta C. de weha ye: "mu'htemelê herduyan e".
105. xeyrê me'hd: ne xwerû, ne xalis
106. Weha reng e 'hukmê cumleî: yanî rewşa hevokî jî di vî warî de (ku li pey binavkiriyê xwerû be yan na) mîna ya hokerê ye.
107. tu bizan! di yên çapkirî de û di ya C. de *"hem tu bi zan "* e.
108. herçar cihan: mebest pê gava bibe xuyadar, pêveber, peywendî û rewşîn e. Di destxeta C. de *"hersê cihan "* e, lê wê şaş be çiku mexsed pê ew herçar cihên, ku li jor hatin gotin, e .
109. 'herfa nefyê: pronava neyîniyê
110. û îstîfhamê: yanî 'herfa îstîfhamê, pronava pirsê
111. da: ev peyvik di ya çapkirî de nîne
112. caiz e: durust e
113. ref': kirdebarî, pêşeberî yanî ew nîşana ku rewşa kirdeyê dide ramîdan
113. fa'il: kirde
113. zahir: eşkere, numayî
113. Ref'a fa'ilê xwe yê zahir bikit: yanî navdêrekî berbiçav bitewîne, bigerîne bi pêş(dengdara "u" ku dirûvê kirdebariyê ye) û ji xwe re bike kirde.
114. her wekî fi'lê: mîna lêkerê, yanî çawa ku lêker kirde dixwaze û wî bi pêş dike. Di zimanê Erebî de lêker timî di pêşiya kirdeyê de tê û paşiya kirdeyê jî bi nîşanên kirdebariyê ku yan pêş (ـُـ dengdara "u, un") yan *waw* (و) (dengdara dirêj, "û") yan jî *elîf* (ا)e (dengdara dirêj "á") tê tewandin. Herweha di rewşên serveyî û balvedêriyê de jî tewangeya wî navdêrî û tevgernasîn (hevokristin, hevoksazî, sîntaks)a wî li gor dawiya bêjeyê tê, ew jî yan bi ziberê (dengdara "e, en") ku nîşana servebariyê (nasb: ـً) ye yan jî bi zêrê (dengdara "i, în") ku nîşana balvedêriyê (cerr: ـٍ) ye.
115. Li nik Besriyan: yanî ev tewandina hokerê di van şeş cihên me gotî de li gor rêgeha Besriyan e. Di rêzimana Erebî de dîtin û rêgehên herî pêşî, ku timî li hemberî hev derketine, du heb in. Digel ku piştre li Bexdayê yeke din derket û ji bo yekîtiya van xebitî jî, lê dîsa yên bingehîn û sereke ev herdu ne. Yek ji wan ya Besriyan e; ji ber ku destpêka vê dîtinê ji bajarê Besrayê, ku dikeve başûrê îraqa niha, derketiye û bingehê dibistana wan jî li wir hatiye avêtin, ew bi rêgeha Besriyan hatiye bi nav kirin. Xebata vê rêgehê danîna qaîdeyan ji bo zimanê Erebî li ser bingehê hêwuşî, pîvanberî, hevşêwyî û qandîtiyê bûye. Rêzimannasên sereke ku vê dîtinê parastine ev in: Sibeweyhî, Exfeş, Muhemmed, Salih îshaq, Ebûbekr, îbn (kurrê) Durusteweyhî, Muhemmed îbn Sebirman, îbn Kîsan Ebû (bavê) el-'Hesen, Zeyd, 'Elî, Muhemmed îbn el-'Huseyn, Ebû el-Fet'h, 'Elî îbn Mu'min, eş-Şelûbîn, Suleyman îbn îsa; serokê van gişan jî Sîbewehiyê îranî bûye (7).

Kûfiyan mutleqen(116); nehw "Zeydun 'îndehu malun"(117) dibêjî. "Zeydun" (118) mubteda ye(119), "'înde"(120) zerfê musteqerr e(121), "malun"(122) fa'il ê zerfê ye (123), cumleyê zerfiye (124) xeber e (125) li nik 'Huzzaqan(126). Caiz e ku(127) "malun" mubteda bit mue'xxer bit(128) " înde" xeber bit muqeddem bit (129), cumleyê îsmiye (130) xeber bit li nik Meşhûrî (131).
Weha reng e hukmê(132) zerfê musteqqerê mecazî(133) di cemî'ê(134) maê (135) weku me zikir kiriye (de) (136) bi xeyr ji hukmê samî (137) ku tesmiyedana (138) wî bi mef'ulu fîhî ye (139). Bi xîlaf zerfê lexw (140), lewra

---

116. Li nik Kûfiyan mutleqen: yanî li cem rêgeha Kûfiyan hokerê me timî kirde dixwaze û wê ditewîne, çi di van her şeş cihan de be çi na. Yek ji wan rêgehan jî ya Kûfiyan e ku bingehê wê û dibistana wê li bajarê Kûfeyê bûye. Xebata vê rêgehê jî li ser danîna qaîdeyên zimanê Erebî li gor rewşa ziman ya heyî bûye, bê pîvanberî û hîwuşiyê. Rêzimannasên ku di bin pêşikvaniya Kessaî de vê dîtinê diparastin ev in: el-Kessaî, el-Ferra' , Muberred, Ebû el-'Ebbas, îbn el-Enbarî, û Yusuf. (8)
117. Zeydun 'îndehu malun: pertal (mal) li ba zeyd in
118. Zeydun: peyva "Zeyd", navê lehengê çîrokên "Benî Hîlalya" ye
119. mubteda: serwer, kirdeya (hevoka) navdêrî
120. 'înde: bêjeya "'înde", li cem
121. zerfê musteqerr: hokera cihgirtî, hokera cihdayî/têrker (hokera cihdayî ewa ku xwepêgirtiyê wê ne li ber çav be)
122. malun: bêjeya "mal"
123. fa'îlê zerfê ye: kirdeyê hokerê ye
124. cumleê zerfiye: hevokê hokerî
125. xeber: pêveber e ji bo serwerî ku "Zeyd" e
126. li nik 'Huzzaqan: li cem zanayên serwext û mahir
127. ku: di yên çapkirî de nîne
128. Mubteda' bit mu'exxer bit: serwerê li paşmayî be; wek qaîde serwer timî li pêşiya pêveberî tê lê carna jî mîna virê, dijî qaîdeyê xwe, li paş tê.
129. Xeber bit muqeddem bit: pêveberekî (pêgir) ku li pêş hatibe
130. cumleyê îsmiye: hevokê navdêrî (li gor rêzmana 'Erebî serwer û pêveber hevokê navdêrî pêktînin)
131. meşhûrî: yanî li gor zanayên bi nav û deng, ne hevokê hokerî (çawa ku zanayên serwext dibêjin), lê yê navdêrî dibe pêveber ji bo Zeydê.
132. 'hukm:: rewş, ferwerî
133. zerfê musteqerrê mecazî: yanî ev tiştê me got her çendî ji bo hokera têrker ya rasteqînî bû jî lê rewşa hokera cihdayî/têrker ya mînandî jî her ewe.
134. cemî': tev, hemû, giş
135. maê: tiştê, rewşa
136. zikir kiriye: gotiye, aniye ziman. Di yên çapkirî û di destxeta C. de weha ye:*"cemî'ê ma zekerna hu"*: di temamê tiştê ku me gotiye de.
137. 'hukmê samî: rewşa duyemîn, biwara duyemîn
138. tesmiye: navdan, binavkirin, navlêdanîn
139. mef'ûlu fîhî: serveya neyekser. Yanî ji hokerê mînandî yê cihdayî re serveya neyekser nayê gotin, lê çawa me got ji yê rasteqînî re tête gotin.
140. bi xîlaf zerfê lexw: yanî rewşa hokera bêkêr ne mîna ya rasteqînî ye û tiştên me li pêş ji bo wê û ya mînandî got, ji bo vê derbasnabin.

ew muşterek (141) nîne digel zerfê heqîqî îlla di hukmê ewwel (142) da.

Zerfê mecazî (146) 'îbaretê (147) ji carr (148) û mecrûran e (149), lewra ew jî mu'htacê (150) bi bal mute'elliqekî (151) ve ye her wekî zerfê heqîqî. Zerfê mecazî jî li du qisman e: Zerfê lexw (152) yan zerfê musteqerr e (153); lewra(154) eger mute'elliqê wî mezkûr bit (155) yan di hukmê mezkûrî da bit (156) zerfê lexw (157) dibêjinê; lewra qerargirtina fa'ilê amilî tê da lexw e(158) li nik Meşhûrî, (159) yan lexw e bi nezer(160) zahirê (161) kelamî (162) l i nik Esse'hî(163). Hem zerfê xas(164) jî dibêjinê ji ber xususa (165) amilê (166),

---

141. **muşterek**: beşdar, hevbeş, xweypar
142. **ewwel**: pêşî, yekemîn
143. **feqet**: bi tenê, tenha
144. **te'elluqgirtin**: xwepêvegirtin
145. **mana fi'lê**: wateya lêkerê, yanî ewên ku ji lêkerê hatine afirandin û wateya wê didin, mîna pareng, rader, rengdêr, kemper, û yên din.
146. **zerfê mecazî**: hokerê mînandî (manendî)
147. **'îbaret** pêkhatî, çêbûyî
148. **carr**: daçeka zêrger
149. **mecrûr**: zêrbar, ev hevok di yên çapkirî û di ya C. de weha ye: "*'îbaretê ji kullê carr û mecrûran e*" yanî hokera mînandî ewa ku ji daçeka zêrger û zêrbarî pêkhatî ye.
150. **mu'htac**: hewce, pêdivê, xwestek, destteng
151. **mute'elliqekî**: xwepêgirtiyekî, pêvegirekî. Di yên çapkirî û di C. de weha ye: "*mut'elliq û 'amilakan*: " 'amilakan piraniya 'amil e, yanî tewangdêr, birêvebir.
152. **lexw**: tewş, vale, bêkêr, bêrê, zêde, neçalak, netêrker
153. **musteqerr**: cihgirtî, cihdayî / têrker. Di yên çapkirî û di destxeta C. de peyva "zerf", li pêşiya vê bêjeyê û ya berî wê nayê.
154. **lewra**: çiku, ji ber
155. **Eger mute'elliqê wî mezkûr bit**: ger bêjeya ku hoker xwe pê ve digre li ber çav be.
156. **'hukmê mezkûrî**: yanî ne li ber çav lê mîna be berbiçavî
157. **zerfê lexw**: dibe hokera tewş (bêkêr), ya neçalak / netêrker
158. **Lewra qerargirtina fa'ilê amilî tê de lexw ye**: çiku kirdeya tewangdêrî cihê xwe di hokerî de nagire ji ber vê yekê ji ew dibe hokera bêrê. Wek hevokê "merertu bi Zeydîn", ez diber Zeydê de bihurîm, kirde ku li vir peyvika "*tu*" (ez) ye cihekî di nav hokera bêrê de ku "bi Zeydîn" (daçeka zêrger û zêrbar) e nagire. Lê ku tu bêjî: "Zeydun emame ke" Zeyd li pêşberî te ye, kirde, "Zeyd", cihekî di hokerê de, ku "pêşber" e, digre.
159. **meşhûr**: navdar, yanî di vî warî de dîtina bi nav û deng
160. **bi nezer**: li gor
161. **zahir**: eşkere, berbiçav
162. **kelam**: hevok, xeber, gotin
163. **Li nik Esse'hî**: li cem dîtina herî rast û eseyî
164. **hem zerfê xas**: hokera taybetî. Di yên çapkirî de: "*Hem tu bizan zerfê xas*" e.
165. **xusûs**: nemaziyet, taybetmendî
166. **'amil**: tewangdêr, yanî ji ber ku tewangdêrê wê taybetî ye

hem ji ber maê weku tesmiyetdana (167) wî bi lexw (168) di ayet (169) û 'hedîsan (170) de hatiye ji ber terka (171) edebê.

Tu bizan! Di zerfê lexw da mecrûr (172) bi tenê mensûb e (173) me'hellen (174) yanî ma'nen we teqdîren; (175) lewra ne mebnî ye. (176) Pes (177) te'bîrdana (178) wî me'hellen mucarredê (179) îstîla'hî ye (180), we la meşahet fîhî (181); carr û mecrûr (182) pêk ve me'hel (183) ji e'erabê (184) nîne (185). Ev e ma'na qewlê (186) wan (187) ku dibêjin: "Di zerfê lexw da la me'helle leha mîn el- e'erabî" (188).

---

167. tesmiyetdan: navdan, binavkirin; yên çapkirî û ya C. weha ne: "*hem ji ber maê weku heye di tesmiyetdana wî bi lexw di ayet û 'hedîsan de ji terka edebê*".
168. bi lexw: bi tewşî, bi bêkêrî, bi bêrêtî, di ya destnivîs de " bi lexwîn" e.
169. ayet: riste, malikên Quranê
170. 'hedîs: gotin û kirinên pêxember
171. terk: devjêberdan, jêqerîn. Di vê rêza paşî de piçek tevî hevî heye û wate baş nayê zanîn, lê xuyaye ku mebest pê ev e: Ji ber ku ev hoker di risteyên Quranê û di gotinên Pêxember de jî tê, rabûne ji bo ku bê edebî nê ji pêla vî navê "lexw" (tewş, bêrê) ve yê "xas" (taybetî) lê kirine.
172. mecrûr: zêrbar ku bi daçekê dibe bi zêr, yanî bi dengdarên "i,î" ku nîşanên balvedêriyê ne, tên xwendin.
173. mensûb e: bi ziber e, ango bi dengdara "e" ku nîşana servebariyê ye.
174. me'hellen: di bin re, bi binehî, bi cigehî
175. ma'nen we teqdîren: bi wateyî û nepenî, yanî tewangeya daviya wan ne li ber çav e, nepenî ye.
176. Lewra ne mebnî ye: ev bersiva pirseke nihênî ye, ango çima me (nivîskar) got "ma'nen we teqdiren" çiku "me'hellen" (binehî, cîgehî) nîşana bêjeya "mebnî"yî (netewangbarî) ye; lê hokera *bêrê* tewangbar e û nîşana tewangbariyê jî ku ne berbiçav (lefzî) be wê nepenî û rêzimanî be.
177. pes: di yên çapkirî de "bes" e, yani lê, lêbelê, hew
178. te'bîrdan: binavkirin, navdan, ravekirin, biwêjdanîn
179. mucerred: xwerû, sade, bêxiş, tazî, li vir bi tenê, hew, bes, xweser
180. îstila'hî: hevgirtin, peyman, lihevkirin. Yanî wek bingehî tewangeya hokera bêrê (lexw) watemenî û nepenî ye lê rêzimannasan li ser li hev kirine û navê "me'hellî" (binehî, cîgehî) lê danîne.
181. We la meşa'hete fîhî: û tu munaqeşe û gotûbêj di vê binavkirinê de nine
182. car û mecrûr: daçeka zêrger û navdêrê bi zêr
183. me'hell: cih, dews, şûn
184. e'erab: tewangbarî, tewange
185. nîne: di yên çapkirî de "*tinîne* " ye
186. qewl: gotin
187. wan: "ne'hwiyan" (rêzimannasan)
188. La me'helle leha mîn el-e'erabî: nayê tewandin, netewangbare

Eger mute'elliqê wî(189) ne mezkûr(190) bit, ne di 'hukmê mezkûrî(191) da bit zerfê musteqerr (192) dibêjinê. Lewra me'hell musteqerr e ji bo fa'ilê fi'la me'hzûf, (193) yan ji bo fa'ilê îsmufa'ilê me'hzûf li nik Meşhûrî, yan bi sebeb(194) îstîqrara (195) ma'na (196) 'amilî (197) tê da li nik essehî. Hem zerfê 'am (198) jî dibêjin ê ji ber 'umûma (199) 'amilê, lewra wacib e (200) 'amilê wî yek ji umûrê (201) 'am bit; we (202) muqedder (203) bit, ew bi xwe mutedemmin(204) bit. Eger yek ji van hersê şertan mefqûd(205) bit nabijinê zerfê musteqerr.

Besrî (206) dibêjin dê mute'elliqê (207) bi fi'lek ji ef'alê (208) 'am ve bit ku: hesele (209) we sebete (210) we weqe'e ((211) we wecede (212) we kane (213)

---

189. **Eger mute'elliqê wî**: eger xwepêgirtiyê zerfî (hokerê). Li vir nivîskar car din dadigere ser beşa duyemîn ji hokera mînandî ku hokera cihgirtî ye.

190. **ne mezkûr**: negotî, neberbiçav

191. **'hukmê mezkûrî**: wek gotî yî, rewşa gotî yî. ev hevok di yên çapkirî de weha ye: "*ne mezkûr ne di hukmê mezkûrî da ye* ".

192. **zerfê musteqerr**: hokera têrker (cihdayî), yanî hokera mînandî yan hokera bêrê ye ku xwepêgirtiyê wê berbiçav e yan jî hokera cihgirtî ye ku xwepêgirtiyê wê ne berbiçav û ne mîna berbiçavî ye.

193. **Lewra me'hell musteqerr e ji bo fa'ilê fi'la me'hzûf**: ango çima hokera cihdayî tê gotin? "Çiku kirdeyê lêkereke nihênî tê de cihdayî ye", yanî dibe cigeh ji kirdeyî re.

194. **sebeb**: sedem, hoy, eger

195. **îstîqrar**: cihgirtin, rawestan, cihbûn

196. **ma'na**: wate, mane

197. **'amil**: tewangdêr. Yanî ji ber ku hokera me di xwe de wateya tewangdêrî digre jê re hokera cihdayî tê gotin

198. **'am**: giştî, tevayî, gelemperî

199. **'umûm**: giştîbûn, gelemperîtî

200. **Lewra wacib e**: çiku pêwîst e

201. **umûr**: tişt, di vir de mebest pê biwêj in. Yanî jê re hokera giştî jî tê gotin çiku divê tewangdêrê wê yek ji wan tewangdêrên gelemperî be û ew navê xwe ji wir bistîne.

202. **we**: û, di yên çapkirî de di şûna " we " de "hem" e

203. **muqedder**: nepenî, nihênî, yanî gere lêkera me ya giştî ne berbiçav be.

204. **muteddemmin**: di xwe de girtî, binvegirtî, bingavtî, sergirtî, yanî divê hokera me bi xwe wateya lêkerê di xwe de bigre û wê bîne zimên.

205. **mefqûd**: tine, winda, ne li cih

206. **Besrî**: rêgeha Besriyan, yanî rêzimannasên ku navend û dibistana wan li Besrayê bû.

207. **mute'elliq**: girêdayî, xwepêgirtî

208. **ef'al**: piraniya fi'l e yanî ku lêker

209. **'hesele**: bû, çêbû

210. **sebete**: cih girt, rawestiya

211. **weq'e**: bû, qewimî

212. **wecede**: hebû, peydabû

213. **kane**: bû, li..... bû

we labese (214) we îsteqerre ye (215), li nik 'edem (216) qerîna (217) xass (218). Eger qerîne hebit (219) dê mute'elliqê bi fi'lek ji ef'alê xass ve bit (220). Caîz e teqdîra xassê (221) li wufqa meqamî (222), lewra fi'l 'amilekî qewî (223) ye. Hem lewra weku waq'i bibit sille (224) ji bo (225) mewsûlê (226) dê mute'elliqê bi fi'lê ve bit îttîfaqen; (227) bes cihê dî jî dê mute'elliqê bi fi'lê ve bit. Kûfî (228) dibêjin dê mute'elliqê bi îsmufa'ilekî (229) ji ef'alê 'am (230) ve bit, lewra weku waqi' bibit sîfet (231) ji bo (232) mewsûfekî (233) me'erife (234) dê mute'elliqê bi îsmufa'ilî ve bit (235) îttîfaqen; bes cihê dî jî dê mute'elliqê bi îsmufa'ilî ve bit. Hem lewra weku waqi' bibit xeber dê mute'elliqê bi îsmufa'ilî ve bit, lewra esl di xeberî da îfrad e (236) bes cihê dî jî em 'hemil dikin (237) li ser wî. Muxtar (238) mezhebê (239) Kûfiyan e bi xeyr ji sûretê (240)

---

214. **labese**: lê kola, lê geriya. têkilî danî, sitand dest
215. **îsteqerre**: cih girt, cih da, rûniştst
216. **'edem**: nebûn, tinebûn
217. **qerîne**: nîşan, dirûv
218. **xass**: taybetî, nemaziyetî
219. **Eger qerîne hebit**: di yên çapkirî û di ya C. de weha ye: "*Eger qerîna xass hebî*", yanî ger nîşaneke ku lêkereke taybetî bixwaze hebe.
220. **Dê mute'elliqê bi fi'lek ji ef'alê xass ve bit**: hingê wê xwe bi lêkereke taybetî ve bigre. Di destxeta C. de "*wê mute'elliqê* " ye.
221. **teqdîra xassê**: nepenîkirina lêkera taybetî
222. **li wufqa meqamî**: li gor (daxwazî, û lêhatina) cih û hevokî
223. **qewî**: zexm, xweybirî, xweyhêz, bihêz, bibirî
224. **sille**: peywendî, peywendehevok
225. **ji bo**: di yên çapkirî û di ya C. de nine
226. **mewsûl**: pronava peywendiyê
227. **îttîfaqen**: bi yekîtî, lihevkirî. Yanî rêzimannas giş bûne yek ku gava peywendî be wê tewangdêr lêker be, çiku divê peywendî hevok be û parenga çalak tevî kirdeyê xwe, ji sê cihan pê ve, nabe hevok çawa ku li pêş jî bihurî.
228. **Kûfî**: rêgeha Kûfiyan; ango rêzmannsên ku navend û dibistana wan li Kûfeyê bûye.
229. **îsmufa'îl**: parenga çalak
230. **ef´alê´am**: lêkerên giştî ku li pêş hatin rêzkirin
231. **sîfet**: xuyadar, diyargîn
232. **ji bo**: di yên çapkirî û ya C. de nine
233. **mewsûf**: pesindayî, xuyadarkirî, diyargînkirî
234. **me'rîfe**: binavkirî, naskirî
235. **îsmufa'ilî ve bit**: di yên çapkirî û ya C. de weha ye: "*îsmufa'ilekî me'rîfe ve bit*", yanî parengeke çalak î binavkirî.
236. **îfrad e**: xweserîbûn e, yanî ne hevok e.
237. **'hemil dikin**: davîjine ser cihê ku dibe pêveber, yanî mîna wî hisab dikin. Di yên çapkirî de weha ye: "*hemil dikin li ser wî*".
238. **muxtar**: ya qenç ya baş
239. **mezheb**: rêgeh, rêçik
240. **sûret**: rû, wêne, şekil, rewş, cih

weku îttîfaqî ye, (241) ku wuqû'a (242) wî sille ye.
Tu bizan(243)! Çi mute'elliqê bi fi'lê ve bit her weki mezhebê Besriyan, çi mute'elliqê bi îsmufa'ilî ve bit her weki mezhebê Kûfiyan em herduyan jê 'hezif dikin (244), fa'ilê wan ji wan (245) xaric dikin (247), mustetir dikin (247) di zerfê da, dikin fa'il (248) ji bo zerfê mecazen (249).
Fa'ilê fi'lê ye (250) yan fa'ilê îsmufa'ilî ye (251) 'heqîqeten (252), fa'ilê zerfê ye(253) merfû'ê bi zerfê ye (254) mecazen.
Tu bizan! Ey mubtedî (yo) (255) "es'edeke llahu" (256)! Ev 'îlmê (257) weku em îbtîda' (258) pê dikin "'îlmê ne'hwê" (259) dibêjinê; çiku (260) wadi'î (261)

---

241. **îttîfaqî**: hevgirtî, yekgirtî, yekbûyî
242. **wuqû'**: bûyîn, bûn. Yanî ya baş rêgeha Kûfiyan e lê gava bibe peywendî hingê rêgeha Besriyan çêtir e.
243. **Tu bizan!** ev hevok di destxeta H. de nine, lê bi ya min ku hebûna wê xweştir bûna.
244. **'hezif dikin**: jê davîjin, radikin, jê dibin
245. **ji wan**: di yên çapkirî de "*jê* " ye
246. **xaric**: derxistî, jêder, dervayî
246. **xaric dikin**: derdixin, dertînin
247. **mustetir**: veşartî, nihênî
247. **mustetir dikin**: vedişêrin, dinihênin,
248. **fa'îl**: kirde
249. **mecazen**: bi mînandî, bi mînahî, bi manendîtî, ev peyv di destxeta C. de tuneye.
250. **fa'ilê fi'lê ye**: kirdeyê lêkerê ye (li gor rêgeha Besriyan)
251. **fa'lê îsmufa'ilî ye**: kirdeyê parenga çalak e (li gor rêgeha Kûfiyan). Di yên çapkirî de ev hevokê han jî heye: "*Merfû'ê bi herduyan e* ": ango herdu bi hev re kirdeyî ditewînin û paşiya wan digerînin bi pêş (dengdara u).
252. **'heqîqeten**: bi rastî, bi rasteqînî
253. **fa'ilê zerfê ye**: kirdeyê hokerê ye
254. **merfû'ê bi zerfê ye**: ango hoker e ya ku wî ditewîne û paşiya wî digerîne bi pêş (dengdara "u", yan jî "û"). Di yên çapkirî de herdu rêzên dawî weha cih bi hev guhertine: "*Fa'ilê zerfê ye merfû'ê bi zerfê ye mecazen, fa'ilê fi'lê ye yan fa'ilê îsmufa'ilî ye merfû'ê bi herduyan e 'heqîqeten* ".
255. **mubtediyo**: destpêkiro, yê ku nû dest bi tiştekî dike, xişîmo
256. **es'edekellahu**: xwedê te biparêze, Yezdan te şad bike
257. **'îlm**: zanistî, zaniyarî
258. **îbtîda'**: destpêkirin, destpêk
259. **'îlmê ne'hwê**: zanistiya tevgernasiyê, zaniyariya hevokristin û peyvnasînê. Peyva "*ne'hw* " wek ferheng bi wateya rê, alî, ber pê ve, qestkirin, mînak, weke, bi qandî û cure tê lê wek zanistî bûye nav ji bo zaniyariya biwêjnasîn (morfolojî) û tevgerzanî (sintaks, hevokristin, hevoksazî), yanî tewangeya dawiya bêjeyan di ristina hevokan de.
260. **çiku**: di çapekê de "*lewra* " ye
261. **wadi'**: daniyar, danêr, sazkar, kesê ku vê zanistê daniye/afirandiye

gotiye: "un'hw"(262)! Ku îmamê 'Elî ye, (263) rediyellahu 'enhu (264) we keremellahu wechehu (265). Hem "'îlmê e'erabê" (266) jî dibêjinê, lewra îzhara (267) Ma'niyan (268) dikit ji elfazan (269) eger e'erab bi mana îzhar bit (270) Yan îzala (171) fesadê (272) dikit eger e'erab bi mana îzalet ul-fesad bit, (273) yan te'hsîna lefzê (274) dikit eger bi mana 'husn (275) bit.
Mewdû'ê (276) vî (277) 'îlmî (278) kelîme (279) û kelam (280) in ya'nî (281) mufred (282) û cumle ne (283); mufred jî lê sê qisman e: îsm e û fi'l e û herf e (284). Cumle jî li çar qisman e: îsmiye, fi'liye, şertiye û zerfiye (285).

---

262. **un'hw**: qest bikin, lê bigerin, ber pê ve herin!
263. **îmamê 'Elî**: 'Elî îbn Ebû Talib, kurapê Muhammed Pêxember (A. S. S. ='Eleyhî es-Selatu we es-Selam) û zavayê wî ye, çaremîn xelîfe yê Pêxember (A. S. S.) bûye.
264. **Rediye Allahu 'enhu**: Xwedê jê xweş û razî be.
265. **We keremellahu wechehu**: û Xwedê rûyê wî qenc bidêre. Ev hevok di ya çapkirî de nîne. Li gor nivîskar û çend hebekî din daniyarê zanistiya biwêjnasîn û hevkristinê 'Elî îbn Ebû Talib e, lê piraniyên çavkaniyan li ser "Eb ul-Eswed ed-Du'alî" ku nivîskarê (katibê) 'Elî îbn Ebu Talib bûye, bûne yek. (9)
266. **e'erab**: tewang, tewange, deranîn, eşkere kirin, paqijkirin, pak kirin
267. **îzhar**: eşkere kirin, deranîn
268. **me'anî**: piraneya "mane"yê ye
269. **elfaz**: piraneya lefz e yanî bêje, gotin, tiştê ji dev dertê
270. **Eger e'erab bi mana îzhar bit**: yanî ku peyva "e'erab" bi wateya deranîn û eşkerekirin be hingê ew maneya gotin û hevokan dide zanîn.
271. **îzale**: jêbirin, rakirin
272. **fesad**: xirabî, şaşî, çewtî
273. **îzalet ul-fesad bit**: yanî gava peyva e'erab bi maneya rakirina çewtiyan be hingê ew çewtî û şaşiyên gotin û hevokan ji holê radike.
274. **te'hsîn**: bedewkirin, rindkirin, spehîkirin
274. **te'hsîna lefzê**: bedewkirin û li hevanîna bêjeyê
275. **'husn**: bedewî, rindî, delalî, spehîtî. Yanî gava ew bi wateya bedewî û spehîtî be hingê bi saya wê bêje û hevok spehî dibin û li hev tên.
276. **mewdû'**: danînî, li vir babet, mijar, biwar
277. **vî**: di yên çapkirî de "wî" ye.
278. **'îlm**: zaniyarî, zanist. Ev peyvik di ya çapkirî de tuneye
279. **kelîme**: biwêj, bêje, peyvik
280. **kelam**: riste, gotin, xeberdan, axavtin, di vir de mebest pê komek e
281. **ya'nî**: mebest, ango, yanî, yanî ku
282. **mufred**: biwêja xweser, xweserbêje, tekbiwêj
283. **cumle**: hevok, cumle
284. **îsm**: nav, navdêr
284. **fi'l**: lêker, kar
284. **'herf**: tîp, daçek, veqetandek, paşdanî, pêşdanî, gihanek, gihandek
285. **îsmiye**: ango (hevokê) navdêrî
285. **fi'liye**: (hevokê) lêkerî
285. **şertiye**: (hevokê) mercî, yê egerî
285. **zerfiye**: (hevokê) hokerî

Ev 'îlmê hanê (286) behsê ji axirê(287) mewdû'ê xwe dikit ji 'heysiyet(288) e'erab (289) û bînaê (290) ve.
E'erab jî li du qisman e: bi 'hurûfan e (291) yan jî bi 'herekatan e (292).
'Hurûf jî sisê ne: "elîf" û "waw" û "ya" (293) ne.
'Herekat jî sisê ne: "demme", "fet'he" û "kesre" ne (294).
Esl (295) di e'erabê da e'eraba bi 'herekatan e; e'eraba bi 'herekatan jî li du qisman e: lefzî ye yan teqdîrî ye (296).
Kullê wa'hidek (297) ji wan (298) jî li du qisman e (299): bi temamî ye yan bi ba'dî ye (300).
E'eraba bi 'hurûfan (301) jî li du qisman e: lefzî ye yan teqdîrî ye.
Kullê wa'hidek ji wan jî (302) bi temamî ye yan bi ba'dî ye.

---

286. ev 'îlmê hanê: di ya çapkirî de nîne
287. axir: dawî, paşî
288. 'heysiyet: biwar, alî, hêl, awa
289. e'erab: tewange, tewangbarî
290. bîna: netewangbarî, netewange
291. 'hurûf: piraneya herf e, yanî tîp, lê di vir de mebest pê elîf (ا), waw (و) û ya (ی) ne ku rêzimannasên Ewropî ji wan re dengdarên dirêj dibêjin.
292. 'herekat: piraneya hereke ye, yanî ser û ber, zêr û ziber (ـَ ـِ ـُ) ku ji wan re jî dengdarên kurt tê gotin. Ango li gor nivîskarî tevgerzanî û peyvnasî (nehw) ew e ku rewşa dengdara dawiya bêjeyê, tewangbarî û netewangbariya wê bi me dide zanîn.
293. elîf: (ا) tîpa yekemîn ji alfabeya Erebî
293. waw: (و) tipa berî ya paşî ji alfabeya Erebî
293. ya: (ی) tîpa dawî ji alfabeya Erebî. Ev hem tîp in, hem dibin dengdarên dirêj û hem jî dibin niş anên tewangeyê.
294. demme: pêş, ber (ـُ)
294. fethe: ziber, ser (ـَ)
294. kesre: zêr (ـِ), ev jî hem dibin nîşana tewangeyê û hem jî dibin dengdarên kurt.
295. esl: hîm, bingeh, asas
296. lefzî: bêjeyî, devikî, berbiçav
296. teqdîrî: nepenî, nihênî, nixumî
297. kull: her, giş, hemû, tev
297. wa'hid: yek, tek, tenê, tekane
297. kullê wa'hidek: her yek
298. ji wan: ji tewangeya bêjeyî û ya nepenî
299. li du qisman e: li ser du beşan e; ev hevok di ya çapkirî û di destxeta C. de nîne.
300. bi temamî: yanî tewangeya dawiya wan yan hemû bi bêjeyî (berbiçav) ne, yan jî hemû nepenî ne.
300. bi ba'dî: yanî hinek ji tewangeya wan bi bêjeyî û hinek jê jî nepenî ne.
301. e'eraba bi 'hurûfan: tewangeya bi dengdarên dirêj jî dîsa li du beşan e
302. kullê wa'hidek ji wan jî: ev der ji "lefzî ye yan teqdîrî ye" heya vir di ya destxet de nîne; xuyaye nêzîk derbasbûye ku loma nivîskarî dubare nekiriye.

Eqsamê e'erabê(302) geriyan şeş(303) ev e 'hukmê(304) îsmê(305) mu'reb(306). Emma (307) heçîka îsmê mebniyê weku (308) muş abihê (309) bi 'herfê ye bi muş abehetekî (310) qerîb, (311) çi gava (312) waqi' bibit (313) di mewqi'ê (314) musennaî (315) da dê mu'reb bit (316) bi ba'dekî (317) ji 'hurûfê(318) me'hellî (319) Ya'nî bî el-elîfî raf'an (320) we bî el-yaî nasben we cerren, (321) her wekî mu'rebî lakîn (322) ew lefzî ye; ma 'edaê (323) wan (324)

---

302. eqsamê e'erabê: beşên tewangeyê

303. geriyan şeş: bûne şeş. Ya rastî ew bû ku bigotina heşt ne şeş, çiku dengdarên kurt yan giş yan jî hinekji wan bêjeyî ne û yan giş yan jî hin nepenî ne, ev bûn çar. Her weha dengdarên dirêj jî yan hemû yan jî hinek bêjeyî ne û yan tev yan jî hin nepenî ne, ev jî bûne çar û tev li ser hev dibin heşt. (10) Ez nizanim çima nivîskarî gotiye şeş lê dibe ku yan ji bîra wî yan jî ji bîra wanê ku dawiyê ew nivîsandibin çûbe.

304. 'hukmê: rewşa, halê

305. îsm: navdêr

306. mu'reb: tewangbar

307. emma: lê, lêbelê, bes

308. mebniyê weku: di yên çapkirî û di ya C. de *"mebnî ku "* ye, yanî navdêrê netewangbar ku.

309. muşabih: mîna, weke, fena, nola, layî

310. muşabehet: mînatî, wekeyî, mînanî, mînahîtî

311. qerîb: nêzîk, di yên çapkirî de *"qeuî "* ye, yanî xurt, mebest jê pronovên îşarkî ne û lêkera raborî ye.

312. çi gava: di yên çapkirî de *"her cihê weku "* ye

313. waqi' bibit: têkeve, bibe

314. mewqi': cih, dews, şûn

315. musenna: dual, dualî, cotane

316. Dê mu'reb bit: wê tewangbar be, wê bê tewandin

317. ba'dek: hinek, çendek

318. 'hurûf: piraneya 'herf e mebest pê dengdarên dirêj in

319. me'hellî: bi binehî, bi cigehî, cihgirî, yanî meriv yê netewangbar di cihê tewangbarî de hesab dike û li wê gorê tewange didê, hingê tewangeya wî dibe cigehî.

320. ya'nî bî el-elîf ref'an: ev hevok ji ya destxet kêm e; yanî kirdebarî (pêşebarî) ya wî bi elîfê (ا) ye û elîf di cihê pêşê (dengdara u) de tê hesabê.

320. ref': kirdebarî, pêşebarî

321. we bî el- yaî nasben we cerren: servebarî (ziberbarî) û xwedîbarî (zêrbarî) ya wî jî bi yaê (ي) ye; yanî *ya* dikeve dewsa ziber û zêrê (dengdarên e, i, î) û dibe tewangeya cigehî.

322. lakîn: lêbelê, bes

323. ma: tişt, yê, ya, yên

323. 'eda: ji bilî, xeynî

323. ma 'eda: ji bilî, xeyn ji

324. wan: di yên çapkirî de *'we "* ye, yanî ji bilî dualî ku ew jî tekane û pirane ne.

bi temamiya (325) 'herekatê (326) me'hllî ne. Ev e 'hukmê îsmê mebnî (327). Emma heçîka Fi'la bi xeyr ji fi'la madî (328) we emrê bi sîxe (329) we mue'kkedê bi "nûna seqîle" (330) we fi'la cem'a mue'nnesan, (331) lewra ew mebnî ne (332), tu nezer ke (333): Yan xalî (334) ye ji "nûna" e'eraba (335) weku la'hiqî axirê fi'lê dibit (336) di pey "elîf" û "waw" û "ya"a demîrê de (337) yan ne (338). Eger xalî ye, ew jî yan lam ul-fi'l (339) se'hî'h e (340) yan ne. Eger se'hî'h bit dê merfû' bit bi demmê (341), mensûb bit bi fethê (342), meczûm bit (343) bi 'hezfa 'herekê (344) lefzen (345) di hersiyan de çi salim bit çi ne (346).

---

325. temamî: tevayî, gişti

326. 'herekat: ser û ber, zêr û ziber yanî dengdarên kurt

327. mebnî: netewangbar

328. Emma heçîka fi'la bi xeyr ji fi'la madî: piştî danezanîna tewangbarî û netewangbariya navdêrî û awayên tewangeya wî, nivîskarî rabû dest bi rewşa tewangeya lêkeran kir. Yanî heçî rewşa lêkeran ji bilî ya raborî.

329. we emrê bi sîxe: û raweya fermanî

330. we mue'kkedê bi "nûna seqîle": û ew lêkera ku bi nûna(نْ) giran (fonemşidandî) hatibe eseyî û sexbirî kirin, mîna: *"le yensurenne"* bêguman wê ew alîkarî bike.

331. we Fi'la cem'a muennesan: ev hevok di ya çapkirî de weha ye: *"We fi'lu cemʻetî el-mueʻnnesî"*, ango û lêkera mê ya pirane.

332. Lewra ew mebnî ne: yanî çima ji bilî van? Çiku evên me gotî netewangbar in. Di yên çapkirî û ya C. de weha ye: *"Lewra ew jî mebnî ne"*.

333. Tu nezer ke: yanî ji bilî vanên ku me jimart încar tu li yên mayî binihêre, di yên çapkirî de *"nezer bike"* ye

334. xalî: vale, bêtişt

335. nûna e'eraba: di yên çapkirî de *"nûna e'erabê ya"* ye, ango paşdaniya nûn (نْ)ê ku di lêkerên piranî dual û tekaneya kesa duyemîn de dibe nîşana tewangeyê.

436. weku la'hiqî axirê fi'lê dibit: ew nûna ku bi dawiya lêkerê ve dizeliqe.

337. Di pey "elîf" (ا) û "waw" (و) û "ya" (ي) a demîrê da: di zimanê Erebî de ev hersê tîpên ku me qal kir di pirane û dual de, her weha dema ku ji bo kesa duyemin be pronav têne hesabê û nûna ku li pey wan jî tê nîşana tewangeyê ye. (11)

338. yan ne: yan ew nûn tê de heye, ji ber ku elîf, waw û ya qebûla tewandinê li xwe nakin loma nûn ji pêla wan ve tê tewandin. (12)

339. lam ul-fi'l: tîpa bêdeng ya dawiya reha lêkerê; di yên çapkirî de *"wê"* jî heye.

340. se'hî'h e: tekûze, bê ku ji tîpên nîşana jariyê ("elîf":ا, "waw":و û "ya":ي) xalî ye.

341. Dê merfû' bit bi demmê: wê kirdebariya wê bi pêşê be, yanî wê dengdara dawî, ku nîşana tewngeya wê ye, pêş be.

342. Mensûb bit bi fet'hê: wê ziberkêşî û ziberbariya wê jî, yanî ku daçeka ziberger (نَ) bê ser û wê bitewîne dê tewangeya dawiya wê bi ziber be.

343. meczûm bit: wê rawestkêş û rawestbar be

344. bi 'hezfa 'herekê: bi jêbirina dengdara kurt

345. lefzen: bi bêjeyî, berbiçav

346. çi salim bit çi ne: di yên çapkirî de weha ye: *"mutleqen, ya'nî çi salim bit çi ne"* yanî gava tîpa bêdeng ya dawî ne yek ji tîpên jarî be hingê lêker bi tevayî tekûz be yan na, bê weku yek ji herdu tîpên din ya jarî be jî, disa rewşa tewandina wê naguhire.

Eger mu'tel el-lam (347) bit dê merfû' bit teqdîren (348), meczûm bit bi hezfa lam ul-fi'lê (349) mutleqen (350), mensûb bit (351) lefzan eger bi "waw" û "ya" ne (352), teqdîren eger bi "elîf" ê ye (353). Eger xalî nine ji "nûn" a e'erabê (354) dê merfû' bit bi subûta "nûn" ê, (355) mensûb û meczûm bit bi suqûta "nûn" ê (356) fi el-kullî mutleqen (357). Her wekî hatiye zanîn di "Tesrîf "ê da (358). We Allhu e'elemu bi es-sewab (359) we îleyhî el-mercî'û we el-me'ab (360).

---

347. **mu'tel ul-lam**: yanî tîpa bêdeng ya paşî yek ji tîpên jarî be

348. **Dê merfû' bit teqdîren**: hingê wê kirdebarî (pêşebarî) ya wê nepenî be, yanî wê pêşa (dengdara kurt "u") dawiya wê ne berbiçav be.

349. **Meczûm bit bi hezfa lam ul-fi'lê**: wê rawestbariya wê bi jêbirina tîpa bêdeng ya dawî be, yanî gava daçeka rawestgêr (ْ) hate ser, wê tîpa dawî ya bêdeng jê here.

350. **mutleqen**: ferq nake çi ew tîpa dawî "waw" be yan "ya" be yan jî "elîf" be.

351. **mensûb bit**: di yên çapkirî û di ya C. de "*dê*" heye, ango wê ziberbar be.

352. **Lefzen eger bi "waw" û "ya"** ne: ango gava tîpa dawî " waw " yan jî " ya" be wê zibera wê berbiçav be.

353. **teqdîren eger bi "elîf"** ê ye: yanî ku tîpa dawî elîf be hingê dê ziberbariya wê nepenî be û zibera wê xwuyaneke. Di destxeta C. de peyva "*yan* " jî heye.

354. **Xalî nine ji nûna e'erabê**: ku nûna tewangeyê tê de hebe, bê weku pirane, dual, yan jî ji bo kesa duyemin be; di yên çapkirî û ya C. de "*nûna mezkûre* " ye, ango ya gotî

355. **Dê merfû' bit bi subûta "nûn" ê**: wê kirdebariya wê bi mayîna tîpa "nûn" (ُن) ê be.

356. **Mensûb û meczûm bit bi suqûta "nûn "ê**: dê ziberbarî û rawestbariya wê jî bi jêbirin û jêketina tîpa "nûn"ê be, yanî gava daçeka ziberger û ya rawestger bê ser hingê tîpa "nûn" ê jê diçe.

357. **Fi el-kullî mutleqen**: bê qeyd û merc di hemûyan de, ango di hemû tîp û rewşên vanên gotî de weha ye. Ji bo ku meriv qenc tê bigihê hem divê haya meriv ji rêzimana Erebî ya kevn (serdema navîn) hebe û hem jî gere ev babet hê firehtir bê rave kirin, lê hingê jî ew gelekî dirêj dibe û derdikeve dervayî mebestê jî.

358. **Di Tesrîfê da**: mebest pê Tesrîfa Kurmancî ye, ew pirtûkeke bi kurdî ye ku qala lêkemasiya zimanê Erebî dike. Dibe ku mebest pê rêzimana Erebî beşa lêkernasiyê be jî lê ew hê bêhtir bi peyva "Serf " tê bi nav kirin, loma jî nêziktir e ku Tesrîfa Kurmancî be û ger mebest pê ew be jî hingê wê ne dûr be ku nivîskarê van herdu pirtûkan, yanî "Zirûfa Kurdî" û "Tesrîfa Kurmancî", yek kes be. Hem zimanê wan herduyan û yê Terkîba kurdî (ew jî pirtûkeke li ser rêzimana 'Erebî bi Kurdî ye) jî pir nêzî hev in, herweha li gor ansiklopediya îslamî jî nivîskarê van hersiyan yek e. (13) Lê mixab in di destê me de tu xwepêgirekî (pîştek, delîl) sed der sed nîne.

359. **We Allahu e'elemu bi es-sewab**: û Xwedê çêtir bi rastiyê dizane.

360. **We îleyhî el-mercî'û we el-meab**: û riya zivirandin û dagerandinê her bi bal wî ve ye.

Jêrenot

1) Di vê nivîsara Malmîsanij ya ku di Kovara "Tarih ve toplum" de ye, bahsa Zurûfeke ne çapkirî ya Mele Xelîlê Sêrtî jî tê kirin. Ne dûrî aqila ye ku ev Zurûfa di destê me de ya M. Xelîl be jî. Çiku ji vê Zurûfê pêştir ez rastî tu Zurûfên din nehatime û ji xwe ev jî heyanî nêzî salên 60'î (1960) nehatibû çapkirin. (Tarih ve Toplum, sayi (hejmar) 55, temmûz (tîrmeh), Iletişim Yayınları, Îstanbul, 1988, rûpel 59.)

2) The Encyclopaedia of Islam, first ed. vol. 4, Kurd û Kurdistan, New York, Leiden, 1927, r. 1154.

3) Ji pêşgotina Mehmûd Beyazîdî ya li ser pirtûka Elî teremaxî ya bi navê "Haza Kîtab Sarf Lîsan Kurdî" (Alî Taramakhî, Arabic Grammer in Kurdish Language, Sevinteenth centure A. D., Comments and Research Dr. Marouf Khaznedar, University of Bghdad, Baghdad, 1971, rûpel 27. Di dawiya hinek notên (haşîkên) ser "'Ewamila Curcanî" di r. 1'ê de, navê "Terkîba Mele Resûl" û di r. 10'an de jî navê "Terkîba Mela 'Elî" wek çavkanî derbasdibe. Herweha di dawiya hin notên ser pirtûka bi navê "Sa'dullah es-Saxîr" de ku "'Ewamila Curcanî" bi Erebî şirove dike, jî navine wusa tên. Li wir di rûpelê 72'an de wek çavkanî navê "Terkîba mela 'Elî eş-Şeyxanî" û di rûpelên 77, 92, 94, û 95'an de jî "Terkîba Mela 'Elî" derbasdibe. Bes wek naverok ew not û "Terkîba" ku di destê me de ye qet hev nagirin, ji xwe jî bilî ya pêşiya "'Ewamila Curcanî", ku li ser navê "Mela Resûl" e, cihên din giş nakevin ber hukmê vê "Terkîba" ku di destê me de ye. Yanî xuyaye ku wê Terkîbê heyanî dawiya "'Ewamila Cucanî" şirove kiriye, lê ya di destê me de, çawa ku bihûrî, bi tenê rûpelê pêşî yê "'Ewamila Curcanî" şirove dike. ('Ebd el-Qahir el-Curcanî, 'Ewamil, ji nav Hazihî Mecmû' er-Resaîl en-Ne'hwiyye el-Cedîde, weşanaxane ne diyar e, n. p. (no place), n. d. (no date))

4) Abdulreqîb Yûsif, Şaîrên Klasîk ên Kurd, Jîna Nû Uppsala /Sweden, 1988; (Elî Şêr ji têpên Erebî guhertiye yên latînî), r. 20, 21, 22, 23.

5) Qenadê Kurdo, Tarîxa Edebyata Kurdî, Roja Nû, Stockholm, 1983, r. 40, ji A. Jaba, Recuil, de notice et recits kourds, ruyê 18-19.

6) Ji lêkolîna Marûf Xeznedar ya li ser berhema Elî Teremaxî ya ku navê wê li jor bihûrî, rûpel 27.

7) Ji noteke ser Zurûfa Kurdî, ji nav (Hazihî Mecmû' er-Resaîl en-Ne'hwîyye el-Cedîde, weşanaxane ne diyar e, n. p., n. d., r. 17). Christopher Toll, Den Arabiska Litteraturen, P. A. Norsted & Sönners Förlag, Stockholm, n. d., r. 86.

8) Ji Zurûfa Kurdî a nota 7'an. "Den Arabiska Litteraturen" a nota 7'an, r. 86.

9) "The Encyclopaedia of Islam, The University of Manchester, Manchester/England 1982, new edition Supplement fascicules 5-6 and vol. VII, r. 913. The Cambridge History of Arabic Literature, Religion, learning, and science in the 'Abbasid Period; Ed. by M. J. L. Young, J. D. Lathem and R. B. Serjeant, Camgridge University Press, Cambridge, 1990, r. 121.

10) Ji kurteraveyeke (haşiyeke) ser Zurûfa Kurdî ku ji "Cami"yê (navê kitêba 'Ebd er-Rahman Camî ye) hatiye girtin, r. 20. (Hazihî Mecmû' er-Resaîl en-Ne'hwîye el-Cedîde)

11) [Tesrîfa Mele Eliyê Şinoyî], Elî îbn Şêx Hamid el-Eşnewî (Şinoyî), 'Tesrîf', el-Mektebe el-Erebîyye, Bexdad, n. d., r. 52. Muhemmed îbn Ecrûm, Ecrûmîyye, Brünnow/Fischer çap 7 Otto Harrassowitz / Wiesbaden 1988 r. 172-173. îbn el-Hacib, Kafiye, ji nav "Muqeyyed Ne'hw Cumlesî", Salah Bilici Yayınlan, İstanbul, n. d., r. 72.

(12) Li nota 11 binihêre!

(13) The Encyclopaedia of Islam, first ed., New York, Leiden, 1927, vol. 4, Kurd û Kurdistan, r. 1154.

TERKÎBA KURDÎ

YA

MELE YÛNISÊ HELQETÎNÎ

Tu bizan! Du mezheb (1) carî (2) bûne (3) di terkîba (4) " Bîsmîllahî" (5) da: Mezhebê Besriyan (6), Mezhebê Kûfiyan (7); li mezhebê Besriyan cumleyê fi'lî ye (8) li mezhebê kûfiyan cumleyê îsmî ye (9).

---

1. **mezheb**: rêgeh, rêçik
2. **carî**: herek, herikî, rewan
3. **carî bûne**: rewan bûne, li vir çêbûne, hatine
4. **terkîb**: hevdudanî, li vir hevokdanî, hevoksazî
5. **bîsmîllahî**: (bi îsmî Allahî) Ango binavê Xwedê, ev beşek ji risteya pêşî ya destpêka Quranê ye, tevahiya wê: "Bismîllah îr-Rehman îr-Rehîmî" ye, ango bi navê Yezdanê pak î dilovan û mihrîvan. Ji yek beşekê pê ve, ew (bîsmîllahî. . .) di destpêka her beşa (sûret) Quranê de tê; ji xwe di nav ol û toreya îslamê de her pirtûk, hema çi bê her kar jî, pê tê vekirin; pirtûka ku destpêka (ser fetiha) wê ne pê be bê bereket (zêdayî, xêr û bêr) tê hesabê.
6. **mezhebê Besriyan**: Di rêzimana Erebî de dîtin û rêgehên heri pêşî, ku timî li hember hev derketine du heb in. Digel ku piştre li Bexdayê yeke din jî derket û ji bo yekîtiya van xebitî jî, lê dîsa yên bingehîn û sereke ev herdu ne. Yek ji wan ya Besriyan e; ji ber ku destpêka vê dîtinê ji bajarê Besreyê, ku dikeve başûrê îraqa niha, derketiye û bingehê dibistana wan jî li wir hatiye avêtin, ew bi rêgeha Besriyan hatiye bi navkirin. Xebata vê rêgehê danîna qaîdeyan ji bo zimanê Erebî li ser bingehê hîwuşî, pîvanberî û qandîtiyê bû. Rêzimannasên sereke ku vê dîtinê parastien ev in: Sibeweyhî, Exfeş, Muhemmed, Salih îshaq, Ebûbekr, îbn (kurrê) Durusteweyhî, Muhemmed îbn Sebirman, îbn Kîsan Ebû (bavê) el-Hesen, Zeyd, 'Elî, Muhemmed îbn el-Huseyn, Ebû el-Fet'h, 'Elî îbn Mu'min, eş-Şelûbîn, Suleyman îbn îsa, serokê van gişan jî Sîbewehiyê îranî bûye (1) Di destxetê de "emma mezhebê Besriyan" e.
7. **mezhebê Kûfiyan**: Yek ji wan rêgehan jî ya Kûfiyan e ku bingeh û dibistana wê li bajarê Kûfeyê bûye. Xebata vê rêgehê jî li ser danîna qaîdeyên zimanê Erebî li gor rewşa ziman ya heyî bûye, bê pîvanberî û hîwuşî. Rêzimannasên ku di bin pêşikvaniya Kessaî de vê dîtinê diparastin ev in: el-Kessaî, el-Ferra', Muberred, Ebû el-'Ebbas, îbn el-Enbarî, û Yusuf. (2) Di destxetê de "emma mezhebê" ye.
8. **cumleyê fi'lî ye**: hevokê lêkerî ye, çiku destpêk (li gor rêgeha Besriyan) bi lêkereke nepenî ye, mîna *"eqreû bî îsmî Allah "* bi navê Xwedê ez dixwînim.
9. **cumleyê îsmî ye**: hevokê navdêrî ye, çiku li gor Kûfiyan jî destpêk bi navdêrekî nepenî ye, mîna *"qîraetî bîîsmîllahî "* xwendina min bi navê Xwedê ye.

Emma (10) li nik mezhebê besriyan "ba" (11) 'amilê (12) lefzî (13), sema'î (14) herfek (15) ji hurûfê (16) carr e (17). Wadi'ê (18) wed'a (19) wê kiriye ji bo musa'hebe (20), yan ji bo mulabese, (21) yan ji bo îstî'ane (22). Mebniyê (23) lafz el-kesr e (24) bînaekî eslî ye (25), lewra mebnî jî li du qisman e (26): mebnî ul- esl e (27) ku fi'la madî (28), emrê bi sîxe (29), herf (30), cumle (31) ne; yan mebnî ul-'aridî ye (32) ku ma 'edaê (33) wan ji mebniyatan e (34). Mebnî ul-'aridî jî li du qisman e (35): lazimî ye (36) bê weku tu cara mu'reb (37) nabî wekî niha demaîr we xeyrê wan (38).

---

10. **emma**: heçîka, lêbelê, bes, lê, heçî, di çapa destxet de "emma bînaen li mezhebê" ye.
11. **ba**: tîpa " b" (ب) ya pêşiya "bî ismîllahî"
12. **'amil**: tewangdêr, tewangêr
13. **lefzî**: berbiçav
14. **sema'î**: bihîstî, sehkirî li vir bi lêkolînî
15. **herfek**: tîpek, li vir daçekek
16. **hurûf**: piraneya " 'harf " e ango tîp, li vir daçek
17. **carr**: zêrger, ango daçeka zêrger e ku navdêrê pey xwe bi zêr (dengdara "i, î") dide xwendin, di destxetê de "carre ye" ye.
18. **wadi'**: daniyar, danêr, çêker, sazkar
19. **wed'**: danîn, çêkirin, sazkirin, cihdan
20. **musa'hebe**: hevaltî, xweyîtî. xwedîtî
21. **mulabese**: peywendî, têkilî, destdan
22. **îstî'ane**: alîkarî, daxwaza alîkariyê
23. **mebnî**: netewangbar
24. **lefz el-kesr e**: bi zêr tê bilêvkirin
25. **bînaekî eslî ye**: ger "bi" yek hebûna dê xweştir bûna, ango bi netewangbariyeke bingehî.
26. **Lewra mebnî jî li du qisman e**: ev bersiva pirseke nihênî ye, ango bo çi netewangbariyeke bingehî? " Çiku du beşên netewangbariyê jî hene". Di destxetê de peyvika "jî" nîne.
27. **mebnî ul-esl e**: netewangbarê bingehî ye
28. **fi'la madî**: lêkera (dema) raborî
29. **emrê bi sîxe**: raweya fermanî
30. **herf**: tîp, daçek, veqetandek, paş - û pêşdanî, gihanek, gihandek
31. **cumle**: hevok, komek, di destxetê de ev der weha ye: "demaîr we emrê bi sîxe we muekkedê bi nûna seqîle we 'herf we cumle ye.
32. **mebnî ul-'aridî**: netewangbarê peydabûyî, ango ne eslî ye lê ji ber hinek sedeman bûye netewangbar, di ya destxet de peyvika "*yan*" kêm e.
33. **ma 'eda**: yên mayî, yên din.
34. **ji mebniyatan**: ji netewangbaran, ji bilî wan netewangbarên ku me got yên din hemû, yên peydabûyî ne.
35. **Mebnî ul-'aridî jî li du qiman e**: netewangbarê peydabûyî jî du beş in
36. **lazimî ye**: pêwîstî ye, gerekî ye, li vir hertimî ye
37. **mu'reb**: tewangbar, navdêrê ku tê tewandin
38. **demaîr we xeyrê wan**: pronav û yên ji bilî wan, di ya destxet de weha ye: "*demaîr we esmaul-ğayret we mewsûlat we xeyrê wan*" yanî pronav, pronavên peywendiyê, yên nîşandanê û yên din.

Yan xeyrê lazimî (39) ye bê weku geh mu'reb e geh mebnî weki niha "qebl"o we "be'd"o (40).
îsm: (41) îsmekî mufred î me'erîfe ye (42) bi sebeb (43) îdafedana (44) wî bi bal ma be'dê (45) xwe ve ku Allah e, (46) bi îdafekî me'newî (47). Lewra îdafe jî li du qisman e (48): me'newî ye ku îdafa xeyrê (49) sîfetî (50) bi bal me'emûlê (51) xwe ve, yan îdafa sîfetî ye bi bal xeyrê me'emûlê xwe ve wekî niha "mesarî'û Misre"(52). Ew jî (53) faîda te'rîfê(54) didit eger mudafu îleyhiyê (55) wê me'rîfe(56) bit wekî niha di êre(57) da, yan faîda texsîsê didit (58)

---

39. xeyrê lazimî: ne pêwistî, li vir ne hertimî, ango carna netewangbar in lê carna jî dibin tewangbar.

40. "qebl" o we "be'd" o: Yanî mîna bêjeyên "qebl " û "ba'd" ku di sê cihan de tewangbar in lê di cihekî de (gava mebest pê wateyên wan in) netewangbar in. (3)

41. îsm: peyva îsm ya di "bîîsmîllahî " de, ango nav, navdêr

42. îsmekî mufred î me'rîfe ye: navdêrekî tekane û binavkirî ye

43. bi sebeb: ji ber, bi sedem

44. îdafe: tarîfkarî, nasandin, pêvedanîn, lêzêdekirin

45. ma be'd: yê i pey, yê pişt, yê ku li pey tê, lipeyhatî, bêje yan jî hevokê ku li dû tê.

46. Allah: navek ji yên Xwedê ye, ango peyva îsm bi bal navê Xwedê ve hatiye dayîn û ji wê bûnê jî bûye nasdar çiku di zimanê Erebî de (çawa ku wê nivîskar jî bibêje) pênc sedemên binavkirinê hene, yek ji wan jî nasandina (îdafeya) bi ser navdêrekî binavkirî ve ye.

47. ma'newî: rêzimanî, wateyî

48. Lewra îdafe jî li du qisman e: çiku du beşên tarîfkariyê hene loma jî nivîskarî got "bi îdafekî ma´newî ".

49. xeyr: ne, bil, bilî, xeynî

50. sîfet: xuyadar, diyargîn, li vir rengdêr, xurdezad

51. me'mûl: tewanggir, tewandî, yê ku tê tewandin, yanî tarîfkariya wateyî ew e ku navdêrek bi bal tewnggirê (yê ku hatiye tewandin) xwe ve bê dayîn mîna "xulamu Zeydin" (rêncberê Zeyd), Zeyd li vir nasdêr e ji bo navdêrekî ne xurdezad (ne afirandiyê ji lêkerê) ku xulam e. Di destxetê de ev nîvrêza han jî heye "wekî niha xulamu Zeydîn dibêjî".

52. mesarî'û Misre: deriyên Misrê yên duqane; bingehê wê "mesarî'û ehlî el- Misrî " ye ango deriyên gelê Misrê yên duqane. Di vir de "mesarî" bi bal "Misre" ve hatiye dayîn û ew ne tewanggirê wê ye, çiku tewnggirê wê "ehlî" ye. Di ya destxet de peyva "dibêjî" jî heye.

53. ew jî: nasandina (îdafeya) rêzimanî jî, di ya destxet de peyvika "jî" nîne.

54. faîda te'rîfê didit: kelka binavkirinê dide, yanî navdêrî binav dike û did naskirin.

55. mudafu îleyhî: tarîfkir, nasdêr, di destxetê de "mudafu îleyhiyê wê" ye.

56. me'rîfe: binavkirî, naskirî.

57. êre: vir, hire, yanî di hevokê " bî îsmîllahî" de.

58. faîda texsîsê didit: kelka taybetmendiyê dide.

eger mudafu îleyhî nekîre bit (59) wekî niha "xulamu reculîn" (60) dibêjî. Yan lefzî ye (61) ku îdafa sîfetî (62) ye bi bal ma'mûlê xwe ve wekî niha darîbû Zeydin (63) dibêjî. Ew faîde nadit îlla (64) texfîfa (65) bi hezfa nûnê (66) di tesnî û cem'an de (67), yan bi hezfa tenwînê (68) di mufredatan de (69) eger bi ma'na hal (70) û îstîqbal (71) bit, eger bi ma'na madî (72) bit ew faîde didit (73) wekî niha "El-'hemdu lillahî fatîr îs-semawatî we el-erdî" (74) dibêjî. Lefz mecrûr (75) cerre bi kesr e (76), carr

---

59. mudafu îleyhî nekîre bit: Yanî gava nasdêr (balvedêr) nebinavkirî be hingê nasandî (mudaf) nabe binavkirî lê bi taybetmendiya xwe ji yên dî cuda dibe.

60. xulamu reculin: rêncberê zilamekî, li vir "xulam" bûye yekî taybetî ango xulamê zilamekî ne yê jinekê yan jî xulamek ji xulaman.

61. yan lefzî ye: yan nasandina wateyî ye çawa me li pêş got, yan jî nasandina berbiçav e.

62. sîfet: rengdêr, li vir xurdezad

63. darîbu Zeydin: yê ku li Zeydê dide

64. îlla: bil, xeyn, bilî

65. texfîf: sivik kirin, hêsayî kirin

66. 'hezfa nûnê: jê ketina tîpa "n" (ن) ya Erebî. Di çapekê de *"bî hezf en- nûn"* e.

67. di tesnî û cem'an de: ango di dual û piraneyan de ew "n" (ن) jê diçe, mîna "darîba Zeydîn" ku eslê wê "darîbanî" bû û "darîbû Zeydîn" jî ku bingehê wê "darîbûne" bû, ev hevok di ya çapkirî de nine.

68. 'hezfa tenwînê: jê ketina nûngiriyê (ٌ ٍ ً : un, en, în). Di çapekê de *"bî 'hezf et tenwîn"* e û di ya destxet de jî peyvika "'hezf" tune

69. di mufredatan de: yanî nasindina berbiçav di tekaneyan de jî, ji bo sivikbûn, nûngiriyê jê dixîne, mîna "darîbu Zeydîn" ku eslê wê "darîbun" bû. Ev hevok di ya çapkirî de tune.

70. 'hal: "zeman el-'hal" dema niho

71. îstîqbal: yanî "zeman el-îstîqbal" dema dahatû

72. madî: yanî "zeman el-madî" dema raborî

73. ew faide didit: ango gava mana dema raborî bide hingê ew balvedayiyê xwe bi nav dike û digerîne nasdar, di destxetê de "ew faîda te'rîfê didit" e.

74. El-'hemdu lillahî fatîrî es-semawatî we el-erdi: pesn û payedarî ji Yezdanê afirînende yê erd û esman re be. Li vir, ji ber ku afirandina erd û esmana di dema bihûrî de çêbûye, peyva "fatir" dibe binavkirî çiku nasandin mafê binavkirinê dide.

75. lefz mecrûr: Bi zêrê (dengdara "i,î") tê bilêvkirin, di destxetê de "lefz mecrûrê bi yaê" ye lê xuyaye ku şaş e.

76. Cerre bi kesr e: nîşana zêrbarî wê zêr e. Di zimanê Erebî de tewange bi tewandin û guhrandina paşiya bêjeyê çêdibe. Ew tewange geh berbiçav tê geh jî nepenî yan jî binvehî tê, ew jî li gor daxwaziya tewangdêrê xwe dibe çar beş:

1. *Kirdebarî* (رفعة) ku di zimanên Ewropî de jê re *nomînative* tê gotin.
2. *Servebarî* (نصبه) ku di zimanên Ewropî de dibe *accusatîve*.
3. *Zêrbarî* yan *xwedîbarî* (جرّه) ku di zimanên Ewropî de dibe *genîtîve*.
4. *Rawestbarî* (جزمة/جزم) ku Ewropî jê re *jussîv* dibêjin; dema xwendinê meriv li ser

û mecrûr (77) zerfê xass e (78), mute'elliqê (79) bi fi'leke muqedder (80) ve ye di hukmê (81) melfûzî (82) da ku "eqre'û" (83) ye li nik essehî (84).

---

radiweste. Hersiyên pêşî ango kirdebarî, servebarî û zêbarî yan xwedîbarî ji bo nîşana tewangeya navdêrî ne lê herduyên pêşî tevî ya dawî ango kirdebarî, servebarî û rawestbarî jî nîşana tewangeya lêkerê ne.

Her yek ji wan jî çend dirûvên wan hene:

pêş (ضمه = ـُ ـٌ), *waw* (و), *elîf* (ا) û *nûn* (ن) nîşanên kirdebariyê ne.

Pêş di çar cihan de tê: di navdêrê tekane de, di piraneya bêqaîde de, di piraneya tekûz î mê de û di lêkera dudemî (مضارع) ya sade de.

waw jî di du cihan de tê: di piraneya tekûz de û di şeş heb navdêr de, ku ji wan re (أسماء الستة) esma us-sîtte tê gotin.

Elîf jî di navdêrê dual de tê.

Nûn jî ji bo lêkera dudemî ye, lê bi şertê ku ew dual, yan pirane, yan jî ji bo kesa duyemîn be.

Pênc nîşanên servebariyê jî hene:

1. *Ziber* (فتحه = ـَ) di sê cihan de tê:
Navdêrê tekane, navdêrê pirane yê bêqaîde û lêkera dudemî ya sade.
2. *Elîf* di her şeş navdêrên li jor bihûrî de tê.
3. Zêr (كسره = ـِ) di piraneya tekûz î mê de tê.
4. *Ya* (ي) di pirane û dualan de tê.
5 *Jêketina nûnê* (حذف) jî di wan lêkerên ku kirdebariya wan bi hebûna nûnê ye, de tê.

Nîşanên zêrbariyê (xwedîbarî) jî sisê ne:

1. *Zêr* ew jî di sê cihan de tê: di navdêrê tekane yê *tewînbar* (منصرف =munserif, yê qabilê tewandinê) de, di navdêrê pirane yê bêqaîde î *tewînbar* de, û di piraneya tekûz î mê de.
2. *Ya* ew jî dîsa di sê cihan de tê: Di her şeş navdêran de û di dual û piraneyan de.
3. *Ziber* di navdêrê *nîvtewînbar* (غير منصرف), ku her cureyê tewangeyê nastîne, de tê.

Ji bo *rawestbariyê* jî du nîşan hene:

1. *Sekn* (rawestin = ـْ) e ku di dawiya lêkera dudemî ya tekûz de tê.
2. *Jêketin* e ku di wan lêkerên dudemî yên dawiyên wan *jar* de û di yên kirdebariya wan bi *nûnê* de tê. Ji ber tirsa dirêjiyê min li vir dev ji dayîna mînakan berda lê ger ku hatibûna dayîn wê gelek xweştir çêbûna, (4)

77. carr û mecrûr: daçeka zêrger û zêrbara wê ku *" bî îsmî "* ye.
78. zerfê xass e: hokera taybetî ye
79. mute'elliq: xwepêgirtî, pêve, xwelêgirtî
80. muqedder: nepenî, nitirandî, nihênî, neberbiçav
81. 'hukm: Wek ferhengî bi mana ferwerî ye lê di vir de bi wateya rewş û mîna ye yanî weke, mîna, di rewşa, di warê, di biwara.
82. melfûz: ji dev avêtî, gotî, bilêvkirî
82. 'hukmê melfûzî: ango di rewşa lêkera gotî û bilêvkirî de ye.
83. eqre'û: ez dixwînim.
84. esseh: dîtina rasttirîn di rêzimana Erebî de.

Lewra(85) her şexsek dê fi'lê muqedder bikî ji cinsê 'emelê xwe (86). Mecrûr (87) bi tenê mensûb e (88) mehellen (89) bê weku mef´ûlu bîhiyê xeyrê serîh (90) e ji bo "eqre'û" (92) bi wasîta (93) "ba"ê (94). ´Amil di nesba (95) mef´ûlu bîhiyê xeyrê serîh da mehellen ´amilê lefzî (96) î qiyasî (97) ku fi´l e (98) li nik Besriyan, yan fi´l û fa´il e (99) li nik Ferraî (100) yan fa´il bi tenê (ye) li nik Hîşamî (101) yan ´amilê ma´newî (102) ye ku bûna wî ye mef´ûl li nik ba´dekî (103) ji Kûfiyan (104) ku Ehmed (105) e.

---

85. lewra: bersiva pirseke nepenî ye, ango çima *"eqre'û"* û ne lêkereke din?

86. Lewra her şexsek dê fi'lê muqedder bikî ji cinsê 'emelê xwe: çiku her yek wê li gor celebê kar û xebata xwe lêkereke nepenî bihesibîne; bê weku yê bixwîne wê bêje: "ez dixwînim" yê bixwe dê bêje: "ez dixwum" û her weha yên dî. Di ya destxet de "şexsekî/ê" û di şûna "ji" de jî "bi" ye.

87. mecrûr: zêrbar, navdêrê bi zêr (dengdara kurt "i, î") ku li vir *"îsm"* e.

89. mensûb e: servebar (accusative) e, bi zibera (dengdara kurt "e") nîşana kirdebariyê ye, ziberbar e.

90. me'hellen: bi cîgehî, binvehî, ji bin ve

91. mef'ûlu bîhiyê xeyrê serîh: serveyê neyekser

92. eqre'û: ez dixwînim

93. wasîta: pergal, cewet, navgîn

94. baê: daçeka zêrger, *"b "* (ـ)

95. nesb: servebarî, ziberbarî.

96. 'amilê lefzî: tewngdêrê berbiçav.

97. qiyasî: pîvanbar, qeysdar (analogical)

98. fi'l e: ango tewangdêrê serveyê neyekser lêker e.

99. fi'l û fa'il e: yanî tewngdêrê wê kirde û lêker bi hev re ne.

100. Ferraî: Ye'hya Ebû Zekerya ed-Dylemî (761-822) yek ji rêzimanzan û ferhengnasê rêgeha Kûfiyan e. Ferraî şagirtiyê Ebû Hesen 'Elî îbn 'Hemze ye û perwerdekariya Me'mûnê Kurê xelîfeyê Ebbasiyan, Harûn er-Reşîd kiriye. Ew li bajarê Kûfeyê ji diya xwe re çêbûye û li ser riya Mekkeyê miriye. Herdu pirtûkên wî yên bi navê "el-'hudûd" û "Me'anî el Qurán" navdar in.(5)

101. Hişam: îbn el-'Hekem (805 mirin) yek ji nivîskarê pêşî yê îslamê ye di rêgeha Kûfiyan de û pirtûka wî ya "el-Elfaz" di şerî´etê (zagona îslamî) de navdar e. (6) Lê li gor "Muhhammed el-Emîr", ku ji "Wechîzade" girtiye, navê wî yê temamî Ebû ´Ebdullah Hîşam îbn Me'awiye ed-Derîrî ye; ew yek ji hevalên Kessaî ye û di sala 822'an de miriye.(7)

102. 'amilê me'newî: tewangdêrê wateyî/rêzimanî

103. ba'dek: hinek lêdi ver de yek

104. ji Kûfiyan: ji rêgeha Kûfiyan

105. Ehmed: min di biwara vî de tu agahdarî nedît; ew dibêje tewngdêrê serveyî tewngdêrê wateyî ye, ku ew bûyîna wî ya serve bixwe ye.

Eqreû (106) 'amilê lefzî î qiyasî fi'la mudari' (107), mebnî ye ji bo fa'ilê (108) mewdû' e (109) ji bo metekllim wehdehu (110) di 'haletê ref'ê da (111). Lefz merfû' (112) ref'e bi demm e (113), 'amil di ref'a wê da lefzen 'amilê ma'newî ye ku wuqû'a (114) wê ye di mewqî'ê (115) "îsm"ê da li nik Besriyan, yan tecerruda (116) wê ye ji 'ewamilê (117) lefzî ku cewazim (118) û newasib (119) in li nik Kûfiyan, yan 'amilê lefzî î qiyasî herfa mudare'etê (120) ye li nik Kessaî (121) ji Kûfiyan. Fa'ilê wê (122) tê da mustetir e (123) bi îstîtareke (124) wacib (125) ku emrê (126) me'newî (127) ye,

---

106. **eqreû**: ez dixwînim, piştî ku nivîskarî li pêşiya "bî îsmîllahî" cih da lêkereke nepenî rabû dest bi danenasîna wê kir.

107. **'amilê lefzî î qiyasî fi'la mudari'**: lêkera "eqreû" lêkereke dudemî û tewangdêrekî berbiçav î pîvanbar e.

108. **mebnî ye ji bo fa'ilê**: lêkera lebatî ye

109. **mewdû'e**: danînî ye, hatiye danîn

110. **mutekellim we'hdehu**: kesê/a yekemîn

111. **di'haletê ref'ê da**: ji bo kirdebarîyê ango dibe kirde, di destxetê de "halê ref'ê da" ye.

112. **lefz merfû'**: bi pêşê (dengdara "u") tê bilêvkirin

113. **ref'e bi demm e**: yanî dirûvê kirdebariya wê pêş e, di ya destxet de bêjeya "ref'e" nîne.

114. **wuqû'**: bûyîn, ketin

115. **mewqi'**: cih, şûn, yanî li gor Besriyan ew ketina lêkerê ya cihê navdêrî dibe sedem ji bo tewandina wê; mîna "yedribu"ya "Zeydun yedribu" ku lêkera dudemî ye, ketiye şûna navdêrê afirandî ango "daribun"a di "Zeydun daribun" de.

116. **tecerrud**: valebûn, xalîbûn

117. **'ewamil**: piraniya 'amil e ango tewangdêr, yanî ew nebûna tewangdêran û xalîbûna wan ji ser, wê ditewîne.

118. **cewazim**: piraneya "cazim" e yanî rawestgêr

119. **newasib**: piraneya "nasib" e yanî ziberdêr

120. **'herfa mudare'etê**: ango tewangdêrê lêkera dudemî ew pêşdaniya ku nîşana wê ye, ew jî tewandêrekî pîvanbar û berbiçav e.

121. **Kessaî**: Ebû el-'Hesen 'Elî îbn 'Hemze (805 mirin) rêzimanzan û hîmdarê rêgeha Kûfiyan e. Ew li bajarê Kûfeyê hatiye dinê, li wir û li Besreyê xwendiye û bûye yek ji heft Qurànxwînên xwey rêgeh. Ew li nav qebîleyên çolane û li nav gel geriyeye û li ser zimanê Erebî xebitiye. Wî mamosteti û perwerdekariya zarûyên xelîfeyê Ebbsiyan, Harûn er-Reşîd, kiriye û li Reyê (bajarekî kevn e li bakurê îranê) canê xwe sîpartiye axa sar, pirtûka wî ya bi navê "Risale fî ma yal'han fihî el-'amme" heye.(8) Lê li gor "muhemmed el-Emîr" (pirtûkek e) ew yan di sala 798-99, yan jî di sala 804'an de miriye û hevalbendê Ebû Henîfe Nî'man îbn Sabit, hîmdarê rêgeha Henîfî, bûye. (9)

122. **Fa'ilê wê**: kirdeyê wê, di destxetê de "*fa'îlê xwe* " ye.

123. **mustetir**: veşartî

124. **îstîtare**: veşartin, di ya destxet de "*îstîtarekî* " ye.

125. **wacib**: pêwîst, bivênevê, di ya destxet de "*wacibî* " ye, yanî pêwîstî.

126. **emr**: ferman, fermandarî

127. **emrê me'newî**: yanî li gor rewşa wateyî û rêzimaniyê divê ew veşartî be.

mu'ebberu 'enhu bi "ena" ye (128), mehzûf e (129) heqîqeten (130).
Ena: (131) îsmekî mufred î me'rîfe ye (132) bi sebeb demariyetê(133); demîra mustetir (134) merfû' e(135), muttesil e (136), mebniyê lefz el-feth (137) yan sikûn e (138). Me'helle merfû' (139) ref'e bi demm e bê weku fa'il e ji bo "eqreû"(140); 'amil di ref'a fa'ilî da (141) mehellen 'amilê lefzî î qiyasî (142) ku "eqreû" (143) ye.
Tu bizan! Mutleq(144) fa'il jî(145) li du qisman e (146): muzher e (147) yan mudmer e (148).
Mudmer jî li du qisman e (149) : bariz e yan mustetir e (150).

---

128. **mu'ebberu 'enhu bi "ena" ye**: yanî bi pronava kesê/a yekemîn, "ena", tê salixdan bê weku "ena" dikeve cihê kirdeya wê. Ji xwe di zimanê Erebî de gelek caran lêker bê kirde tê yanî kirde veşartî ye.
129. **mehzûf**: çûyî, jêketî, ketî, hekanî, winda, nexwanê
130. **heqîqeten**: bi rastî, bi rasteqînî, ji bira, eseyî
131. **ena**: pronava kesê/kesa yekemîn e
132. **îsmekî mufred î me'rîfe ye**: navdêrekî tekane û binavkirî ye, çiku li gor rêzimana Erebî bêje, yan navdêr, yan lêker, yan jî tîp (daçek, veqetandek, paş- û pêşdanî) in û pronav jî dikivin ber beşeke navdêran.
133. **sebeb demariyetê**: ji ber ku ew pronav e û ji xwe pronav jî hemû binavkirî ne.
134. **demîra mustetir e**: pironava veşartî ye.
135. **merfû' e**: bi pêş e, kirdebar e, pêşebar e
136. **muttesil e**: zeliqandî ye, pêve ye
137. **mebniyê lefz el-feth**: yanî netewangbar e û bi ziberê (dengdara kurt "e") tê bilêvkirin. Di ya destxet de ev hevok jî heye: *"eger elîf ji bo ferq bî "* ango ger "a"ya dawiya "ena"ê ji bo cudahiya navbera daçeka "en" û pronava "ena" be hingê dengdara "e" tê dawiyê.
138. **yan sikûn e**: yan jî netewangbar e û li ser tê rawestan, ango bê zêr û ziber e. Di ya destxet de ev hevokê han jî heye: *"eger elîf ji eslê kelimê ye"*, yanî ger"a"ya paşiya "ena"yê ji bêjeyê bi xwe be hingê dawî bê dengdar e.
139. **me'helle merfû'**: di cihê navdêrê bi pêş de ye, nîşana kirdebariya wê pêşa şûnwarî ye.
140. **fa'il e ji bo "eqreû"**: yanî kirdeyê lêkera nepenî ku eqreû, ye
141. **'amil di re'a fa'îlî da**: yê ku kirdeyî ditewîne, di ya destxet de *"fa'ilê wê "* ye.
142. **'amilê lefzî î qiyasî**: tewangdêrê berbiçav û pîvanber
143. **eqreû**: ez dixwînim, yanî yê ku kirdeyî ditewîne lêkera "eqreû" ye.
144. **mutleq**: bê qeyd û bend, sereke, misoger, bêtixûb
145. **fa'il jî**: kirde jî, peyva "jî" di ya destxet de tune.
146. **qism**: beş, par, tar, p işk
147. **muzher**: eşkere ango navdêr, ne pronav
148. **mudmer**: nihandî li vir pronava kesî, cihnav
149. **mudmer jî li du qisman e**: du beşên pronavên kesî hene, di ya destxet de piştî vî hevokî weha tê: *"muttesil e yan munfesil e, munfesil jî li du qisman e "*, ango zeliqandî ye yan jî cuda ye yên cuda jî du beş in. Xuyaye ku weha rasttir e.
150. **bariz**: eşkere, xwanêkirî, diyar, xwanê
150. **mustetir**: veşartî, nexwanê

Mustetir jî li du qisman e: caîz ul-îstîtar e(151) yan wacîb ul-îstîtar e (152). Wacîb ul- îstîtar jî di çar cihan da ye: ef'elu (153), nef'elu (154), tef'elu (155), îf'el(156). Ji ew paş ev fi'l digel fa'ilê xwe bi tenê li nik Zemex şerî (157), yan digel mute'elleqatê (158) xwe li nik Îbn Hacib (159) cumlekî fi'lî ye (160) la me'helle leha mîn el-e'erabî (161), lewra îbtîdaî ye (162).

---

151. caîz ul-îstîtar: yanî tê veşartin lê ne pêwîst e

152. wacîb ul-îstîtar: veşartina pêwîstî, yanî veşartin pêwîst e

153. ef'elu: lêkera dudemî ji bo kesê/kesa yekemîn

154. nef'elu: lêkera dudemî ji bo kesên yekemîn

155. tef'elu: lêkera dudemî ji bo kesê duyemîn û kesa sêyemîn

156. îf'el: raweya fermanî

157. Zemexşerî: Ebû el-Qasim Mehmûd îbn 'Umer îbn Muhemmed îbn `Umer (1041-1110) li Zemexşer, gundekî Xwarzemê ku dikeve Turkmenîstana neha, çêbûye. Ew di rêzimana Erebî, di şiroveya Qur'anê, di ferhengê û di rewanbêjî û suxenweriyê (fesa'hetê, belaxetê) de yek ji pêşengên dema xwe bûye. Ji ber ku ew cînarê Ka'abê (qîblegeh û berîgeha îslamê) bûye bi navê Carullah (Cînarê Xwedê) hatiye binavkirin. Ew yek ji zanayên Mu'tezîliyan (Bawerî û dîtinek e di ola îslamê de ku bi gelemperî, di pirsa qederê û îradeyê de ji wanên din cuda dibe) yê bi nav û deng bûye. Pirtûkên wî "el-Mufessel" di rêzmana Erebî de û "el-Keşşaf 'an 'Heqîq et-Tenzîl" jî di raveya Qur'anê de pir navdar in. Ya rêzimanî li cem lêkolînerên ewropî gelekî bi qedr e û bi bal hinek zimanên ewropî, mîna îngilîzî û Elmanî, ve hatîne wergerandin. ji bilî van pirtûkên wî "Esas el-Belaxet", "Kîtab el-Faîq fî Xerîb el-`Hedîs", "Etwaq ez-Zeheb" û "Newdîx el-Kelam" jî bi nav û deng in (10).

158. mute'elleqat: piraneya mute'elleqê ye ango xwepêgirtî ku daçek û navdêrê bi zêr tevî "er-Re'hman er-Re'hîm" in.

159. îbn `Hacîb: Ebû 'Emr, Cemaleddîn 'Usman îbn Ebû Bekr îbn Yûnis el-Misrî el-Malikî. Bavê wî yekî Kurd û li Misrê dergevanê Mîr Ezdîn bûye; navê "ibn 'Hacib" (Kurê Dergevan) jî ji wir hatiye. (11) Ew di sala 570/1174 li gundekî Saîd (bajarekî Misrê ye) bi navê gundê Asna hatiye dinê. Ew demekê li Qahîreyê jiyaye piştre derbasî Şamê bûye û li Unîversîteya Emewiyan dersdarî kiriye. Çendak di pey re dîsa ziviriye Qahîreyê û ji wir jî çûye îskenderiyê. Ew di sala 646/1248 - 49 de çûye ser dilovaniya xwe. ibn 'Hacib di rêzimana Erebî de bisporekî mezin û xwey rêgeh e; pirtûkên wî yên navdar ev in: "Kafiye" û " Şafiye " di rêzamnî de, "Meqsed el-Celîl fî 'îlmî el-Xelîl", Muxteser el-Munteha' fî el-Usûl" û "el-Muktefî li el-Mubtedî" (12).

160. cumlekî fi'lî ye: hevokekî lêkerî ye, di ya destxet de "îbtîdaî ye " jî heye

161. La me'helle leha mîn el-e'erabî: netewangbar e, nayê tewandin

162. lewra îbtîdaî ye: çiku destpêkî ye, yanî di destpêkê de ye. Ji xwe wê di pêş de bêje ku "Hevokê destpêkî netewangbar e". Ev der di destxetê de nîne.

Tu bizan! Cumleê weku me'hell ji e'erabê tunebî(163) haft in: îbtîdaiye (164), tabî'iye (165), tefsîriye (166), mu'tarîdiye (167), yan waqi' bibit sille (168), yan cewaba qesemê (169) yan cewaba şertekî xeyrê cazim(170), yan cazimê bê rabit (171).

Tu bizan! Cumleê weku me'hel ji e'erabê hebin ew jî heft in: (172) bê weku waqi' bibit xeber (173), yan 'hal (174), yan mef'ûl (175), yan mudafu îleyhî (176), yan tabi' ji bo mufredekî (177), yan cewaba şertekî cazim meqrûnê bi rabit (178), yan tabi'ê yekî ji wan (179).

---

163. **Cumleê weku me'hell ji e'erabê tunebî**: hevokê netewangbar, di ya destnivîs de di şûna "tunebî" de "tinîne" ye. Di zimanê Erebî de hevokên tewangbar hene ku dibin beşek ji bo hevokekî din û yên netewangbar jî hene ku nabin beşek ji tevgerzaniyê (hevoksaziyê) û nayên tewandin. (13)

164. **îbtîdaiye**: hevokê destpêkî, yek ji wan hevokê ku destpêkirina peyvê pê ye.

165. **tabî'iye**: yê duyemîn hevokê peyrewî ye, ango erke pêşrewê wî bê tewandin ew jî tê tewandin, eger nê tewandin peyrew jî nayê tewandin, di ya destnivîs de "we" heye.

166. **tefsîriye**: yê sêyemîn hevokê ravekarî ye, bê weku hevokekî din şirove dike ew jî netewangbar e. Di ya destxet de "we tefsîriye" ye

167. **Mu'terîdiye**: yê çaran hevokê ku ketibe navbera du parhevokan, di ya destnivîs de gehaneka "we" heye.

168. **waqi' bibit sille**: yê pêncan hevokê ku dibe peywendî, ew jî nayê tewandin.

169. **cewaba qesemê**: yê şeşan hevokê ku piştî sondê tê, ew jî nayê tewandin.

170. **cewaba şertekî xeyrê cazim**: Yê heftemîn hevokê ku dibe bersiva egerekî, bê weku dibe besiva mercê lê bê daçeka rawestandinê, mînak "ger tu rabî ez ê jî rabim" li vir "ez ê jî rabim" bersiva "ger"ê ye.

171. **cazimê bê rabit**: yanî rawestdêr heye lê daçeka girêdanê tune. Yanî ger bersiva egerê bi rawestek be bê weku tîpa dengane nê ser dawiya wê hingê ew netewangbar e, erke bê, lê daçeka hevgirêdanê pêre nê hingê jî ew nayê tewandin.(14)

172. **Cumleê weku me'hell ji e'erabê hebin ew jî heft in**: di ya destxet de "hebî jî" ye, yanî ew hevokên ku cihekî di hevokristinê de digrin ango tewangbar in û dibin beşeke hevokekî din jî heft in: (15)

173. **waqi' bibit xeber**: gava hevok bibe pêveber

174. **yan 'hal**: gava hevok bibe rewşdêr

175. **yan mef'ûl**: dema hevok bibe serve

176. **yan mudafu îleyhî**: wextê bibe nasdêr (balvedêr)

177. **tabi' ji bo mufredekî**: gava bibe peyrewê tekaneyekî, bê weku hevokê me bibe yek ji pênc peyrewan ku xuyadar (sîfet), berguhêr (bedel), sexbirî (te'kîd), diyardêr ('etf ul-beyan) û gihandî ('etfa bi daçekan) ne.

178. **Cewaba şertekî cazim meqrûnê bi rabit**: dema bibe bersiva şertê wî rawestdêrê ku daçeka girêdanê jî pê re heye.

179. **tabi'ê yekî ji wan**: gava hevok bibe peyrewê yek ji vanên me got, bê weku yan bibe xuyadar, yan berguhêr, yan sexbirî, yan diyardêr ('etf ul-beyan) yan jî gihandî ji bo yek ji wanên li jor. Di ya destxet de *"tabi'ê ji bo yekî ji wan "* e.

Emma li mezhebê Kûfiyan(180) car û mecrûr zerfê musteqerr(181) mute'elliqê bi fi'lek ji ef'alê 'am ve ye (182), yan bi îsmufa'ilek (183) ji ef'alê 'am ve ye. Çi mute'elliqê bi fi'lê (184) ve bî her weki mezhebê Besriyan cumleê zerfiye (185), çi mute'elliqê bi îsmufa'ilî ve bî (186) her weki mezhebê Kûfiyan mufredê zerfiye (187), lewra îsmufa'il digel fa'ilê xwe mufred e îlla di sê cihan de (188). Me'hlle merfû' ref'e bi demm e (189) bê weku xeber e ji bo mubtedaê me'hzûf ku "qîraetî" ye (190). 'Amil di ref'a (191) xeberî (192) da me'hellen 'amilê me'newî ye, ku tecerruda (193) wî ye ji 'amilê lefzî li nik esse'hî (194), yan kewna (195) wî ye xeber li nik Şeyx (196).

---

180. Kûfiyan: komek rêzimannasên Ereb ku zanîngeha wan li bajarê Kûfeyê bûye, di ya destxet de "emma mezhebê Kûfiyan" e.

181. zerfê musteqqer: daçeka zêrger tevî zêrbarê xwe dibe hokera têrker/cihdayî.

182. Mute'elliqê bi fi'lek ji ef'alê 'am ve ye: di ya destxet de "bit" e, xwe bi yek ji lêkerên gelêrî, mîna lêkera hebûn, bûn, çêbûn, cihbûn ve digre.

183. îsmufa'îl: parenga çalak ji wan lêkerên gelêrî ku me li jor got.

184. mute'elliqê bi fi'lê: xwepêgirtiyê bi lêkerê ve be.

185. cumleê zerfiye: yanî gava xwe bi lêkerê ve bigre hingê wê tev de bibe hevokê hokerî. Di destxetê de ev li pêşiya "her wekî" tê.

186. mute'lliqê bi îsmufa'îlî ve bî: ku xwe bi parenga çalak ve bigre.

187. mufredê zerfiye: hingê ji hokera tekbiwêj e, di ya destxet de ev li pêşiya "her wekî" ye.

188. Lewra îsmufa'îl digel fa'îlê xwe mufred e îlla di sê cihan de: ev bersiva pirsekê ye, weke ku yek pirsbike: – Gelo çima gava xwe bi parengê ve digre hingê ne hevok e belkî tekbiwêj e? "Çiku pareng tevî kirdeyê xwe ji sê cihan pê ve nabe hevok".

189. Me'helle merfû' ref'e bi demm e: (kîja ji van dibe bira bibe) her ew kirdebar e û nîşana kirdebariya wê jî pêş e.

190. Xeber e ji bo mubtedaê me'hzûf ku "qîraetî" ye: yanî ew pêgirê serwerekî winda (jêketî) ye ku peyva "qîraetî" ye. di ya destxet de "*mubtedækî*" ye.

191. ref': kirdebarî, pêşebarî, nîşana kirdetiyê

192. **xeber**: pêgir, pêveber

193. tecerruda: valebûn, xalîbûn, nebûn

194. esse'h: dîtina rasttirîn di nav rêzimannasan de

195. kewn: bûn, bûyîn, di ya destxet de "bûna wî" ye.

196. Şeyx: mebest pê Ebûbekr 'Ebd el-Qahîr îbn 'Ebd er-Rehman el-Curcanî, (mirin 471/1078) nivîskarê vê kurtepirtûka ku Terkîb wê şirove dike, ye. Ew li Curcanê (Herêmek e li Îrana niha û dikeve başûrê deryaya Qezwînê, navê nû Esterabaz e) çêbûye û li wir mezin bûye. Curcanî hê hingê gelek raman û dîtinên lîngvîst û rêzimannsên van salên dawî yên li ser rêziman û sazkirina hevokan, anîbû zimên. Ji ber vê yekê jî qedrekî wî yê bilind di nav van nifşên dawî yên rêzimanzanan de heye. Pirtûkên wî yên navdar ev in: 'Ewamîl el-Curcanî, Kîtab el-Cumel, el-Muxnî, Delaîl el-i'caz û Esrar el-Belaxe (16).

Yan 'amilê lefzî î qiyasî (197) ku mubteda (198) ye li nik Sîbeweyhî (199) we Kûfiyan.
"Qîraetî" (200) îsmekî mufred î (201) me'erîfe ye bi sebeb (202) îdafedana wê bi bal ma be'dê xwe ve ku "ya"a mutekellimê (203) ye. Lefz (204) mecrûr e bi cerra tecnîsî (205), yan teqdîren (206) yan me'helle merfû' ref'e bi demm e (207) bê weku mubteda ye, musnedu îleyhî (208) ye. 'Amil di raf'a mubtedaî da (209) teqdîren yan me'hellen (210) 'amilê me'newî ye ku tecerruda wî ye ji 'amilê lefzî li nik Esse'hî, yan kewna (211) wî ye mubteda li nik Şeyx (212), yan 'amilê lefzî î qiyasî ku xeber e li nik Kûfiyan. "Ya" (213) îsmekî mufred î me'rîfe ye bi sebeb demariyetê (214), lewra (215) kullê wan (216) me'rîfe ne. Demîr (217) bariz î muttesîl e (218), mebniyê lefz es-skûn e (219), me'helle mecrûr cerre bi kesr e bê weku mudafu îleyhî ye ji bo "qîraetî".

---

197. **'amilê lefzî î qiyasî**: tewngdêrê berbiçav û pîvanber (analogic), hevşêweyî
198. **mubteda**: serwer, kirdeyê navdêrî (nominal subjekt).
199. **Sîbeweyhî**: Ebû Bişr 'Emr îbn 'Usman (mirin 180/796); xelkê Beydaya nêzî bajarê Şîrazê ye. Ew li Besrayê jiyaye û yek ji pêşikvanên rêgeha Besriyan e. Wî li cem Xelîl xwendiye; pirtûka wî ya bi nav û deng "El-Kîtab" li ser rêzimana Erebî ye. (17)
200. **qîraetî**: bêjeya "qîraetî" ku rader e û di destpêka "bi îsmîllahî" de nihandî ye, yanî destpêka xwendina min bi navê Yezdan ....
201. **mufred**: tekane, yekhejmar
202. **sebeb**: sedem, ji ber, ho
203. **ya a mutekellimê**: Tîpa "y" ya Erebî ku dibe pronav ji bo kesê/a yekemîn. Ji xwe bihûrî ku yek ji pênc sedemên binavkirinê bal vedana (îdafeya) bi bal pronavan ve ye.
204. **lefz**: bilêvkirin, gotin, bêje, peyv, anîna ziman
205. **bi cerra tecnîsê**: bi zêrbariyeke hevcisnî, bê weku "y" li pêşiya xwe zêr (i,î) dixwaze, di ya destxet de weha ye: "*lefzen mecrûr cerre bi cerra tecnîsê*".
206. **teqdîren**: nihênî, nepenî
207. **bi demm e**: bi pê (u) e, di ya destxet de "ref'e bi demm e" tune.
208. **musnedu îleyhî**: yê ku kirin bi bal ve tê dayîn, ango serwer (mubteda).
209. **'amil di ref'a mubtedaî da**: tewangdêrê ku nîşana kirdetiyê datîne ser serwerî. Di ya destxet de "'amil di ref'a wî da" ye.
210. **teqdîren, yan me'hellen**: çi nihênî çi binvehî (şûnwarî)
211. **kewn**: bûn, bûyîn
212. **Şeyx**: mebest pê 'Ebd el-Qahîr el-Curcanî ye ku li pêş di rûpelê 12 de bihûrî.
213. **ya**: (ي) pronava "y" ku ji bo kesê/a yekemîn e.
214. **demariyet**: pronavîtî, pronavî, yanî ji ber ku pronav e.
215. **lewra**: çiku, ji ber ku, çimkî
216. **kullê wan**: gişê wan, hemûyê wan, ango pronav tev; yanî ji ber ku pironav hemû binavkirî ne û ev jî pironav e nexwe ev jî wê binavkirî be. (18)
217. **demîr**: pronav, cihnav
218. **muttesîl**: zeliqandî, pêvegirtî, di ya destxet de "*mecrûr î muttesîl* " e.
219. **lefz es-sikûn**: yanî gava bilêvkirinê li ser tê rawestandin, di ya destxet de ev hevok jî heye: "bînaekî 'aridî ye".

'Amil di cerra mudafu îleyhî da me'hllen 'amilê lefzî î qiyasî(220) ku mudaf e (221), bi wasîta (222) îdafê li nik Cumhûrî (223), yan bi wasîta herfa cerra muqedderê (224) nabeyna mudaf we mudafu îleyhî (225) li nik ba'dê, yan 'amilê lefzî î sema'î ku herfa cerra muqedder bi tenê ye li nik îbn Hacib (226). Ev mubteda digel xeberê xwe (227) cumlekî îsmî ye (228), îbtîdaî ye, la me'helle leha mîn el- e'erabî (229).

Allah (230) îsmekî mufredî me'erîfe ye bi sebeb 'elemiyetê (231), lewra "elîf lam" (232) 'îwed e (233) ji ber "hemza" (234) me'hzûfe (235) ve. Lefz mecrûr (236) cerre bi kesr e (237) bê weku mudafu îleyhî ye ji bo "îsmî". 'Amil di cerra mudafu îleyhî da lefzan (238) 'amilê mezkûrî (239) ye.

---

220. **'amilê lefzî î qiyasî**: tewangdêrê berbiçav î pîvanber (analogic), hevşêweyî

221. **mudaf**: nasandî, balvedayî; li vir mebest pê "*qîraetî* " ye.

222. **bi wasîta**: li vir bi ceweta

223. **cumhûr**: piraniya rêzimannasan, yan jî piraniya gel.

224. **herfa cerra muqedder**: daçeka zêrger ya nepenî.

225. **nabeyna mudaf we mudafu îleyhî**: yanî navbera nasandî û nasdêr, diya destxet de weha ye: "*di nabeyna mudaf û mudafu îleyhî da*"

226. **bi tenê li nik îbn Hacib**: li gor dîtina wî tewngdêrê nasdêrî daçeka zêrger bi tenê ye.

227. **mubteda digel xeberê xwe**: serwer û pêgirê wî ku "*qîraetî* " tevî "*bîsmî llahî* " ye.

228. **cumlekî îsmî ye**: hevokekî navdêrî ye

229. **La me'helle leha mîn el- e'erabî**: tu cihê wê di tewangbariyê de nîne ango netewangbar e û nayê tewandin.

230. **Allah**: Navê Yezdane ku di "bîsmîllahî" de tê.

231. **'elemiyet**: nav, serenavî yanî ji ber ku navê Xwedê ye. Ji xwe dê li pêş di rûpelê 20 de were ku serenav giş binavkirî ne.

232. **elîf lam**: mebest pê veqetandeka naskirinê ye ku "El-" e.

233. **'îwed**: cihgir, şûngir, ji ber, ji pêl, di ya destxet de "'*iwed irî*" e.

234. **hemze**: "elîf" (ا)

235. **me'hzûfe**: jêketî, çûyî, ketî. Ev hevok ji "Lewera"ê û vir ve bersiva pirseke nepenî ye. Weke ku yek pirs bike: Va ye du heb nîşanên binavkirênê, navê kesî û veqetandek bi hevre hatine ser peyva "Allah", ma ev yek di zimanê Erebî de çêdibe? Nivîskarî rabû bersiv da, got: "*lewra . . . .* " ta dawî, yanî "el-" di vir de ne veqetandeka binavkirinê ye belkî ketiye dewsa "hemze"ya "îlah"ê, çiku bingehê Allahê el-îlah e û yê wê jî îlah e, li vir "hemze" (ا: î) jê çûye û "el-" ketiye cihê wê; nexwe du nîşanên binavkirinê bi hev re nayên.

236. **lefz mecrûr**: bilêvkirin û gotina wê bi zêr e

237. **Cerre bi kesr e**: yanî nîşana zêrbarî û xwedîkariyê zêr (dengdara î, i)e.

238. **lefzen**: li gor bilêvkirinê, li gor gotinê.

239. **mezkûrî**: gotî, qalkirî, bihîstî, yanî ku li pêş di bahsa "qîraetî"de bihûrî.

Ar-Rahman: (240) îsmekî mufred î me'erîfe ye bi "lam"ê li nik Sîbeweyhî (241), yan bi "elîf lam"an li nik Xelîl(242), yan bi "hemzê" li nik muberredî. (243) Lefz mecrûr cerre bi kesr e bê weku sîfet e ji bo "Allah" (244) bi î'tîbar (245) eslê xwe (246). 'Amil di cerra sîfetî da lefzen 'amilê mewsûfî(247) ye. Yan me'rîfe ye bi sebeb 'elemiyeta xalibî (248) bê weku bedel (249) e ji bo "Allah". Bedel ul-kull e(250) ji ber kullê (251) ve bi î'tîbar îstî'mala(252) xwe. Lazim nîne (253) siqûta (254) mubeddelu mînhu (255) di êre da (256). Lewra texeyyuta (257) mubeddelu mînhu qaîdeyekî exlebî (258) ye ne ku daîmî ye (159). 'Amil di cerra bedelî da lefzen 'amilê mubeddelu mînhu ye.

---

240. er-Rahmanî: xesyetnavekî Xwedê ye, yanî mîhrîvan, dilovan, dilsoz

241. Me'rîfe ye bi lamê li nik Sîbeweyhî: Sîbeweyhiyê, ku yek ji pêşewayê rêgeha Besriyan e, dibêje veqetandek "lam"(ل: L)a "El-"(ال) bi tenê ye û tîpa (l:E) ji bo temamkirinê û bilêvkirinê tê.

242. elîf laman li nik Xelîlî: lê Xelîl dibêje na, veqetandek "el-" bi hev re ye. Xelîl îbn Ehmed el-Ezdî di rêzimana Erebî de gelekî xurt û xweyray (otorîte) bûye. Ew hîmdarê zaniyariya kêşa (wezn) helbesta Erebî ya bi navê "'arûd" e. Wî dersdariya gellek rêzimannasê mezin mîna Sîbeweyhî, Esme'î û hinekî din kiriye. Wî cara yekemîn bi navê "Kîtab el-'Eyn" ferhengeke Erebî amade kiriye. Xelîl di sala 170/786'an de li bajarê Besrayê miriye. (19)

243. bi hemzê li nik Muberredî: li gor dîtina Muberred "hemze" ango elîf bi tenê veqetandek e û nîşana binavkirinê ye. Muberred Ebû (bavê) el-'Ebbas Muhemmed îbn Yezîd (211-283/826-898) rêzimannas û şagirtiyê Mazenî û Sicistanî bûye. Wî li Bexdayê hem dersdarî û hem jî nuneriya rêgeha Besriyan ya dema xwe kiriye. Ew hemberê Su'leb, nûnerê rêgeha Kûfiyan yê dema wî li Bexdayê, bûye. "El-Kamil" berhema wî ya herî girîng e. (20)

244. sîfet e ji bo Allah: xuyadarê peyva "Allah"e

245. bi î'tîbar: li gor, li ser

246. eslê xwe: binyata xwe ku rengdêrî ye, ji xwe bingeha rengdêra jî xuyadarî ye.

247. mewsûf: navdêrê xuyadarî, pesindayî, xweypesn, diyargînkirî, xuyadarkirî

248. xalibî: piranî, xilbeyî; her çiqas binyata wê rengdêr be jî lê bi piranî wek navê Xwedê hatiye bikaranîn. Di ya destxet de "'elema xalibî" ye.

249. bedel: berguhêr (nasniyar)

250. bedel ul-kull: nasniyarê gîştî, berguhêrê tebayî

251. kull: gişt, hemû, tev

252. îstî'mal: bikaranîn, xebitandin

253. lazim nîne: pêwîst nabe, çênabe, di ya destxet de "lazim naê" ye. Ji vir heyanî rêza dawî di ya destxet de li pêşiya "'amil di cerra . . . . "t. d. tê.

254. siqût: ketin, jê çûyîn, di ya destxet de "bi siqûta" ye.

255. mubeddelu mînhu: nasniyarkirî, berguhirî, berguhartî

256. di êre de: di vir de

257. texeyyut: ketin, jê ketin, di destxetê de "texebbî" ye

258. exlebî: Piranî, zahfî, xilbeyî

259. ne ku daîmî ye: bê ku carna li gor wî qaîdeyî tê, lê ne timî.

Tu bizan! Bedel jî çar in: bedel el-kull (260) we bedel el-ba'd (261) we bedel el-îş timal (262) we bedel el-xelet (263).

Ar-Ra'hîm: îsmekî mufred î me'rîfe ye bi sebeb edatê t'erîfê. Lefz mecrûr cerre bi kesr e bê weku sîfetê b'ede sifet e (264) ji bo "Allah". 'Amil di cerra sîfetê be'de sifet da lefzen, 'amilê mewsûfî ye. Di herduyan de demîr mustetir e raci'ê bi bal mewsûfî ve ye. Lewra wekî muş teqqat (265) waqi' (266) bibin xeber yan sîfet yan 'hal (267) yan sille (268) lazim e (269) ji 'aîdekî, (270) çi demîr bî çi xeyrê (271) demîr bî.

Tu bizan! Caîz e (272) qet'a (273) ne'tê (274) bikin ji men'ûtî (275), merfû' bixwînin li sebîlê med'h (276), bikin xeber ji bo mubtedakî me'hzûf (277) bi 'hezfeke wacibî (278), ku "huwe" (279) ye. "Ar-rahîm" bikin xeberê b'ede xeber (280), mecmû' (281) cumlekî muste'nîfe ye (282) la me'helle leha mîn el-e'erabî.

---

260. **bedel el-kull**: nasniyarê giştî, berguhêrê tebayî
261. **bedel el-b'ad**: nasniyarê hindeyî, berguhêrê hinî
262. **bedel el-îş timal**: nasniyarê vegirtî, berguhêrê vegirtî
263. **bedel el-xelet**: nasniyarê şaş, berguhêrê şaşgotî
264. **sîfetê be'd sîfet** : xuyadarê duyemîn, di ya destxet de "sîfetê be'd" tune.
265. **muş teqqat**: piraniya "muş teqq" e yanî xurdezad, yên ku ji lêkeran peyda dibin mîna: rader, pareng, rengdêr û lapekemper.
266. **waqi'**: bibe, çêbe
267. **'hal**: rewş, rewşdêr, rewşîn, rewşdiyar
268. **sille**: peywendehevok, peywendî
269. **lazim**: pêwîst, divê
270. **'aîd**: pronava hevgirêdanê, ango ew wan bi hev ve girêdide da ku bête zanîn. Di ya destxet de ev der weha ye: " lazim e ji 'aidekî di wan de".
271. **xeyr**: bil, xeynî, di ya destxet de "*çi ne demîr bî*" ye.
272. **caîz e**: durust e, çêdibe, dibe
273. **qet'**: birrîn, jêkirin
274. **ne't**: navê duyemîn e ji bo diyargînî
275. **men'ût**: xuyadarkirî, diyargînkirî, navdêrê diyargînî, pesindayî
276. **sebîlê med'h**: ji bo pesindan, di çapekê de "li ser sebîlê med'h" e.
277. **bikin xeber ji bo mebtedakî me'hzûf**: yanî bi nişana kirdebarî bixwînin û bikin pêgir ji bo serwerekî çûyî, yekî jêketî.
278. **bi 'hezfeke wacibî**: yanî ev jêketina wî bivênevê be, pêwîst be
279. **huwe**: pronava tekane ya kesê sêyemîn e, mebest pê Yezdan e
280. **er-Ra'hîm bikin xeberê be'de xeber**: ango bibe pêgirê duyemîn ji bo huwe. Di ya destxetde ev der weha ye: *"teqdîra kelêmê 'huwe er-Re'hman er re'hîm" hem er-Re'hîm jî merfû' bixwînin bikin xeberê be'd el-xeber "*.
281. **mecmû'**: tev, hemû, giş
282. **cumlekî muste'nîfe ye**: hevokekekî destpêkî ye, di ya destxet de "cumlekî îsmiye. " t. d.

Yan mensûb bixwînin bikin mef'ûl ji bo fi'leke muqedder ku e'nî (283) ye; 'amil di nesba wê da lefzen 'amilê mezkûrî (284) ye. Ji ew paş ev fi'l digel fa'ilê xwe (285) bi tenê li nik Zemexşerî (286), yan digel mute'elleqatê xwe (287) li nik îbn 'Hacib cumlekî mufessîre (288) ye la me'helle leha mîn el-e'erabî li nik Cumhûrî (289), yan me'helle mecrûr li nik Şelûbinî. (290)

We bîhî neste'în: (291) "waw"a (292) 'atîfe (293) mebniyê lefz el-fet'h e (294). Tu bizan! Hurûfê 'etfê (295) jî deh in li nik Cumhûrî ku *waw* (296), *fa* (297), *summe* (298), *'hetta*, (299) we *ew* (300) we *îmma* (301) we *em* (302) we *la* (303) we *bel* (304) we *lakîn* (305).

---

283. e'nî: lêkera dema niha ye ji bo kesê/a yekemîn û bi maneya ango, yanî û mebesta min jê ye, di destxetê de weha ye: " bi 'hezfeke wacibî ku e'nî ye".
284. mezkûr: gotî, mebest pê lêkera "e'nî" ye, di destxetê de "lefzî î qiyasî ku e'nî ye" ye.
285. fi'l digel fa'ilê xwe: ango lêkera "e'nî" tevî kirdeyê xwe ku pronava kesê/a yekemîn, "ena" ye.
286. Zemexşerî: Ebû el-Qasim Mehmûd îbn 'Umer îbn Muhemmed îbn `Umer (1041-1110) e.
287. mute'elleqatê xwe: yên ku xwe pê ve digrin tev, wek fa'il(kirde), mefû'l (serve) û yên din.
288. mufessîre: şirovekar ango şiroveya hevokê pêşja xwe dike, di ya destxet de ev der weha ye: "cumlekî fi'lî ye mufessir e ji bo Allah"
289. cumhûr: pirên zanayan, civata xilbe ji zanayên rêzimana Erebî
290. Şelûbîn: di çapekê de "Şelewbîn" e, Ebû Elî Şelûbîn îbn Muhemmed îbn 'Umer el-Eşlebî (1134 -1214) li Eşlebê (bajarek e li Mexribê) ji dayîk bûye. Ew pêşengekî rêzimana Erebî yê dema xwe bûye. (21)
291. we bîhî neste'în: em daxwaza alîkariyê her jê dikin.
292. waw: tîpa "w"(و) ya Erebî.
293. 'atîfe: gehanek.
294. lefz el- fet'h: bi ziberê tê bi lêv kirin, di destxetê de "bînaekî esliye" jî heye.
295. 'hurûfê 'etfê: gehanek; di rêzimana Erebî de ji bo daçek, paş- û pêşdaçek, veqetandek, pêş- û paşdanî, zêder û carna ji hin hokeran re jî tev 'herf (piranî 'hurûf) tîp (pît) yan jî edat (daçek) tê gotin lê li gor kiryarên wan navekî din jî li wan tê zêde kirin mîna: '"herfên cerrê", yên " 'etfê" û yên din. (22)
296. waw: "w" (و), we, û
297. fa: "f" (ف) û
298. summe: (ثم) û, piştre
299. 'hetta: (حتى) û, heyanî, ta
300. ew: (أو) û, yan
301. îmma: (إما) û
302. em: (أم) û
303. la: (لا) û
304. bel: (بل) û, lê, belkî
305. lakîn: (لكن) û, lêbelê, bes

Neh in li nik Ebû 'Eliyê Farisî (306) bi xeyr ji *îmma*-ê (307); heşt in li nik ba'dekî (308) ji nu'hatan (309) bi xeyr ji *îmma* we *lakîn* (310); sê ne li nik Deresteweyhî (311) ku *waw, fa* û *summe* ne (312); yazdeh in li nik Sekkakî (313) her dehên mezkûr digel *ey*-a (314) tefsirê (315).

Ba: (316) 'amilê lefzî î sema'î (317) 'herfek ji hurûfê carr e, (318) wadi'ê (319) wed'a (320) wê kiriye ji bo îstî'ane (321); mebniyê lefz el-kesr (322) e bi bînaekî esliye (323).

---

306. Ebû Eliyê Farisî: Ebû Elî el-Hesen îbn Ehmed (m. 987) rêzimannasekî jîr û pêşikvanek ji yên rêzimana Erebî bûye. Ew li Fesaya (îranê) çêbûye û li Bexdayê miriye; wî dersa gelek rêzimanzanên dema xwe yên bi nav û deng daye. kitêba wî ya "El-îzah fî en-Ne'hwî we et-Tekmîle" di rêzimanî de pir navdar e. (23)

307. bi xeyr ji îmma: Ebû Elî dibêje "îmma" ne gehanek e û ew jî neh heb in.

308. ba'dek: beşek, hinek

309. ji nu'hatan: ji rêzimanzanan

310. îmma we lakîn: li gor wan ev herdu, ne gihanek in û hejmara wan ji heşt e.

311. Deresteweyhî yan **Durusteweyhî**: Ebdullah îbn (871- 956-58) Faris e li Bexdayê jiyaye û yek ji rêzimannasên navdar e. Wî li cem Quteybî û Muberred Xwendiye, berhemên wî "Kîtab el-Kîtab" û "Kîtab er-Red 'ela Su'leb fî îxtîlaf en-Ne'hwiyîne", navdar in. Lê li gor M. el-Emîr navê wî yê temamî Ebû Muhemmedê Ne'hwî yê hevalê Muberred e. Pirtûkên wî yên navdar di rêzimanî de "îrşad" û "Şer'h el-Fesîh" in. (24)

312. waw, fa û summe: yanî li cem wî her sê (w: و , f: ف û Summe: ثُمَّ) tenê gihanek in.

313. Sekkakî: Yusif îbn Ebûbekr Xwarzemî (1160-1228) li Xwarzemê çêbûye û li wir jî miriye; ew ferhengzan, wîjenas û helbestvanekî hêja bûye. Pirtûka wî ya "Mîfta'h el-'Ulema di rewanbêjî û suxennasiyê de navdar e. (25) Di destxetê de ev der weha ye: "ku her dehên mezkûr in".

314. ey: yanî, ango, ev peyvik ji zimanên îranî ketiye nav zimanê Erebî. (*)

315. tefsîr: rave, şirove

316. ba: "b" (ب) ya " bîhî " (به).

317. 'amilê lefzî î sema'î: tewangdêrê berbiçav î bihîstî û bi lêkolînî ye

318. 'hurûfê carr e: daçekên zêrger, di ya destxet de "carre ye" ye.

319. wadi': daniyar, çêker, sazkar, danêr

320. wedi': danîn, cihdan

321. îstî'ane: alîkarîxwazî, alikarî

322. kesr: zêr, dengdara kurt, i, î

323. bi bînaekî esliye: bi netewangbariyeke bingehîn, çiku daçek û herf giş netewangbar in.

(*) Li gor mamosteyê zimanê Erebî yê Unîversîteya Stockholmê beşa Erebî, Hadî Kechrida.

Ha: îsmekî mufred î me'rîfe ye (324) bi sebeb demariyetê (325), demîra bariz (326), mecrûr î muttesil e (327), mebniyê lefz el-kesr e; (328) me'helle (329) mecrûrê bi "ba"ê (330) cerre bi kesr e (331), carr û mecrûr zerfê lexw (332) mute'elliqê bi "neste'înu" ya mu'exxer (333) ve ye. Mecrûr bi tenê me'helle mensûb nesbe (334) bi fet'h e (335), bê weku mef'ûlu bîhiyê xeyrê serî'h e ji bo "neste'înu"(336).

Tu bizan! Me'arif (337) jî pênc in: 'elem (338), mudmer (339), mubhem (340) ku esma' ul-îşaret (341) û mewsûlat (342) in.

---

324. îsmekî mufred î me'rîfe ye: navdêrekî tekane û binavkirî ye (bi rastî ew pronav e, lê rêzimannasên Erebî yên serdema navîn pronavan jî xistine nav beşeke navdêrî) .

325. bi sebeb demariyetê: yanî sedemê binavkirina "ha"ê pronavîtî ye, çiku li gor rêzimana Erebî pronav giş naskirî ne. (26)

326. demîra bariz: pronava eşkere

327. muttesil: zeliqî, pêgirtî, pêve

328. mebniyê lefz el-kesr e: netewanebar e û bi zêr (dengdara "î,i") tê bilêvkirin, di ya destxet de ev der weha ye: "demîr e bariz e, mecrûr e, muttesil e, mebniyê lefz el-kesr e bînaekî 'aridî ye".

329. me'helle: tax, tar, li vir ji bin ve, di bin de, bi cîgehî, şûnwarî

330. mecrûrê bi "ba"ê: daçeka "b" (ـِ) wê di bin de digerîne bi zêr, yanî wê dixe cihê navdêrê ku dibe nasdêr û dawiya wê bi "i,î" tê xwendin.

331. cerre bi kesr e: zêrbarî û xwedîkarî ya wê bi "zêr" e, ne bi "ziber" yan jî bi "ya" ê ye.

332. zerfê lexw: hokera bêrê, (netêrker, tewş, bêkêr), hokera neçalak

333. mu'exxer: bipaşvemayî, lipaşmayî, ev der di ya destxet de weha ye: " bi neste'înu ve ye, mu'exxer ve ye", lê wek ya çapkirî xweştir û rasttir e.

334. nesbe: servebarî, ziberbarî

335. feth/e: ziber, ser (dengdara kurt "e")

336. ji bo neste'înu: lêkera dudemî ji bo kesên yekemîn, ku bi wateya em alîkariyê dixwazin e, di ya destxet de "neste'înuwê" ye.

337. me'arif: piraniya "me'rîfe" ye yanî binavkirî, navdêrên naskirî. Li gor rêzimana Erebî pênc cure navdêrên binavkirî hene:

338. 'elem: serenav, navê kesî, bernas

339. mudmer: pronav, cihnav

340. mubhem: nekufşe, sergirtî, neeşkere

341. esma ul-îşarat: pronavên nîşandanê, pronavên pêşker

342. mewsûlat: piraniya mewsûle ye yanî gihanekên peywendiyê, pronavên girêkî, pêgeh

We mu'errefê bi edatê te'rîfê (343) û bi en-nîdaî, (344) mudafê (345) bi bal yekî ji wan bi îdafeka 'heqîqî (346) yanî manewî (347); ma 'edaê wan (348) nekîre (349) ne. E'erefê me'arifan (350) mudmer e li nik Cumhûrî, 'elem e li nik ba'dê (351).

Neste'înu (352) 'amilê lefzî î qiyasî; fi'la mudari' e (353), mebnî ye ji bo fa'il,(354) mewdû' e (355) ji bo mutekellimê me'a el-xeyr (356) di 'haletê ref'ê da(357) Lefz merfû' ref'e bi demm e; 'amil di ref'a wê da lefzen 'amilê mezkûrî ye. (358) Fa'ilê xwe tê de mustetir e bi îstîtareke wacibî (359) ku "ne'hnu"(360)ye.

Ne'hnu (361) îsmekî mufred e lefzen (362), musenna (363) yan mecmû' e (364) ma'nen (365), mebniyê lefz ed-demm e (366).

---

343. mu'errefê bi edatê te'rîfê: binavkiriyê bi veqetandekê

344. we bi en-nîda': û bi daçeka hodengê (bangê)

345. mudaf: nasandî,tarîfkirî, di ya destxet de "we mudafê bi bal yekî ji wan ve " ye.

346. bi îdafeka 'heqîqî: bi nasandineke rasteqînî, bi tarîfkariyeke eseyî

347. yanî manewî: ango rêzimanî, wateyî; ev di yên çapkirî de nîne.

348. ma 'edaê wan: ji bilî wanên gotî, xeyn ji yên bihûrî, ev hevok tev di ya çapkirî de li paş tê.

349. nekîre: nenaskirî, nebinavkirî

350. e'erefê me'arifan: navdêrê ku ji teva çêtir naskirî ye, yê herî binavkirî

351. ba'dê: hinek ji rêzimannasan

352. neste'înu: gotina "neste'în" ya di hevoka "we bîhî nest'în" de, em daxwaza alîkariyê her jê dikin (alîkarî her pê ye).

353. fi'la mudari': lêkera dudemî, di zimanê Erebî de du lêkerên sereke hene: ya raborî (madî) û ya dudemî (mudari') ku bi alîkariya pêşdaniyan ji bo dema niha û ji bo dema were jî tê bikaranîn. (27)

354. Mebnî ye ji bo fa'il: lêkera lebatî ye

355. mewdû': danînî, hatiye danîn, peyvikên "ji bo" ji ya destxet kêm in.

356. mutekellimê me'a el-xeyr: ji bo kesên yekemîn

357. Di 'haletê ref'ê da: li ser kirdebarî (pêşebarî)yê

358. mezkûr: gotî, bihûrî, mebest pê tewangdêrê lêkerê yê wateyî ye

359. îstîtareke wacibî: veşartineke pêwîstî, di destxetê de ev hevok weha ye: *"bi îstîtareke wacibî bi emrekî me'newî mu'ebber 'anhu bi ne'hnu ye "*.

360. ne'hnu: pronava kesên yekemîn e, ango "em"

361. ne'hnu: pronava kesên yekemîn ya nihênî ye ji bo "neste'în", ango " em ".

362. îsmekî mufred e lefzen: yanî navdêrekî ku berbiçav bêjeyek tekane ye.

363. Musenna: dual, dualî, cotane

364. mecmû': pirane, pirhejmar

365. ma'nen: ango her çendî berbiçav tekane ye jî lê li gor wateyê mebest jê dido û hevraz e ku dibe pirane. Di destxetê de ev hevokê han jî heye: *"me'rîfe ye bi sebeb demariyetê "*.

366. lefz ed-demm: yanî berbiçav nîşana kirdebariyê, pêş (u), li ser e.

Me'hlle merfû' ref'e bi demm e, bê weku fa'il e ji bo "neste'înu" (367). 'Amil di ref'a fa'ilî da me'hellen 'amilê lefzî î qiyasî, "neste'înu" ye (368). Ev fi'l digel ma 'umîle fîhê xwe (369) cumlekî fi'lî ye (370) 'etfa bi ser (371) cumleê fi'lî yê muteqeddim(372) ve ye; yan îsmî yê muteqeddim (373) ve ye, la me'hlle leha mîn el-e'erabî.

El-'hemdu lillahî: "el-'hemdu"(374) îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb (375) edatê te'rîfê (376). Lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku mubteda (377) ye.

Lîllahî (378) carr (379) û mecrûr (380) zerfê musteqerr e(381), me'helle merfû' ref'e bi demm e bê weku xeber e ji bo mubtedaî. Ev mubteda (382) digel xeberê xwe cumlekî îsmî ye, îxbarî ye (383) sureten (384) înşaî ye (385) ma'nen (386) la me'hlle leha min el-e'erabî.

---

367. ji bo neste'înu: di ya destxet de *" ji bo neste'înuwê"* ye

368. neste'înu: di ya destxet de *"ku neste'înu "* ye

369. ma 'umîle fîhê xwe: yanî lêker tevî yên ku pê hatine tewandin (kirde, serve û yên din). Ev der di destxetê de weha ye: *"ev fi'l digel fa'ilê xwe bi tenê yan digel ma . . . . "*ta dawî. Ya rasttir ". . . fîhiyê xwe" ye.

370. cumlekî fi'lî ye: di destxetê de *"cumleekî fi'lî "* ye yanî hevokekî lêkerî ye

371. 'etfa bi ser: yanî gihaye, bi ser ve ye, biservedayî ye

372. muteqeddîme: di ya destxet de *"muqeddîme"* ye ango yê pêş, bihûrî, derbasbûyî, di ya destxet de *"li nik Besriyan "* jî heye.

373. îsmiyê muteqeddime: yanî hevokê navdêrî yê li pêş derbasbûyî, ev der di ya destxet de weha ye: *"yan bi ser cumleê îsmî yê muqeddîme ve ye li nik Kûfiyan "*.

374. el-'hemdu: bêjeya *"el-'hemd "* yanî pesn û sipasî

375. bi sebeb: bi sedem, ji ber

376. edatê te'rîfê: veqetandek, daçeka binavkirinê

377. mubteda: serwer, kirdeya hevokê navdêrî, di destxetê de ev hevokê han jî heye: *"'amil di ref'a mubtedaî da 'amilê mezkurî ye "*. Yanî tewangdêrê serwerî ewê ku li pêş, di mijara "qîraetî" de, hat gotin.

378. lîllahî: bêjeya "lîllahî" ku ji herfa "l" (ل) ya Erebî û ji navê "Allah" pêkhatîye.

379. carr: daçeka zêrger ku "l" (ل) ye, di destxetê de ev hevok jî heye: *"lama carr e Allah mecrûrê pêye "*.

380. mecrûr: navdêrê bi zêr (zêrbar) ku "llah" a kurtkiriyê ji "Allah" e

381. zerfê musteqerr: hokera cihdayî, di destxetê de ev jî heye:*"mute'elliqê bi fi'lek ji ef'alê 'am ve ye, yan mute'elliqê bi îsmufa'ilek ji ef'alê 'am ve ye "*.

382. mubteda: serwer, ku di vir de "el-'hemdu" ye

383. îxbarî: zargotinî, gotinwarî, gotinbarî, gotinî (îddî'a)

384. sureten: şeklî, awayî, berbiçav, dirûvî

385. înşaî: daxwazî, viyanî

386. ma'nen: wateyî, nepenî, li gor wateya xwe

Tu bizan! La budde (387) di xeberî da ji 'aîdekî (388) racî (389) bibit bi bal mubtedaî ve, eger dê cumle bit yan muş teqq (390) bit îttîfaqen (391); mutleqen li nik Kûfiyan (392).

Rebbî: (393) îsmekî mufred î me'rife ye, bi sebeb îdafedana wê bi bal ma (394) be'dê (395) xwe ve ku " el-'alemîne" ye. Lefz mecrûr cerre bi kesr e bê weku sifet e ji bo "lillahî" (396).
'Amil di cerra sîfetî da lefzen (397) 'amilê mewsûfî (398) ye; lewra muşteqq e (399) yan ji qebîla wesfa bi mesderî ye (400). Wekî niha "Zeydun 'edlun" (401) dibêjî.
El-'alemîne: (402) îsmekî mecmû' î me'rîfe ye, bi sebeb edatê te'erîfê.

---

387. la budde: pêwist e, divê, gerek e
388. 'aîd: pronava hevgirêdanê
389. racî': pronava hevgirêdanê
390. muş teqq: xurdezad, afirandî, şeqkirî, (ew navdêrên ku ji lêkerê peydabûne mîna: pareng, rengdêr û yên din.)
391. îttîfaqen: bi yekîtî, lihevkirî, yanî yekîtiya rêzimanzanan çêbûye ku gava pêgir hevok yan jî xurdezad be hingê divê pronava hevgirêdanê hebe daku pêgir bi serwerî ve girêde.
392. Mutleqen li nik Kûfiyan: yanî li gor rêgeha Kûfiyan divê pronava hevgirêdanê hebe, çi pêgir hevok û xurdezad be çi na.
393. Rebbî: peyva *"rebb"*, xweyî, xwedî, ya di *"rebb îl-'alemîne"* de
394. ma: tişt, mayê
395. be'd: piştî, li pey
396. lillahî: ew bêjeya ku di "el-hemdu lillahî" de ye, ev bêje di ya destxet de "Allah" e.
397. lefzen: ev bêje di ya destxet de tune
398. 'amilê mewsûfî: yanî tewangdêrê pesindayî, yê xweypesnî, ango ewê ku "rebb" û "Allah" ditewîne yek tewngdêrek e, ew jî daçeka zêrger "lî" ye.
399. Lewra muş teqq e: ev bersiva pirsekê ye, gelo çawa rebbî dibe pesindar û diyargîn ji bo Allah? Ma ne divê diyargîn xurdezad be? Wî bersiv da: *"lewra ew muş teq e"* belê ew çêdibe, çiku ew xurdezad tê hesabê.
400. Yan ji qebîla wesfa bi mesderî ye: ango hem meriv dikare "rebbî" mîna xurdezad jî bibîne û hem jî kare weke raderî ji hesab bike û bêje ew ji beş a diyargîniya bi raderî ye. Di destxetê de "ji bo mubalexe" jî heye, yanî ji bo zêdekirinê ew bi raderî hatiye diyargîn kirin.
401. Zeydun 'edlun: bêjeya "'edl" di vir de rader e lê dîsa bûye diyargîn ji bo zahfiyê, yanî Zeyd merivekî pir dadimend e. bêjeya "niha" di ya destxet de tune.
402. el-'alemîne: herkes, cihan hemû, "Rebb îl-'alemîne" ango xweyê temamê cîhanê, xwediyê cîhanê giş; mebest pê Yezdan e.

Lefz mecrûr cerre bi yaê(403) bê weku mudafu îleyhî (404) ye ji bo "rebbî". 'Amil di cerra mudafu îleyhî da lefzen 'amilê mezkûrî ye.
Tu bizan! La budde (405) ji bo vê cem'ê (406) di camidan (407) de ji sê şertan ku 'elemiyet, 'alemiyet (408) û tezkîr (409) in. Di muşteqqan da ji du şertan ku 'alemiyet û tezkîr in.

We es-selatu we es-selamu: wawa 'atîfe (410) mebniyê lefz el-fet'h e (411). *Es-selatu* (412) îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb edatê te'rîfê (413); lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku (414) 'etfa bi ser "el-'hemdu" (ve) ye (415). *We es-selamu* wawa 'atîfe (416) mebniyê lefz el-fet'h e. *Es-selamu* îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb edatê te'rîfê. Lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku 'etfa bi ser "es-selatu" (ve) ye (417).

---

403. cerre bi yaê: balvedêriya bêjeya "el-'alemîne" bi tîpa "y" (ي) ye, çiku kirdebariya piraneyan bi wawê (dengdara dirêj "û") ye, nasandin (zêbarî) û servebarî (ziberbarî) ya wan jî bi yaê (ي) (dengdara dirêj "î") ye. Mîna *"muslîmûne"* di kirdebariyê û *"muslîmîne"* di servebarî û nasandinê de.
404. mudafu îleyhî: nasdêr, tarîfkir, di ya destxet de ev hevokê han jî heye: *"nûn* (n :ن) *îwed e ji ber 'hereke û tenwîna di mu'rebî da"* ango "n"ya di "el- 'alemîne" de di dewsa ser û ber (dengdarên kurt) û nûngiriya (un, en, în) ku di navdêrên tewangbar de ye.
405. La budde: divê, pêwîst e, geregk e, di ya destxet de "lazim e" ye.
406. cem': pirane, pirhejmar
406. ji bo vê cem'ê: mebest pê piraneya bi "waw" û "nûn" (ûn: ون) û ya bi "ya" û "nûn" (în: ين) e. Ji xwe di Erebî de ji bo navdêran du cure pirane hene:
1 piraneya tekûz e, ew jî dibe du beş :
a. eva vir eyanî "piraneya tekûz (neşikestî) ji bo kesên nêr î xweyhiş (biaqil)".
b. piraneya ku bi "elîf " û "tê" (اٰت) çêdibe, yanî piraneya tekûz ji bo kesên mê î xweyhiş.
2. piraneya bêrêz (bê qaîde) yan jî piraneya şikestî ku bi guhrandina hin tîpên dengdar çêdibe, mîna "kîtab" ku dibe "kutub". (28)
407. camid: hişk, bêcan, necandêr lê li vir navdêrê sade/ xwerû/ ne xurdezad
408. 'alimiyet: zaneyî, zanatî, bihişî, bifehmî
409. tezkîr: zayenda nêr, nêraneyî, di destxetê de "tezkîriyet" e.
410. wawa 'atîfe: tîpa "w" ya di " we es-selatu" de gihanek e
411. Mebniyê lefz el- fet'h e: netewangbar e û bilêvkirina wê bi ziber e, di destxetê de weha ye: *"mebniyê lefz el-fet'h e bînaekî esliye"*, netewangbariyeke bingehîn.
412. es-selatu: bêjeya "es-selat" yanî (rehm) mihrîvanî û dilovanî
413. bi sebeb edatê t'erîfê bi veqetandekê
414. bê weku: di ya destxet de weha ye: *"bê weku mubteda ye"*
415. 'etfa bi ser el-hemdu ve ye: digihîje bêjeya "el-'hemdu", pê ve tê girêdan.
416. 'atîfe: gihanek, di ya destxet de hevokê, " mebniyê lefz el- fet'h e" nîne.
417. 'etfa bi ser es-selatu ve ye: ango bi peyva "es-selatu" ve tê girêdan.

yan bi ser "el-'hemdu" (ve), "lî îxtîlaf er-Re'yeynî"(418) 'Amil di ref'a me'tûfî (419) da lefzen 'amilê me'tûfu 'eleyhî(420) (ye).

'Ela xeyrî xelqîhî: "'ela"ê carr e(421), mebniyê lefz es-sukûn e(422). "Xeyr" (423) ef'el ut-Tefdîlê (424) me'erîfe (425) ye bi sebeb îdafedana wî bi bal ma be'dê xwe ve ku "xelqîhî" ye(426). "Xelqî" mudafu îleyhî ye ji bo "xeyrî"; "ha" (427) mudafu îleyhî ye ji bo "xelqî", lewra(428) wekî ef'el ut-tefdîl(429) mufariq (430) bit ji min (431) te'rîf lazim e (432). Carr û mecrûr zerfê musteqqer (433), me'helle merfû' ref'e bi demm e bê weku 'etfa bi ser "lillahî" ve ye (434).

---

418. lî îxtîlaf er-re'yeyn: li gor herdu dîtinên cuda, yek ji wan "es-selamu" bi "es-selatu" ve û ya din jî wê bi "el-'hmdu" ve girêdide. Di ya destxet de cihê van guherandiye û ev hevokê erebî jî wehaye: *"lî îxtîlafî re'yeynan "*

419. me'tûf: gihandî, gihayî, girêdayî, biservedayî

420. me'tûfu 'eleyhî: pêgihandî, pêgihayî, pêvegirêdayî, ragihandî

421. 'Elaê carr e: peyvika "'ela" daçeka zêrger e.

422. mebniyê lefz es-sukûn e: netewangbar e û bi rawestekê tê bilêvkirin, di ya destxe de *"bînaekî eslîye"* jî heye.

423. xeyr: qenctir, baştir, çêtir

424. ef'el ut-tefdîl: kemper, lapekemper, bêhtirkir, di destxetê de *"îsm et-tefdîl"* e

425. me'erîfe: binavkirî, naskirî, nasdar

426. xelqîhî: gelê wî, xelkê wî, di ya destxet de ev der weha ye: *"îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb îdafedana wî bi bal ma b'edê xwe ve ku "ha" ye. Lefz mecrûr cerre bi kesr e bê weku mudafu îleyhî ye ji bo xeyrî "*

427. ha: pronava "h"(ه) Ev der di ya destxet de weha ye: *"ha îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb demariyetê demîra bariz î muttesil e mebniyê lefz el-kesr e, bînaekî 'aridiye me'helle mecrûr cerre bi kesr e bê weku mudafu îleyhî ye ji bo xelqî. 'Amil di cerra mudafu îleyhî de me'hllen 'amilê mezkûrî ye.*

428. lewra: çiku, ji ber, ev bersiva pirseke nihênî ye ango çima binavkirî? Di ya destxet de ev rêz ji "lewra" heyanî bêjeya "lazim e" piştî "ku xelqîhî ye" tê.

429. wekî ef'el ut-tefdîl: gava kemper

430. mufariq: cuda, cihê, veqetiyayî

431. ji min: ji daçeka "min" (من), wekî niha Gulnaz ji Bêrî çêtir e.

432. te'rîf lazim e: ango hingê divê ew kemper binavkirî be. Di zimanê Erebî de "kemper" bi daçeka min (من), ji, re tê lê gava ew ne bi "min"ê re bê, hingê gere yan binavkiriyê bi balvedêriyê yan jî yê bi veqetandekê be û her bi vê yekê dibe lapekemper jî. (29)

433. zerfê musteqerr: hokera cihdayî, di ya destxet de weha ye: "zerfê musteqerr mute'elliqê bi 'hesele, bi 'hasîlun ve ye" ta dawî.

434. 'etfa bi ser lillahî: ango bi ser bêjeya "Allah" ve, ku li pêş bihûrî, tê dayîn.

Tu bizan! 'Etfa (435) du me'etûfan (436) li serdu me'mûlan bi 'atîfeke wa'hid(437) caîz e; eger dê lazim neêt (438) înabeta(439) 'atifî ji ber du 'amilê muxtelîfe (440) ve, wekî niha di êre de (441). Eger dê lazim bêt ew caîz nine îlla ku şaz e, (442) wekî niha " ma kullu beydae şe'hmeten we la sewdae temreten (443). Caîz e ku "es-selatu we es-selamu" mubteda bit "'ela xeyrî xelqîhî" xeber bî, 'etfa cumlê li ser cumlê (444) bit.

Mu'hemmed: (445) îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb 'elemiyetê, lefz mecrûr cerre bi kesr e bê weku bedel e yan 'etfubeyan e (446) ji bo "xeyrî xelqîhî "(447).

---

435. **'etf**: gihandin, yanî meriv bêjeyekê yan jî hevokekî bi alîkariya gihaneka "û" yê yan yên din, ku li pêş bihûrîn, bigihîne yeke din û bi ser ve bide.
436. **me'etûf**: gihandî, gihayî, biservedayî, yanî ew hevok yan bêjeya ku bi ser yê/ya din ve tê dayîn (digihê ya/yê din).
437. **wa'hid**: yek, bi tenê, tenê
438. **Eger dê lazim neêt**: ger ku çênebe, ger ku nebe, ku pêwîst nebe
439. **înabet**: cihgirtin, cihgirî (cîgirî)
440. **'amilê muxtelîfe**: tewangdêrên cuda
441. **Wekî niha di êre de**:mîna virê ku gihandina "es-selatu" bi "el-'hemdu" û ya "'ela xeyrî xelqîhî" jî bi "lîllahî" ve, bi yek gehanekekê, pêk tê lê ew cihgiriya du tewangdêrên cuda bi yek gehanekê çênabe. Ji xwe tê zanîn ku di zimanê Erebî de du bêjeyan jî hevokên tewangdêrcuda bi yek gehanekekê bi ser hev ve nayên dayîn, çiku gihanekek dikeve şûna tewangdêran lê gava ew ne ji hev bin hingê ew nabe cihgir ji bo wanên cuda. (30)
442. **Eger dê lazim bêt ew caiz nîne îlla ku şaz e**: ger ku tewangdêr cuda bin û pêwîst bibe ku gihanek cihê herduyan bigre hingê ew bêqaîde û bêrêz e.
443. **Ma kullu beydae şe'hmeten we la sewdae temreten**: her tiştê spî bez nîne û herê reş jî ne zeytûn e. Li vir bi yek gihanekekê, ku "we" ye, "sewdae" bi ser "beydae" ve hatiye dayîn, tewangdêrê wê "kullu" ye, û "temreten" jî bi ser "şe'hmeten" ve hatiye dayîn, tewangdêrê wê jî "ma" e; yanî va li vir tewngdêrên wan ji hev cuda hatine lê ev ne li gor qaîdeyî ye. Di ya destxe de ev rêza han jî heye: *"îlla teqdîma mecrûrî li ser merfû'î ne'hw: fî ed-darî Zeydun we el-'hîcretî 'Emrun, yan li ser mensûbî ne'hw: înne fî ed-darî Zeyden we el-hîcretî 'Emren"*. Yanî gava gehanek bibe cihgir ji bo du tewangdêrên cuda hingê yan bêqaîde ye, yan zêrbar li pêşiya pêşebarî tê, yan jî zêrbar li pêşiya ziberbari tê mîna "fî ed-darî" û el-'hîcretî" ku li pêşiya "Zeydun" û "'Emrun" hatiye û her weha di mînaka diduyan de ku li pêşiya "Zeyden" û "'Emren" hatiye. (31)
444. **'etfa cumlê li ser cumlê**: yanî hevokê "es-selatu we es-selamu" bi ser yê "el-'hemdu lillahî" ve bê dayîn. Ev der di ya destxet de weha ye: *"'atfa cumleî li ser cumleî ve bit "*.
445. **Muhemmed**: navê Pêxemberê îslamê (A. S. S.) ye
446. **'etfubeyan**: peyrewa beyankar, diyardêr
447. **xeyrî xelqî**: baştirînê xelkê, qenctrînê gel, li pêş ev bêje bihûrî.

Ne ku sîfet e (448) lewra 'elem nabin wesf (449) her wekî demaîran (450) ne dibin wesf (451) ne têne wesif kirin (452).
We 'ela alîhî: (453) wawa 'atîfe mebniyê lefz el-fet'h e (454). "'Ela"ê carre (455) "alî" (456) mecrûrê pê ye, "ha" mudafu îleyhî ye (457), carr û mecrûr zerfê musteqerr (458) me'helle merfû' bê weku 'etfa bi ser "xeyrî xelqîhî" ve ye. (459) 'Amil di ref'a me'tûfî da me'hellen 'amilê me'tûfu 'eleyhî ye.
Tu bizan! "Alî" (460) li duwazde wechan hatiye (461); esse'h ew e ku mu'minê (462) Benî Haşimî (463) û Mutellibiyan e (464).
Tu bizan! "Alî" mufred e lefzen (465) mecmû'e ma'nen (466).
Ecme'îne (467) îsmekî mecmû' î me'erîfe ye bi sebeb îdafa meqedder (468) yan elîf lamên muqedder (469) yan bi sebeb 'elemiyeta te'kîdê (470). Lefz mecrûr cerre bi "ya" ê (471) bê weku te'kîda me'newî ye (472) ji bo "alî".

---

448. **sîfet**: xuyadar, diyargîn, pesindar
449. **Lewra 'elem nabin wesf**: ev bersiva pirsekê ye: "Çima nasniyar û ne diyargîn?" Çiku serenav nabin diyargîn, di ya destxet de di şûna "wesf" de "sîfet" hatiye.
450. **her wekî demaîran**: piraniya demîr e yanî pronav, di destxetê de "*demîran*" e.
451. **ne dibin wesf**: nabin xuyadar, û diyargîn, di ya destxet de "*sîfet*" e.
452. **ne têne wesif kirin**: ne jî bi wan tê xuyadar kirin, nabin diyargînkirî
453. **we 'ela alîhî**: û li ser êl û malbata wî (pêxember A. S. S.) be
454. **fet'h**: ziber (dengdara kurt "e"), di ya destxet de "*binækî esliye jî*" heye.
455. **'elaê carr e**: peyvika "'ela" daçeka zêrger e, di destxetê de ev hevok jî heye: "*mebniyê lefz es-sukûn bînækî eslî ye* ".
456. **alîhî**: ehlê wî, êla wî, malbata wî
457. **mudafu îleyhî**: nasdêr, balvedêr, di ya destxet de "*ji bo 'elayê* " jî heye.
458. **zerfê musteqerr**: hokera têrker, di destxetê de: "*mute'elliqê bi'hesele yan bi'hasîlun ve ye*".
459. **'etfa bi ser xeyrî xelqî ve ye**: yanî bi ser "xeyrî xelqî ve tê dayîn, di ya destxet de weha ye: "*xeber e ji bo es- selatu we es-selamu, 'etfa . . . . . ".*
460. **alî**: peyva "alî" li gor naverok û mebesta xwe, ev bêje di ya destxet de "al" e.
461. **li duwazde wechan hatiye**: yanî bi dozde awayan hatiye mane kirin.
462. **mu'min**: xweybawerî, bawerkirî, bawerê bi ola îslamê
463. **Benî Haşimî**: malbata Haşim ku navê bavikê pêxember e,
464. **Mutellibî**: malbata Mutellib ku bapîrê pêxember e; yanî ya herî rast ji wan maneyên "al" ew e ku mebest jê malbata Mutellib û ya Haşim e.
465. **alî mufred e lefzen**: peyva "al" berbiçav tekane ye, di ya destxet de "al" e.
466. **Mecmû' e ma'nen**: lê li gor wateya xwe pirane ye, di destxetê de ev "tu bizan" li pêşiya "tu bizan" a raserî xwe derbasdibe.
467. **ecme'îne**: tev, hemû, giş
468. **îdafa muqedder**: balvedêriya nepenî ku dibe "ecme'û hum "(أجمعوهم) yanî hemûyê wan.
469. **elîf lamên muqedder**: veqetandeka nepenî, ku dibe "el- ecme'îne"(الأجمعين) ew giş.
470. **te'kîd**: sexbirî, eseyîtî
470. **'elemiyeta te'kîdê**: ango bûye serenav ji sexbirîtiyê re loma binavkirî ye.
471. **ya**: tîpa "y" (ي), di hin piraneyan de nîşana nasandinê ne zêr lê "y" (ي) ye.
472. **te'kîda me'newî**: eseyîtî û sexbirîtiya wateyî (rêzimanî)

'Amil di cerra mu'ekkidî (473) da lefzen 'amilê mu'ekkedî ye (474). "Nûn" (475) 'îwed e ji ber 'hereke (476) û tenwîna (477) di mufredî da, lewra te'kîd jî li du qisman e (478): lefzî ye ku tekrara lefzê ewwel e (479) wekî niha "Zeydun, Zeydun" (480) dibêjî, yan m'anewî ye (481) ku bi elfazê mexsûse ne (482).

Tu bizan! Mezkûratê (483) me zikir kirin (484), ji sîfet we 'etfubeyan we bedel we te'kîd (485), tabi'ê (486) mu'rebî (987) ne. e'eraba (488) wan wekî e'erba metbû'î (489) ye, 'amilê wan eynî 'amilê metbû'î ye.

Emma be'du (490) "emma"-ê şertiy (491), tefsîliye (492), te'kîdiye (493) besîtiye (494)

---

473. **muekkid**: sexbirîkar, eseyîgêr, hêzdiyar
474. **muekked**: eseyîkirî, sexbirîkirî
475. **nûn**: tîpa "n" (ن) ya di dawiya "ecme'îne" (أجمعين) de
476. **'hereke**: ser û ber, zêr û ziber, dengdarên kurt yên zimanê Erebî
477. **tenwîn**: nûndan, nûngîrî, di destxetê de bêjeya *"muqedder"* jî lê hatiye zêdekirin.
478. **Lewra te'kîd jî li du qisman e**: ev bersiva pirsê ye weke ku yek bêje "çima te got: "te'kîda manewî (sexbiriya rêzimanî)? Wî bersiv da got: "çiku du beşên sexbiriyê hene" û dest bi danenasîna wan kir.
479. **tekrara lefzê ewwel**: dubarekirina bêjeya pêşî
480. **Zeydun, Zeydun**: li vir bi dubarekirina navê Zeyd, Zeyda pêşî eseyî dibe.
481. **me'newî**: wateyî, bê weku wateya wan yek be.
482. **elfazê mexsûse**: bêjeyên taybetî, di ya destxet de ew bêjeyên taybetî jî weha hatine rêzkirin: *"we hiye nefsuhû we 'eynuhû we kîlahuma we kîltahuma we kullûhu we ecme'û we ekte'û we ebte'û we ebse'û".* ango ew bixwe, eynê wî, ew herdu, ew herdu (ji bo kesên mê), ew hemû, giş, tev, hemû, gî. Yên piştî "ecme'û" jî tên, eynî wateyê didin.
483. **mezkûrat**: piraniya mezkûr e yanî gotî, bihûrî, derbasbûyî, qalkirî. Di ya destxet de *"ev mezkûratê "* ye.
484. **zikir kirin**: gotin, qalkirin, bibîranîn
485. **te'kîd**: sexbirî, eseyîtî, di ya destxet de weha ye: *"we m'etûfê bi 'herfan e we te'kîdê "* xuyaye ku eva destxet rasttir e, çiku di ya din de peyrewek ku "me'tûfê bi herfan" (gihandiyê bi gihanekê) e, kêm dimîne.
486. **tabi'**: peyrew, peye
487. **mu'reb**: tewangbar
488. **e'eraba**: tewange, tewang
489. **metbû'**: pêşrew, yê ku meriv dide pey rêçika wî, yanî di zimanê Erebî de tewangeya vanê ku nivîskar wan rêzdike û ji wan re "tabi'" dibêje mîna ye ya wî navdêrê pêşiya wan ku jê re jî "metbû'" tê gotin.
490. **be'du**: piştre, ji ew paş, di pey de, di dûv de, paş ji ew..., ji paş ..., piştî
491. **emmaê şertiyeyanî**: bêjeya emma (اما) daçeka mercî ye, wateya merc û egerê dide.
492. **tefsîliye**: beyankar, ravedêr, zûlandêr, cudakar, dabeşkar
493. **te'kîdiye**: sexbirîtî, eseyîtî
494. **besîtiye**: sadeyî, hêsayî, kurtdêrî

qaim e (495) di meqamê (496) fi'lu şerta (497) me'hzûf (498) de digel edatê şertê(499) li nik Cumhûrî, mebniyê lefz es-sukûn e (500). Yan muxeyyerê ji "mehma"ê ye (501), yan muxteri'ê (502) ji "ma"ê ye (503), yan ji "enma"-ê ye (504) li nik ba'dê (505).

"Be'du"(506); zerfek(507) ji zirûfê zeman e(508), lewra "qeblu" we "be'du"(509) eger mudafu îleyhiyê (510) wan zeman e (511) "zerfuzeman" (512) dibêjinê, eger mekan e (513) "zerfumekan" (514) dibêjinê. Mebniyê lefz ed-demm e (515) ji bo 'hezfa mudafu îleyhiyê (516) wan, we edakirina (517) ma'na wan menwî (518) ye bi lefzê mudafê.

---

495. qaîm: rabûyî, cihdayî

496. meqam: cih, war, şûn, cîgeh

497. fi'lu şert (fi'l uş-şert): merclêker, şertlêker

498. me'hzûf: jêketî, hekanî, negotî, çûyî

498. Qaîm e di meqamê fi'lu şerta me'hzûf de: ango ketiye cihê merdêkera jêketî, (çûyî, negotî). Di ya destxet de weha ye: *"fi'lu şertekî me'hzûf digel edewatê şertê ku mehma yekun mîn şay'în e"*

499. digel edatê şertê yanî ketiye cihê merdêkera ku tevî daçeka xwe jêketî ye

500. mebniyê lefz es-sukûn: netewangbarê bi rawestek, ango bê serubere

501. Muxeyyerê ji mehmaê ye: eslê wê "mehma" (ﻣﻬﻤﺎ) bûye, hatiye guhertin, bûye "emma".

502. muxteri': afirandî, çêbûyî, peydabûyî

503. ji maê: yanî eslê wê "ma" bûye bes "em" lê hatiye zêdekirin, bûye "emma".

504. ji enmaê ye: yanî binyata wê "enma" bûye lê paşî bûye "emma".

505. Ba'dê: yanî li gor dîtina hin rêzimannasan

506. be'du: bêjeya "be'd", piştî, piştre, paşî

507. zerf: hoker

508. zurûfê zeman: "zurûf" piraniya zerf e, yanî hokerên demkî, di destxetê de weha ye: *"zurûfê zemanî ye dîêre de"*.

509. lewra qeblu we be'du: çiku bêjeyên "qebl"û "be'd", pêş û paş, ev bersiva pirsekê ye ango "çima hokera demkî?" Çiku ev herdu li gor balvedêran yan dibin hokerên demkî yan jî yên cih û hindavê. Li vir ji ber ku nasdêr wateya dem dide wî jî got: *"ji zurûfê zeman e"*, hokara demkî ye

510. mudafu îleyhî: nasdêr, xwedîbar, balvedêr

511. zeman: dem, kat, wext, heyam, gav, di destxetê de " *zeman bit*" e.

512. zerfu zeman: hokera demkî

513 mekan: cih, dews, şûn, şûnd, di destxetê de "*mekan bit*" e.

514. zerfu mekan: hokera cih û hindavê

515. mebniyê lefz ed-demm e: netewngbar e û bi pêşê, "u", tê bilêvkirin

516. ji bo 'hezfa mudafu îleyhî: di destxetê de "*ji ber*" e, ango ji ber ku balvedêrê wan ji wan ketiye ew netewangbarin.

517. edakirin: bicihanîn, pêkanîn

518. menwî: mebest, mexsed, armanc, di destxetê de *"edakirina mana wan e menwî bi lefzê mudafê"*, yanî nasdêrê wan çûye lê ew bi xwe, ku nasandî ne, wateya balvedêrî didin.

Eger dê menwî nebit şey´ek ji lefzê we ma'nayê(519), yan lefz menwî bit (520) yan mudafu îleyhî mezkûr bit (521) dê mu'reb bin nesben we cerren. (522) E'hwalên (523) wan geriyan çar (524) eger çi meşhûr sê ne.
Me'helle mensûb (525) nesbe bi teqdîra "fî" (526) her wekî qaîdê zerfan e bê weku mef'ûlu fîhî ye (527) ji bo mefhûmê cezaê (528) di êre da. Muqeddem bûye ji bo fesla di ma beyna edatê şert û cezaê (529) feqet (530) li nik Cumhûrî (531), yan ji bo 'îwed yan me'mûlê fi'l uş-şerteke (532) me'hzûf ku "yekun mîn şey´în" e(533) li nik ba'dê. Lewra eslê wê (534) bi bal mezhebê Muberredî ye (535).

---

519. **Eger dê menwî nebit şey´ek ji lefz we ma'nayê**: ger ku tiştek ji peyv û wateya balvedêr bi balvedayî nê mebest kirin.

520. **yan lefz menwî bit**: di destxetê de *"yan lefz bitenê menwî bit "* yanî ku bêjeya nasdêr bide lê wateya wî nede

521. **yan mudafu îleyhî mezkûr bit**: di destxetê de *"yan mudafu îleyhiyê wan mezkûr bit "* e ango yan balvedêrê van herduyan bi xwe li ber çav be.

522. **Dê mu'reb bin nesben we cerren**: di destxetê de *"dê mu'reb bit "* e, yanî gavê ev tiştê me got hebin hingê ew (qebl, be'd) wê tewangbar bin li ser servebarî û nasandin ê..

523. **e'hwal**: piraniya "'hal" e yanî rewş

524. **geriyan çar**: bûne çar, yanî seruberiya van herdukan bi çar awayan tê: yek balvedêrê wan çûbe û ew bi xwe wateya wî bidin, hingê netewangbar e, mîna vê derê. Du nasdêr çûbe û peyv û wateya wî ji qebl û be'dê nêzanîn. Sê ku ew peyva balvedêrê çûyî tenê bidin bê weku ya wateyê nedin. Çar ew e ku nasdêr gotî û berbiçav be. Di van hersiyên dawî de ew tewangbarên li ser servebarî û balvedêriyê ne. (32)

525. **me'helle mensûb**: di cihê servebarî de ye, ji bin ve bi zîber e.

526. **nesbe bi teqdîra fî**: ango servebariya wê (Be'du) ji ber hesabkirina "fî"-yeke nepenî ye.

527. **mef'ûlu fîhî**: serveyê neyekser

528. **mefhûmê cezaê**: ango kirdeyê neyekser e ji bo mercîxwazeke ku berbiçav tine lê cih û wate wê dixwaze, li gor wê "piştî dema valebûna ji hemd û selewatan em werin ser wan sed tewangdêrên di rêzimana Erebî de ".

529. **Muqeddem bûye ji bo fesla di ma beyna edatê şertê û cezaê**: ev bersiva pirsekê ye ango, çima serve berî lêkera xwe hatiye? Çimkî ew bûye navberîk ji bo daçeka mercê ku "emma" (لما) ye û nîşana mercîxwaziyê ku "F" (ف) ye.

530. **feqet**: bi tenê, di destxetê de peyva *"bi tenê "* jî heye.

531. **li nik Cumhûrî**: ango li cem piraniya rêzimannasan "be'd" ji bo ketina navbera daçek û mercîxwazê li pêş hatiye.

532. **fi'lu şert**: merclêker, di destxetê de *"me'mûl e ji bo fi'lu şerta me'hzûfe"* e.

533. **Yekun mîn şey´în**: tiştek bibe, tiştek çêbe

534. **lewra eslê wê**: çiku li gor wateyê, çiku li gor bingehê vî hevokî; di ya destxet de weha ye: *"lewra eslê wê bîna e li mezhebê Muberredî"*.

535. **bi bal mezhebê muberredî ye**: li gor rêgeh û rêçika Muberred ku yek ji rêgeha Kûfiyan e.

"Mehma yekun mîn şey'în (536) be'de zemenî el-fîraxî (537) mîn el-besmeletî (538) we el-'hemdeletî (539) we et-tesliyetî"(540) fe înn el-'ewamîle, (541) ilex. (542)
"Mehma" (543): 'amilê lefzî î sema'î îsmek ji esma'ê (544) cazîme (545) ye, mutedemmin e (546) ji bo ma'na "în "ê şertiye; (547) mebniyê lefz es-sukûn e (548). Me'hlle merfû' ref'e bi demm e, bê weku mubteda ye (549); 'amil di ref'a mubtedaî da me'hellen 'amilê ma'newî ye (550).

---

536. **Mehma yekun mîn şey'în:** çi dema tiştek bibe, gava tiştek çêbibe
537. **be'de zeman îl-fîraxî:** piştî dema valebûna (piştî valebûna)
538. **mîn el-besmeletî:** ji *"bîsmîllah er-Re'hman er-Re'hîm "*
539. **we el-'Hemdeletî:** û ji *"el-'hemdulillahî rebb îl-'alemîn "*, pesn û şêkir ji Xwedaê herkesî (cihanê hemû) re be.
540. **we et-Tesliyetî:** û ji *"es-selat we es-selam 'ala Seyyîdina Mu'hemmedin "*, Mihrîvanî û aştî li ser mezinê me Mu'emmed be.
541. **fe înne el-'ewamîle:** bêguman tewangdêrên ku, ev hevok ta dawî di ya destxet de nîne.
542. **îlex:** ji "îla àxirîhî" hatiye kurt kirin, yanî heyanî dawiya hevokî, ta dawî.
543. **mehma:** çi dema, kingê, gava, piştî danezanîna wî hevokê nepenîkirî şirovekar dest bi şiroveya bêjeyên wî yek bi yek kir.
544. **Esma'.** piraniya "îsm"e, ango navdêr, li gor pîvanên rêzimanzanên Ewropî ew hokere.
545. **cazîme:** rawestgêr, ango dengdara dawiya bêjeyê radike
546. **mutedemmin:** di xwe de girtî, ango wateya daçeka rawestgêr, "in", di xwe de digre û mîna wê kar dike. Her çendî li gor rêzimana Erebî ya serdema navîn ji vê û çendekî mîna wê re navdêr jî hatibe gotin lê li gor dema nû û li gor pîvanên rêzimannasên Ewropî ew hokerên pirsiyarkî ne. Hinek ji wan evên jêrî ne:

men (من) kî, çi kes
eyyu (أي) kîja, çi dibe -bibe,
ma (ما) çi, çi tişt
meta (متى) kingê, çi dema, çi gavê
mehma (مهما) kingê, çi dema, çi gavê, gavê,
eyne (أين) li ku, li kur, li kuderê, li ku dibe -bibe,
keyfe (كيف) çawa, çawa dibe
'heysuma (حيثما), her der, kur dibe -bibe,
îzma (إذما) kingê, çi dema, çi gavê
enna (أنى) li kur dibe, li kur. (33)

547. **inê şertiye:** daçeka rawestgêr, "in" (إن) ku maneya merc û egeriyê dide.
548. **lefz es-sukûn:** bi rawestekê tê bilêvkirin ango paşîya wê bê tîpa dengdar e.
549. **mubteda ye:** yanî "mehma" serwer e.
550. **'amilê ma'newî:** tewangdêrê rêzimanî, di destxetê de "îlex" jî heye.

"Yekun"(551): 'amilê lefzî î qiyasî fi'lek ji ef'alê tamme ye (552), bi ma'na "yeqe'û" ye (553); lefz meczûm cezme bi 'hezfa 'herekê, 'amil di cezma wê da(554) lefzen 'amilê lefzî î sema'î ku "mehma" ye (555).
"Mîn şey´în"(556): "mîn" (557) 'amilê lefzî î sema'î 'herfek ji hurûfê (558) carre ye mebniyê lefz es-ukûn bînaekî eslî ye. "Şey´" îsmekî mufred î nekîre ye,(559) lefz mecrûrê bi "mîn" cerre bi kesr e(560); teqdîr(561) merfû' ref'e bi demm e bê weku fa'il e ji bo "yekun". 'Amil di ref'a wê da teqdîren 'amilê lefzî î qiyasî ku "yekun" e.
"Be'du" (562) îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb îdafedana wê bi bal ma be'dê xwe ve ku "zemanî" ye (563). Lefz mensûb nesbe bi teqdîra "fî" (564) bê weku mefû'lu fîhî ye ji bo fi'lu şertê, ku "yekun mîn şey´î n" e(565).

---

551. yekun: bibe, dibe
552. ef'alê tamme: piraniya "fi'l e, yanî lêkera têrbar ku bê serve û pêgirê jî maneya wê temam dibe.
553. yeqe'û: dibe, dê bibe (ji lêkera bûn)
554. 'amil di cezma wê de: tewangdêrê ku dengdara dirêja nîvî, û ya kurta dawî ji lêkera "yekun" (يكن), ku eslê wê yekûnu (يكون) bûye, biriye.
555. mehma: kingê, çi dema, çi gavê, ango ya ku wan dengdaran jê biriye "mehma" ye. Di ya destxet de ev rêza han jî heye: *"fa'ilê xwe tê de mustetir e bi îstîtareke câizi ku huwe ye raci'ê bi bal mubtedâi ve"* ango kirdeya lêkera "yekun" pronava "huwe" ye û tê de veşartiye, lêbelê ev veşartin timî ne pêwîst e carna weha tê carna jî eşkere tê û mebest bi pironavê jî serwer e.
556. mîn şey´în: ji tiştekî
557. mîn: ji, di ya destxet de ev jî heye: *wadi'ê wed'a wê kiriye ji bo tebyîn"* danêr daçeka "mîn" ji bona diyarkirin û eşkerekirinê daniye.
558. 'hurûf: piraniya 'herf e li vir daçek
559. îsmekî mufred î nekîre ye: navdêrekî tekane û nebinavkirî ye
560. cerre bi kesr e: xwedîkarî û zêrbariya wê bi zêr (dengdara "i, î") ye, di ya destxet de ev jî heye: *"'amil di cerra wê da lefzen 'amilê lefzî î sema'î ku mîn e, carr û mecrûr zerfê musteqqer mute'lliqê bi 'hesele ve yan bi 'hasîlun ve ye. Me'lille merfû' ref'e bi demm e bê weku sîfet e ji bo mehma."*(*)
561. teqdîr: nepenî, nihênî, bi eslî
562. be'du: bêjeya "be'd" ku bi wateya paş, yan piştî ye
563. zemanî: bêjeya "zeman" ya di hevokê şirovekarî bi xwe de bihûrî.
564. nesbe bi teqdîra fî: servebariya wê bi daçeka zêrger, "fî" (في) ya nepenî ye.
565. fi'lu şertê ku yekun mîn şey´în e: ango serveyê neyeksere ji bo merdêkerê ku ew jî hevokê "yekun mîn şey´în" e. Di ya destxet de ev hevok hemû tine, bi tenê weha ye: *"mefû'lu îfhû ye ji bo yekun"*.

(*) li vir hem cudahî hem jî tevlîhevî di herdu çapan de jî heye, lê ger ku meriv bêje: min carre ye lê li gor wateya hevokî zêde ye û şey´ dibe kirde ji bo yekun hingê gelekî xweştir dibe.

'Amil di nesba wê da lefzen 'amilê lefzî î qiyasî ku fi'l e li nik Besriyan, îlex (566).
"Zemanî": îsmekî mufred î me'rîfe ye bi sebeb îdafedana wî bi bal ma be'dê xwe ve ku "el-fîraxî" ye. Lefz mecrûr cerre bi kasr e bê weku mudafu îleyhî ye ji bo "be'du" yê; 'amil di cerra mudafu îleyhî da lefzen 'amilê lefzî î qiyasî ku mudaf e îlex (567).

"El-firaxî" (568) îsmekî mufred î me'rîfe ye bi sebeb edatê te'rîfê; lefz mecrûr cerre bi kesr e bê weku mudafu îleyhî ye ji bo "zemanî". 'Amil di cerra mudafu îleyhî da lefzen 'amilê lefzî î qiyasî ku mudaf e îlex.
"Mîn el-besmeletî" (569) carr û mecrûr zerfê lexw (570) mute'elliqê bi "el-fîraxî" ve ye (571).
"We el-'hemdeletî (572), we et-tesliyetî (573); "etfun 'ela el-besmeletî" (574).

Fe înne el-'ewamîle: (575) "fa"a cezaiye (576) mebniyê lefz el-fet'h e (577). Hem rabîte (578) jî dibêjinê ji bo cewaba şertê (579), hem fesî'hiye (580) jî dibêjinê eger fi'luşert me'hzûf bit wekî niha di êre de.

---

566. **îlex**: heyanî dawî, ta dawî, temamiya wê li pêş di rûpelê çaran de derbasbû.
567. **îlex**: li rûpelê dehan binihêre!
568. **el- firax**: valebûn, xilasbûn, kutabûn
569. **mîn el-besmeletî**: ev kurtasiya "Bismillahî er-Re'hmanî er-Re'hîmî" ye, ango piştî valebûna ji "Bîsmîllahî. . ." ta dawî. Di ya destxet de ev hevokê han jî heye: *"minê carr e el-besmeletî mecrûrê pê ye"*.
570. **lexw**: bêkêr, bêrê, çewt, tewş, vale, rabiwêj, rabûyî, netêrker
571. **Mute'elliqê bi el-firaxî ve ye**: yanî xwe bi bêjeya "el- firaxî " ve digre
572. **we el-'hemdeletî**: ev jî kurtasiya " el-'hemdu lillahî Rebbî el-'alemîne" ye, pesn û spasî her ji bo wî Yezdanê ku xweyê cihanê hemû ye.
573. **et-tesliyetî**: ev jî kinahiya "es-selatu we es-selamu 'ela Mu'hemmedîn" e, mihrî vanî û aştî li ser Muhemmed pêxember be.
574. **'etfun 'ela el-besmeletî**: yanî evên han jî bi ser "el-besmeletî" ve tên dayîn û tewangeya wan jî eynî ye.
575. **Fe înne el-'ewamîle**: bêguman 'heçîka tewangdêr
576. **faa cezaî ye**: ango tîpa "f" (ف)a Erebî di hevokê "fe înne. . . " de ji bo mercîxwaziyê ye, hevokê pey xwe dike bersiva mercê.
577. **lefz el-fet'h e**: bi ziberê (dengdara "e") tê bilêvkirin, di destxetê de "bînaekî esliye" jî heye.
578. **rabîte**: hevgirêdan, girêdar ango ji vê "f" (ف) yê re ya hevgirêdanê jî tê gotin.
579. **ji bo cewaba şertê**: ango mercîxwazê bi merclêkerê ve dide girêdan, di ya destxet de di şûna vî hevokî de *"ji ber rebta cewabê bi şertê"* ye.
580. **fesî'hiye**: rewanbêjî, beyankarî, yanî "f" ya me ji bo beyankarî jî tê.

"înne" (581) 'herfek (582) ji 'hurûfê muşebbeh bî el-fi'l e (583), mebniyê lefz el-feth e bînaekî esliye (584).

"El-'ewamîle" (585) îsmekî mecmû'î me'rîfe ye bi sebeb edatê te'rîfê; lefz mensûb nesbe bi fet'h e bê weku îsm e (586) ji bo "înne". 'Amil di nesba îsmê da lefzen 'amilê lefzî î sema'î ku "înne" ye.

fî en-ne'hwî: "fa"-ê carr e (587) ne'hwî mecrûrê pê ye (588), carr û mecrûr zerfê musteqerr (589) mute'elliqê bi îsmufa'ilekî (590) mecmû'î me'rîfe ve ye ku "el-'hewasîlu" ye (591). Me'helle mensûb nesbe bi fet'h e bê weku sîfet e ji bo "el-'ewamîlu". 'Amil di nesba sîfetî da lefzen 'amilê mewsûfî ye, lewra sîfet tabi'ê (592) mewsûfê xwe ye (593) di deh eşy'an (594) de ku: e'erabê selase (595)

---

581. **înne**: peyvika "înne", yanî bêguman, bêşik

582. **'herfek**: tîpek, li vir mebest pê gihandekek e.

583. **muşebbeh bi el-fi'l e**: ango hem di şeklê xwe de û hem jî di tewangeya xwe de mîna ye lêkerê, yanî gihandeka lêkerbar e. (34)

584. **bînaekî esliye**: netewangbariyeke bingehîn, çiku gihanek, gihandek, daçek, û yên weha ku Ereb ji wan re " 'herf" dibêjin hemû netewangbarên bingehî ne.
Gihandekên lêkerbar şeş heb in:
înne (إنّ) û *enne* (أنّ) bêguman, bêşik,
ke'enne (كأنّ) mîna, weke,
lakinne (لكنّ) lê, lêbelê, bes,
leyte (ليت) xwezî, xwezîka,
le'elle (لعلّ) hêvîdar im, tika ye. Ev her şe jî hevokekî navdêrî ditewînin û serveyê wî hevokî servebar (bi ziber "e") dikin, ji xwe re dikin kirde û pêgirê wî jî kirdebar (bi pêş "u") dikin, ji xwe re dikin pêgir. (35)

585. **el-'ewamîle**: piraniya 'amilet e yanî tewangdêr

586. **îsm e**: li vir mebest pê kirdeya navdêrî ye

587. **faê carr e**: ango "fî" (في)ya pêşiya "fî en-ne'hwî" daçeka zêrger e

588. **ne'hwî mecrûrê pê yê**: ango peyva "en-nehwî" bi "fî" hatiye bi zêr (dengdara "i,î") kirin.

589. **zerfê musteqerr**: hokera cihgirtî, hokera cihdayî, hokera têrker

590. **îsmufa'il**: parenga çalak, taybetnavê çalak

591. **el-'hewasîlu**: 'hewasîlu piraniya "'hasîletun" e ku mêkaneya parenga çalak, "'hasîlun" e, ango bûyî. Di destxetê de "el-'hasîletun" hatiye.

592. **tabi'**: peyrew, li pey diçe, li vir mîna, weke

593. **mewsûfê xwe**: peyva "xwe" di destxetê de nîne.

594. **eşya'**: piraneya "şey'" e yanî tişt, li vir mebest pê qaîdeyên rêzimanî ne.

595. **e'rabê selase**: hersê cureyên tewangeyê, yanî xuyadar (diyargîn) di rewşa kirdebariyê de, ku nîşana wê dengdara "u, û" ye, di ya servebariyê de, ku nîşana wê dengdara "e" ye, û di ya balvedêriyê de, ku dengdara "i, î" ye, eyn weke xuyadar-kiriyê xwe ye. (36)

we îfrad (596) û tesnî (597) û cem' (598) û te'rîf û tenkîr (599) û tezkîr û te´nîs in (600). Her terkîbek(601) çar jê têne wucûdê (602) eger wesfa şey´ê bi 'halê şey´ê bit (603).
Di pêncan de (604) ku: e'erabê selase (605) û te'rîf (606) û tenkîr in (607). Her terkîbek dido jê têne wucûdê (608) eger wesfa ş ey´ê bi 'halê mute'elliqê ş ey´ê bit(609). Yan mute'elliqê bi fi'leke madî (610) ve ye medxûlê bi qedê (611) ye ku "qed 'heselet" e (612); yan bi îsmufa'ilekî mensûb (613) î nekîre (614) ve ye ku "'hasîletun" e (615).

---

596. we îfrad: û di tekaneyî de, yanî gava diyargînkirî tekane be wê diyargîn jî tekane be.
597. tesnî; dual, cot, ango dema pesindayî dual be wê diyargîn jî dual be.
598. cem': pirane, her weha ku xuyadarkirî pirane be dê xuyadar jî wusa be.
599. te'rîf û tenkîr: ango gava diyargînkirî binavkirî be dê diyargîn jî binavkirî be lê gava ew nebinavkirî be dê diyargîn jî weha be.
600. tezkîr û te´nîs: yanî ku pesindayî mêr be wê pesindar jî mêr be lê gava ew mê be wê pesindar jî mê be.
601. terkîb: hevdudanî, hevoksazî, hevokristin, hevokdanîn
602. wucûd: çêbûn, peydabûn, hatin
602. Her terkîbek çar jê têne wucûdê: yanî hevokê ku diyargîn û diyargînkirî tê de bin, divê çar ji wan dehên gotî tê de bêne cih: yek ji wan hersê nîşanên tewangeyê, ji pirane, dual û tekane jî yek, ji binavkirin û nebinavkirinê jî yek û ji nêr û mêyîtiyê jî yek. (37)
603. wesf: pesn, fort, diyargîn
603. şey´: tişt, li vir mebest pê pesindayî ye
603. Eger wesfa şey´ê bi 'halê şey´ê bit: yanî geva mebest bi diyargîn rewşa pesindayî bi xwe be hingê wê diyargîn di wan dehan de mîna pesindayî be û divê çar ji wan deh şertan jî bi hev re bên; mînak: "rûkenê rastgo". (38)
604. di pêncan de: yanî wê diyargîn di pênc tiştan de layî diyargînkirî be.
605. e'erabên selase: hersê nîşanên tewangeyê ku me got
606. te'rîf: binavkirin
607. tenkîr: nebinavkirin
608. Her terkîbek dido jê têne wucûdê: yanî gava pênc bin hingê pêwîst e di her hevokek ji wan de du heb bêne cî, yek ji tewangeyan û yek jî ji binavkirin û nebinavkirinê.
609. Eger wesfa şey´ê bi 'halê mute'elliqê şey´ê bit: ango gava pesindayî ne bi xwe lê bi der û dor û pêgirtiyê xwe bê pesindan hingê di pênc tiştan de mîna hevin û pêwîst e du heb ji wan bi hev re bên; mîna "şervanê dinarqenc". (39)
610. fi'leke madî: lêkera dema raborî, li pêş bihûrî ku ew xwe bi parenga çalak î binavkirî ve digre, lê li vir dazanîn ku "fî en-ne'hwî" ya me kare xwe bi lêkereke dema raborî ve jî bigre. Di destnivîsê de "*ve ye*" tune.
611. medxûlê bi qedê: yanî ew peyvika "qed" (قد) ku tê pêşiya lêkerê û wateya eseyîtî û sexbiriyê dide.
612. qed 'heselet: bêguman ew çêbûne, eseyî ew peydabûne
613. mensûb: servebar, ziberbar, bi ziber
614. nekîre: nebinavkirî, nenaskirî, yanî herweha "fî en- ne'hwî"ya me kare xwe bi parenga çalak ya nebinavkirî ve jî bigre ku ew jî "hasîletun"e.
615. 'hasîletun: ew çêbûyî ye, ew peydabûyî ye

Me'helle mensûb nesbe bi fet'h e; bê weku 'hal e ji bo îsmê "înne" (616) li nik Sîbeweyhî bi xîlaf Cumhûrî (617), lewra caiz e (618) li nik wî 'hal ji xeyrî fa'il û mef'ûlan. 'Amil di nesba 'halî da me'hellen 'amilê zî el-'halî ye (619) ku, bi mana fi'lê ye (620), mustefadê (621) ji "înne" ye di êre de ku "u'heqqîqu" ye (622).

'Ela ma ellfehu eş-Şeyx: (623) "'ela"-ê carre mebniyê lefz es-sukûn e. (624) "Ma"ê mewsûle ye (625) yan mewsûfe ye (626) mebniyê lefz es-sukûn e. Mewsûf bi tenê îttîfaqen (627) eger dê mewsûfe bit, mewsûl (628) bi tenê li nik Cumhûrî (629) yan digel silleî (630) li nik îbnu 'Hacib eger dê mewsûlê îsmî bit (631), ku ma (632) la budde lehu (633) mîn (634)

---

616. îsmê "înne": kirdeyê navdêrî yê gihandeka "înne" ye.
617. bi xîlaf Cumhûrî: yanî tevahî (piranî) ya rêzimannasan dijî vê dîtinê ne.
618. lewra caiz e: ev bersiva pirsekê ye, "ma ne rewşdêr gere yan ji kirdeyê yan jî ji serveyî re were? "Belê lê Sîbeweyhî hatina rewşdêr ji bilî wan re jî durust didêre".
619. zî el-'hal: xweyrewş, rewşdar, rewşdiyarbûyî
620. bi mana fi'lê ye: yanî her çendî ne lêker be jî lê wateya wê dide
621. mustefad: famkirî, tê zanîn, tê deranîn, ev der di ya destnivîs de weha ye: "*ku mana fi'lê mustefadê ji înneyê*" yanî ew wateya lêkerê ku "înne" wê dide zanîn.
622. u'heqqîqu: ez eseyî dikim, ez rastiya wî derdixim û dibêjim, ev peyv di ya destnivîs de "*u'ekkîdu*" ye, yanî ez sexîtî dikim, ez eseyî dikim.
623. 'Ela ma ellefehu eş-Şeyx: li gor nivîsandina Şêx, li gor ku Şêx wan daye hev û li ser kaxiz rêzkiriye.
624. mebniyê lefz es-sukûn e: di destnivîsê de "*bînaekî esliye*" jî heye.
625. maê mewsûle: peyvika "ma" pronava peywendiyê ye, gihaneka peywendiyê ye, pêgeh e, pronava girêkî ye.
626. mewsûfe: rengdêra çawahî, rengdêra pesnê, di destnivîsê de "*maê mewsûfe bit*" e.
627. îttîfaqen: yekgirtî, bi yekîtî, bi yek devî
628. mewsûl: pronava peywendiyê, peywendîgar
629. Cumhûr: piraniya rêzimannasan, tevahiya wan, di destnivîsê de "*eger dê maê mewsûle bit*" jî heye.
630. sille: peywendî, peywendehevok, maneya van çend rêzan ev e: gava "ma" rengdêra çawahî be hingê bi tevayî ew bi tena serê xwe di rewşa raderî de tê hesabê, lê gava "ma" pronava peywendiyê be wê demê jî li cem piraniya rêziman nasan ew bi tena serê xwe mîna raderî tê hesabê, bes li gor dîtina îbn 'Hacib, pronava peywendiyê tevî peywendehevokê xwe di cihê raderî de ye.
631. eger dê mewsûlê îsmî bit: yanî gava peywendîgarê me navdêr be, hingê ew rewşa li jor, derbasdibe.
632. ma: tişt, ew, ewê (peywendîgarê)
633. la budde lehu: pêwîstiya wî hebe, pêwîst be
634. mîn: ji

sîletîn (635) we 'aîdîn (636) li nik Cumhûrî, yan ma la yetummu cuz´en mîn el-kelamî îlla bîhîma (637) li nik Îbn 'Hacib.
Yan digel silleî (638) di te´wîla mesderî da (639), teqdîra kelamê (640) "'ela te`lîfî eş-Şeyxî iyyah"(641) eger dê mewsûlê 'herfî bit (642) ku ma yu´ewwelu me'e silletîhî bî mesderîn (643). Me'hlle mecrûrê bi 'elaê (644) cerre bi kesr e, carr û mecrûr zerfê musteqerr mute'elliqê bi "'heselet"(645) ve ye yan bi "'hasîletun"ê (646) ve ye. Me'helle mensûb nesbe bi fet'h e (647) bê weku 'halê ji fa'ilê carr û mecrûran e (648). 'Amil di nesba 'halî da

---

635. **sîlletîn**: peywendî, peywendehevok
636. **we 'aîdîn**: û pronava hevgirêdanê
636. **ku ma la budde lehu mîn silletîn we 'aîdîn**: yanî ew peywendîgarê navdêr ku li cem piraniyê pêwîst e jê re peywendiyek û pronava peywendiyê were, peyva *"lehu"* di destnivîsê de tune.
637. **la yetummu**: temamnabe, naqede, çênabe, yanî kêm dimîne
637. **cuz´en**: beşek, hinek
637. **el-kelam**: xeberdan. axavtin, gotin, hevok, nîvhevok
637. **îlla**: bil, xeyn
637. **bihîma**: bi wan herduyan, yanî peywendehevok û pevgirêdar
637. **Yan ma layetummu cuz´en mîn el-kelamî îlla bîhîma**: ew peywendîgarê navdêr ku, li cem îbn 'Hacib, bê wan (peywendehevok û pronava hevgirêdanê) nikare bibe beşek ji hevokî.
638. **yan digel silleî**: ev hevok li pêş carekê bihûrî, hatina wî carek din li vir hem zêde ye û hem jî wateyê xiradike.
639. **di te´ewîla mesderî da**: di wateya raderî de, yanî tê guhaztin dibe mîna raderî.
640. **teqdîra kelamê**: yanî gava wek raderî bê hesabê hingê eslê hevokê me wek li jêr tê pêşîrandin.
641. **'ela te`lîfî eş-Şyexî iyyahu**: yanî lêkera "ellefehu" dibe mîna radera "te´lîf" û bi bal kirdeyê xwe ve ku "eş-Şeyxî" ye lê dayîn, yanî li gornivîsandina Şêx, li gor ku Şêx wan rêzkiriye.
642. **Eger dê mewsûlê 'herfî bit**: yanî ger peywendîgarê me daçek be hingê peyvika "ma" lêkerê û kirdeyê wê weha diguhirîne.
643. **Ma yu´ewwelu me'e silletîhî bî mesderîn**: ew peywendîgarê ku tevî peywendiyê xwe dikeve cihê raderî.
644. **me'helle mecrûrê bi 'elayê**: kîja ji wan tişt û rêgehên me gotibe jî her ew di wateya raderî de ye û ji bin ve bi daçeka zêrger, "'ela" digere bi zêr (dengdara "î, i")
645. **'heselet** ji lêkera 'hesele ye û ji bo tekaneya kesa sêyemîn e, ango bû, çêbû, di destnivîsê de "qed'heselet" e, yanî bêgumanê çêbûye; û peyvikên "ve ye" jî tê de nîne.
646. **'hasîletun**: parenga çalak ji eynî lêkerê ji bo tekaneya mê.
647. **me'helle mensûb nesbe bi fet'h e**: yanî daçek û zêrbar tevî lêker yan parenga xwe di bin de servebar e û nîşana servebariya wê jî ziber e (dengdara "e").
648. **carr û mecrûran**: daçeka zêrger û navdêrê bi zêr ku "fî en-ne'hwî" ye.

me'hellen 'amilê lefzî î qiyasî ku fi'la mustenbitê (649) ji carr û mecrûran e. Caîz e ku sîfetê be'de sîfet bit (650), yan 'halê be'de el-'hal bit (651) ji bo îsmê "înnê" (652). Hem caîz e dê mute'elliqê bi "mîetu" wa mu´exxer (653) ve bit bi sebeb te´wîla wê bi "me'dûdetun"-ê (654). Lewra wekî camid mu´ewwel bibin bi muşteqqa (655) di 'hukmê muşteqqatan de ne (656) di xwestina fai'l û mef'ûlatan da (657).

Tu bizan! "Ma" (658) li diwazde wechan (659) hatiye di pêncan de 'herfî (660) ye, di heftan de îsmî (661) ye; laiq nîne zikirkirina (662) wan di êre de.

"Ellefehu" (663) 'amilê lefzî î qiyasî fi'la madî ye, mebnî ye ji bo fa'ilê (664) mewdû'e ji bo mufredê muzekkerê xaib (665) di 'haletê bînaê da (666).

---

649. **mustenbit**: derxistî, derketî, yanî lêker berbiçav tune lê daçeka zêrger û zêrbar wê divên, ew jî li vir "heselet" e.

650. **sîfetê be'de sîfet bit**: yanî wê diyargînê duyemîn be, erke "fî en-ne'hwî" xuyadarê yekemîn be ji bo kirdeyê "înne" ku "el-'ewmîle" ye

651. **'halê be'd el-'hal bit**: yan jî wê rewşdêrê duyemîn be ger "fî en-ne'hwî" rewşdêrê yekemî be ji "el-'ewamîle" re.

652. **îsmê înnê**: kirdeyê navdêrî ji bo gihandeka lêkerbar ku " înne" ye, ev di destnivîsê de "*îsmê înneyê* " ye.

653. **mîetuwa mue´xxer**: peyva "mîet" (مِئة), sed, ya li paş .

654. **Bi sebeb te´wîla wê bi me'dûdetunê**: ji ber ku dikeve şûna parenga neçalak, "me'dûdetun" (معدودة), jimartî ye. Çiku divê zêrger û zêrbar yan xwe bi lêkerê ve yan jî xwe bi peydabûyê ji lêkerê ve (mîna rader, rengdêr, pareng û yên din ku wateya van didin) bigre.

655. **mu´ewwel bibin bi muşteqqa**: ku têkevin şûna xurdezadan û wateya wan bidin, di destxetê de "muşteqatan" e.

656. **Di 'hukmê muşteqqatan de ne**: yanî rewşa wan jî mîna ya xurdezadan e, di destnivîsê de "muşteqan" e.

657. **mef'ulat**: piraneya mef'ûl e yanî serve, yanî ew navdêrên xwerû ku dikevin şûna xurdezadan ew jî mîna wan kirde û serve dixwazin.

657. **di xwestina fa'il û mef'ûlatan de**: ev hevok di destnivîsê de tune.

658. **ma**: peyvik/daçeka "ma" (ما)

659. **wech**: rû, sûret, di vir de awa, şikil, mane

660. **'herfî**: bê weku tîp yan daçek bê hesabê

661. **îsmî**: bê weku navdêr tê hejmarê

662. **zikirkirin**: gotin, yanî ji ber dirêjbûnê hewce nîne em li vir wan rêz bikin.

663. **ellefehu**: wî ew nivîsand

664. **mebnî**: netewngbar, li vir avabûyî, sazbûyî

664. **mebnî ye ji bo fa'ilê**: (*bina fa'il e*), ango lêkera lebatî ye, lêkera çalak e, yanî kirin ji kirde tê holê digihîje yek yan jî cihekî din, ango digihîje serve.

665. **muzekker**: nêr

665. **xaîb**: neamade, nehazir, ne li civatê, li vir kesê/a sêyemîn

665. **mufredê muzekkerê xaîb**: kesê nêr yê sêyemîn î tekane (kesê sêyemîn)

666. **'haletê bînaê**: netewangbar e, li ser netewangbariyê hatiye avakirin

mebniyê lefz el-fet'h e (667), lewra f'ila madî dê mebnî ul-fet'h bit (668) lefzen yan teqdîren îlla(669) li nik îttîsala(670) demîra weku la'hiqî(671) axirê fi'lê(672) dibit dê medmûm (673) bikit yan sakin (674) bikit. Vê carê dê mebnî li demme bit yan li sukûn bit (675).

"Ha"(676) ismekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb demariyetê; demîr bariz e, mensûb î muttesil e, mebniyê lefz ed-demm e. Me'helle mensûb nesbe bi fet'h e bê weku mef'ûlu bîhiyê serî'h e (677) ji bo ellefê ra, muqeddem bûye (678) li fa'ilê xwe wucûben (679). Lewra wekî mef'ûl (680) demîra muttesil bit, (681) fa'il muzhar bit (682) wacib e teqdîma wî li fa'ilî (683) her wekî li 'eksê (684). 'Amil di nesba mef'ûlî da me'hellen 'amilê lefzî î qiyasî ku fi'l e li nik Besriyan îlex (685). Ev fi'l digel ma 'emîle fîhiyê (686) xwe cumlekî fi'lî ye, me'helle mecrûr (687) eger dê sîfet bit (688) yan la me'helle leha mîn el-e'erabî eger dê sille bit (689).

---

667. mebniyê lefz el-fet'h e: netewangbar e û bi ziberê tê bi lêv kirin, di destnivîsê de "esliye" jî heye, yanî netewangbariya wê bingehîye.

668. dê mebnî ul-fet'h bit: timî netewangbar e û bi ziber (dengdara" e") e.

669. îlla: ji bilî, xeyn ji

670. îttîsal: zeliqandin, pêvegirtin

671. demîra weku la'hiqî: pronava ku digihîje (gihîştiye)

672. axirê fi'lê: dawiya lêkerê

673. medmûm: bi pês (dengdara "u"), di destnivîsê de "dê" tune û "bikit" jî "dikit" e, yanî lêkera dema raborî di zimanê Erebî de timî bi ziber e, lê gava pronava pirane pê ve dizeliqe hingê yan bi pês e yan jî bi rawestek e.

674. sakin: bi rawestek, bê dengdar

675. vê carê dê mebnî li demme bit yan li sukûn bit: yanî gava pronava pirane bi lêkera dema borî re be û wê bi pês yan bi rawestek bigerîne, hingê dê ew lêkera me netewangbarê li ser pêşê yan jî li ser seknê be. Ev der di destxetê de wehaye: "*vê carê mebnî lefz ed-demm bit yan mebnî lefz es-sukûn bit*. Li gor herdu çapan jî hem di vî hevokî de û hem jî di yê pêşiya wî de tevîhevî û dubareyî heye.

676. ha: ango "h" (ه) ya di "ellefehu" de

677. mef'ûlu bîhiyê serî'h: serveyê yekser

678. **muqeddem bûye**: ketiye pês li pês hatiye,

679. **wucûben**: bi pêwîstî, bivênevê

680. Lewra wekî mef'ûl: ev bersiva pirsekê ye yanî "çima li vir pêwîst e serve li pês bê? "Çiku gava serve pironav be . . .", ta dawî

681. demîra muttesil bit: pronava zeliqandî be

682. fa'il muzher bit: kirde jî navdêrekî eşkere be

683. wacib e teqdîma wî li fa'ilî: yanî pêwîst e ku serve li pêşiya kirdeyî were

684. 'eks: berevacî, yanî gava kirde pironav be hingê divê ew li pês be.

685. îlex: ta dawî, ku li pês di rûpelê şeşan de bihûrî

686. ma 'emîle fîhî: ewên ku lêkerê wan tewandiye, wek kirde, serve û yên din.

687. me'helle mecrûr: nîşana balvedêriya wî di bin de ye, ango bi ş ûnwarî ye

688. eger dê sîfet bit: yanî ger ku hevokê me bibe diyargîn, bê weku "ma"yê çawahiyê be.

689. Eger dê sille bit: ger ku hevokê me peywendehevok be/peywendî be.

"Eş-Şeyxu" (690) îsmekî mufred î me'rîfe ye bi sebeb edatê t'erîfê, lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku fa'il e ji bo ellefê (691).
El-îmamu (692) îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb edatê te'rîfê, lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku sîfet e ji bo "eş-şeyxu" wê. 'Amil di ref'a sîfetî da (693) lefzen 'amilê mewsûfî ye (694).
'Ebd el-Qahir: (695) "'Ebd" îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb îdafedana wî bi bal ma be'dê xwe ve ku "el-qahîru"ye. Lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku bedel e yan 'etfubeyan e ji bo "eş-Şeyxu".
"El-Qahir" îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb edatê te'rîfê, lefz mecrûr cerre bi kesr e bê weku mudafu îleyhî ye ji bo "'ebdu"wê. Fa'ilê xwe tê de mustetir e raci'ê bi bal mewsûfekî meqedder ve ye, di 'hukmê melfûzî (696) da ye ku Allah e (697), eger "elîf-lam" êr (698) li ser muşteqqan herfê te'rîfê (699) bin her wekî li ser camidan ku mezhebê Sekkakî ye. (700) Yan "elîf-lam"ên mewsûle ne bi ma'na "el-lezî" (701) ne her wekî mezhebê Cumhûrî, mebniyê lefz es-sukûn e "qahirî" silleyê wê ye, fa'ilê xwe tê de mustetir e raci'ê bi bal "elîf-lam"an (702) ve ye. Ev e yek ji wan mewadi'ê (703) weku îsmufa'il digel fa'ilê xwe cumle (704) bit, sanî (705) ew e ku waqi' bibit (706)

---

690. **eş-şeyx**: peyva "şeyx" di zimanê Erebî de bi sê wateyan tê: Ji bo kesê navsere û pîr, ji bo kesê pir zana û serwext, ku li vir mebest pê ew e, û ji şêxê terîqetê re tê bikaranîn. (40)
691. **ellefê**: lêkera "ellefe"ku me bihûrand, di destnivîsê de " ellefeyê " ye û ev nîv rêz jî tê de heye: "*'amil di ref'a fa'îlî da lefzen 'amilê lefzî î qiyasî ku ellefe ye* "
692. **el-îmam**: peyva "el-îmam" bi maneya pêşik, pêşewa, mezin, zana, rêber û yê ku xelk dide pey yanî xwey rêgeh (mezheb).
693. **sîfetî da**: diyargînî de, di destnivîsê de weke hemû cihê din di şûna "da" de "de" tê.
694. **'amilê mewsûfî**: tewangdêrê pesindayî, ango yê "eş-Şeyxu"
695. **'ebd**: bêjeya "'ebd" ku bi maneya kole, bende, evd û benî tê.
696. **'hukmê melfûzî**: yanî nepenî ye lê di warê berbiçavî de ye û mîna ye wî.
697. **ku Allah e**: yanî ji ber ku "el-Qahir xesyetnavekî Xwedê ye, peyva "Allah" yekser wek ku berbiçav be, jê tê zanîn.
698. **elîf-lam**: yanî veqetandeka "el", jê re "edatê te'rîfê" jî tê gotin.
699. **herfa te'rîfê** (elîf-lamên te'rîfê, edatê te'rîfê): veqetandek, zêder
700. **Sekkakî**: yanî li gor rêgeha Sekkakî "el"a ser xurdezadan jî mîna ya ser navdêrê xwerû veqetandek e, lê piraniya rêzimannasan wê mîna "el"a peywendigar ya bi wateya "el-lezî", ewê werengî, di pejirînin.
701. **el-lezî**: ewê, ev peywendîgara bingehîn e.
702. **elîf û laman**: "el"a ser "el-Qahir"
703. **mewadi'**: piraniya mewdû' e yanî cih, dever, mijar, behs, biwar, babet
704. **cumle**: hevok, yanî li pêş bihûrî ku parenga çalak digel kirdeyê xwe ne hevok e ji bilî sê cihan. Li vir ew bi vê cewetê wan hersê cihan tîne ziman û dibêje "yek jê ev e" yanî gava bibe peywendehevok.
705. **Sanî**: duyemîn
706. **waqi' bibit**: bibe, bikeve, bê

di pey 'herfa nefyê û îstîfhamê, (707) salis (708) ew e ku waqi' bibit mufessir (709) ji bo demîr eş-ş e´n(710). E'raba wî (711) her wekî berê (712) ye, lewra mewsûl (713) qabil nîne ji bo e'erabê (714) çiku li şeklê 'herfê (715) ye bi xîlaf silleî (716).
Weha reng e 'hukmê "la" (717) we "îlla"ê (718) weku bi ma'na "xeyr"ê bin(719) digel ma be'dê xwe. Wekî niha "beqeretun la zelûlun" (720) dibêjî, yan "we lew kane fîhîma alîhetun îllallahu lefesedeta". (721)
Bin: (722) bi hezfa (723) hemzê (724) bi sebeb wuqû'a wê sîfet (725) we ma beyna du 'eleman (726) de we xeyrê mesedder e bi ewwelê setrê (727).

---

707. 'herfa nefyê û îstîfhamê: pironava neyînî û ya pirsê yanî gava parenga çalak piştî pronava pirsiyarkî, yan ya neyîniyê bê hingê jî digel kirdeyê xwe dibe hevok.
708. salis: sêyemîn
709. mufessir: ravekar, şirovekar
710. demîr eş-ş e´n: pironava nenas, ya hal û rewşê, yanî gava parenga me pronaveke neciğir şirovebike hingê jî dibe hevok.
711. e'eraba wî: tewangeya "el"
712. her wekî berê: gava veqetandek bû çawa bû dema peywendîgar e jî wusa ye.
713. mewsûl: peywendigar, pronava peywendiyê
714. qabil nîn e ji bo e'erabê: netewangbar e, nayê tewandin
715. şeklê 'herfê: mîna ye herf û daçekan, ji xwe bihûrî ku ew netewangbar in.
716. bi xîlaf silleî: yanî peywendî weha nîne, ew tê tewandin.
717. la: ango daçeka neyîniyê bi maneya ne û na ye.
718. îlla: yanî daçeka ji ber deranînê ku bi wateya bil, xeyn, derî jê ye.
719. ku bi ma'neya xeyr bin: yanî gava "la" û "îlla" bi wateya bil û xeyn bin her çendî navdêr in jî lê ji ber ku weke daçek û tîpan (pîtan) e ew jî nayên tewandin û tewangeya wan dikeve ser hevokê paş wan.
720. Beqeretun "la" zelûlun: çêlekeke ku ne qels û ne bêkêr be.
721. We lew kane fîhîma alîhetun "îll"Allahu lefesedeta: Eger ji bilî Yezdan di herduyan (erd û esman) de Xwedayekî din hebûna bêguman wê ew (erd û esman) xirabibûna.
722. îbn: kur, kurê
723. 'hezf: ketin, çûyîn, windabûn
724. hemze: elîf, herfa yekemîn ji alfabeya Erebî ku li vir dibe "î" ango bingehê "bin"ê "îbn" e lê ew "î"ya wê jê ketiye.
725. bi sebeb wuqû'a wê sîfet: yanî ji ber ku bûye diyargîn
726. we ma beyna du 'eleman: û ji ber ku di navbera du serenavan, 'Ebd el-Qahir û 'Ebd ur-Re'haman, de hatiye.
727. musedder: ketî, hatî
727. ewwel: destpêk, pêşî, serî
727. setr: rêz, xet
727. we xeyrê musedderê bi ewwelê setrê: û ji ber ku ne di serê rêzê de ye.

Eger yek ji van hersê şertan mefqûd (728) bit dê sabit (729) bî kîtabeten (730), saqit (731) bî qîraeten. (732) Me'rîfe ye bi sebeb îdafedana wê bi bal ma be'dê xwe ve ku " 'Ebd er-Re'hmanî" ye. Lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku sîfet e yan 'etfubeyan e ji bo "'Ebd el-Qahir".

'Ebd er-Re'hman: "'Ebd" îsmekî mufred î me'rîfe ye bi sebeb îdafedana wî bi bal ma be'dê xwe ve ku "er-Re'hmanî" ye. Lefz mecrûr cerre bi kesr e bê weku mudafu îleyhî ye ji bo "bin"uyê. "Er-Re'hman" (733) mudafu îleyhî ye ji bo "'Ebd"uwê; terkîba (734) wê mîslê (735) terkîba "el-Qahir " e (736) re´sen bi re´sîn (737).

Lewra (738) m u rekkebatê (739) teqyîdiye (740) çi îdafî (741) bin wekî niha "'Ebd er-Re'hman" dibêjî çi tewsîfiye (742) bin wekî niha "el-'heywan en-natiq"(743) dibêjî, çi îsnadî (744) bin wekî niha "te´ebbete şerren" (745) dibêjî, li nik 'elemiyetê mufred in lefzen murekkeb in sûreten. (746) Em

---

728. **mefqûd**: tune, nîn, windabûyî, neyî

729. **sabit**: heyî, mayî, li cih

730. **kîtabeten**: nivîsandî

731. **saqit**: tune, birînî, ketî, jêketî

732. **qîraeten**: xwendî, bi xwendinê yanî gava ne xuyadar be, yan ne di navbera du serenavan de be yan jî di serê rêzê û hevokî de be wê "î" ya "îbn" nivîsandî hebe lê nayê xwendin, lê dema ku ev şert li cih bin hingê ew ji binî diçe û "îbn" dibe "bin". încar eger ku di serê rêzê de be hingê "î" hem nivîsandî heye û hem jî tê xwendin (41).

733. **er-Re'hman**: taybetnavekî Xwedê ye ku wek nav tê bikaranîn, yanî dilovan û mîhrîvan.

734. **terkîb**: hevokdanîn, hevoksazî, tewangeya hevokristinê, yanî rewşa tewangeya wê û cihê wê di hevokî de

735. **misl**: weke, mîna, fena, layî

736. **el-Qahir**: li pêş bihûrî

737. **re´sen bî re´sîn**: ser bi ser, bi her awayî, bi tevayî, ne kêm ne zêde eynî ye

738. **lewra**: çiku, ev bersiva pirsekê ye weke yek bêje: "'Ebd er-Re'hman erenav e, tu çawa du terkîban lê dixî?", Bersiv: "Erê lê ev serenavê hevdudanî ye ku ji "'Ebd" û "er-Re'hman" pêkhatî ye, hevdudanî jî. . . . ." ta dawî.

739. **murekkebat**: hevdudanî

740. **teqyîdî**: qeydkirî, girêdayî,

741. **îdafî**: yanî gava girêdana wan bi nasandin û balvedêriyê be weke virê.

742. **tewsîfiye**: pesindayîn, yanî yek bibe diyargîn ji yê dî re.

743. **el-'heywan en-natiq**: ew heywanê ku diaxive ango meriv, li vir "en-natiq" diyargîn e ji bo "el-'heywan" lê herdu bûne navek ji însan re.

744. **îsnad**: ev bêje wek bingeh bi maneya paldan û mildan e lê di rêzimana 'Erebî de ji bo wê hevgirtina navbera kirde û lêkerê yan jî ya navbera serwer û pêgirî tê gotin.

745. **te´bbete şerren**: wî şer da milê xwe, ew çû şer. Carekê hinek ji diya Sabit îbn Cabir pirsa wî dikin ew jî bi "te´ebbete şerren" bersiva wan dide; ji hingê û pêve ev jê re dibe wek nav (42). Lê eslê wê ji lêker, kirdeya veşartî û serveyî pêk hatiye.

746. **sûreten**: şeklî, dirûvî, berbiçav

di terkîban de rî'ayeta (747) sûretê dikin, e'rab dikin bi e'eraba me'hkiye. (748)
el-Curcanî: (749) îsmekî mufred î me'rîfe ye bi sebeb edatê te'rîfê. lefz merfû'(750) ref'e bi demm e bê weku sîfet e ji bo "eş-Şeyx" uwê (751); fa'ilê xwe tê de mustetir e racî'ê bi bal mewsûfî ve ye. Lewra (752) mensûbat (753) di 'hukmê muş teqqan da ne (754) di xwestina fa'ilî da (755). Caiz e ku mecrûr bixwînin bikin sîfet ji bo "'Ebd er-Re'hman".

Re'hmetullahî 'elyehî: (756) "re'hmetu" îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb îdafedana wê bi bal ma be'dê wê ve ku "Allah" e. Lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku mubteda ye.
"Allah" mudafu îleyhî ye. "'Ela"ê carr e (757) "ha" (758) me'helle mecrûrê pê ye, (759) car û mecrûr zerfê musteqerr mute'elliqê bi "'heselet" (760) yan bi "'hasîletun" (761) ve ye; me'helle merfû' ref'e bi demm e bê weku xeber e ji bo mubtedaî. Ev mubteda digel xeberê xwe cumlekî îsmî ye, îxbarî (762) ye sureten, înşaî ye (763) ma'nen (764) la me'helle leha mîn el-e'erabî; lewra mu'terîdî ye (765).

---

747. **rî'ayet**: li gor anîn, lêdêrîn,
748. **me'hkiye**: berê, gotî, qalkirî, bihûrî, yanî herçendî nav be jî dîsa em tewangeya wê wek berê, ku ne nav bû, hisab dikin.
749. **el-Curcanî**: yanî ji "Curcan" ê, navê cihê ku nivîskarê pirtûka Ewamilê "'Ebd ul-Qahir" lê çêbûye, ew dikeve jora Îranê, sala çêbûna wî ne kuş e lê di 1078 an de miriye. (43)
750. **lefz merfû'**: bilêvkirina bêjeyê bi nîşana kirdebariyê (dengdara u) ye.
751. **eş-Şeyx**: peyva "Şeyx" ku li pêş bihûrî
752. **lewra**: ev bersiva pirsekê ye, ma gelo ji navdêrê sade re kirde tê û ew tê veşartin?
753. **mensûbat**; piraniya "mensûb" e yanî cihnasdêr, navê cihwar
754. **di 'hukmê muşteqqan da ne**: ango ev cihnasdar e û ji xwe ew jî di warê xurdezadan de ne
755. **di xwestina fa'îlî de**: yanî ew jî mîna xurdezadan ji xwe re kirde ditewînin.
756. **Re'hmetullahî 'eleyhî**: mîhrîvaniya Yezdan li ser (lê) be.
757. **'elaê carr e**: yanî peyva pêşiya 'elyehî ku dibe "'ela" daçeka zêrger e.
758. **ha**: (o) ya dawiya "'eleyhî"
759. **me'helle mecrûrê pê ye**: ji bin ve "'ela"yê ew bi zêr (dengdara i, î) tewandiye.
760. **'heselet**: lêkera bûn ya dema raborî ji bo kesa sêyemîn.
761. **'hasîletun**: parenga çalak ya bûn ji bo kesa sêyemîn.
762. **îxbarî**: zargotinî, gotinwarî, gotinbarî, gotinî (îddî'a)
763. **înşaî**: daxwazî, daxwazwarî
764. **ma'nen**: bi wateyî, watemenî
765. **mu'terîdî ye**: navbergêr e, navberî/kî ye, ketiye nav du bêje yan hevokên bi hev ve girêdayî.

Mîetu 'amîlîn: "mîet" (766) îsmekî mufred e lefzen (767) mecmû'e ma'nen (768) bi sebeb delaleta wê li 'ededekî mu'eyyen; (769) muxesses (770) bûye bi sebeb îdafedana (771) wê bi bal ma be'dê xwe ve ku "'amîl"un e. Lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku xeber e ji bo "înnê". 'Amil di ref'a xeberî da lefzen 'amilê lefzî î sema'î ku "înne" ye. "înne" (772) digel îsm (773) û xeberê xwe (774) cumlekî îsmî ye me'helle meczûm (775) bê weku ceza uş-ş ert e (776) ji bo "mehma"ê. (777) "'Amil" îsmekî mufred î nekîre ye, lefz mecrûr cerre bi kesr e bê weku mudafu îleyhî ye we temyîz e (778) ji bo "mîet"unê. Lewra temyîza "mîet" û "elf"an (779) dê mufred û mecrûr (780) bit, ji sisiyan heta dehan (781) dê mecrûr û mecmû' (782) bit, ji dehan heta nehwît û nehan (783) dê mufred û mensûb (784) bit.
Naête temyîz kirin "wa'hid" û "îsnan" (785) bi sebeb îstîxna'a (786) temyîza wan ji wan, lewra tête gotin: "reculun(787) we reculanî"(788). Fi'luş-ş ert digel

---

766. mîet: sed
767. mufred e lefzen: berbiçav bêjeyeke tekane ye.
768. mecmû' e ma'nen: li gor wateya xwe pirane ye.
769. bi sebeb delaleta wê li 'ededekî mu'eyyen: yanî ji ber ku hejmareke kufşe ku sed e dide diyarkirin loma pirane ye.
770. muxesses: nemazebûyî, taybetbûyî
771. bi sebeb îdafedan: ji ber balvedayînê, balvedêriyê
772. înne: yanî peyvika "înne" ya lêkerbar ku li pêş di "fe înne el-'ewamîle" de bihûrî.
773. îsm: kirdeya navdêrî ku "el-'ewamîle" ye
774. xeberê xwe: yanî pêgirê xwe ku "mîetu 'amîlin" e.
775. me'helle meczûm: ji bin ve bi rawestek e, ango paşiya wê bê tîpa dengdar e.
776. ceza uş-şert: mercîxwaz, egerxwaz, bersiva mercê ye.
777. mehma: çi dema, çi gava, "mehma"ya ku bingeh e ji "emma"ya pêşiya" be'du" re.
778. temyîz: taybetgêr, nemazedar
779. mîet û elf: sed û hezar
780. mufred û mecrûr: tekane û bi zêr (dengdara i, î).
781. ji sisiyan heta dehan: yanî taybetgerîna sisiya û hevraztir heya bigihê dehan.
782. mecrûr û mecmû': bi zêr (dengdara i, î) û pirane.
783. dehan heta nehwît û nehan: ango ji dehan û hevraz heya bigihê not û nehan
784. mufred û mensûb: tekane û bi ziber (dengdara e) e.
785. Naête temyîz kirin wa'hid û îsnan: yanî taybetgêr ji hejmara yek û du re nayê
786. îstîxna: têrkirin, nepêwîstî, têrbûn, têrî, bêhewceyî
787. reculun: zilamek, mêrek
788. reculanî: du zilam, du mêr, yanî di şûna ku meriv bêje: "reculun wa'hîdun" têr dike ku meriv bêje "reculun" û di şûna ku meriv bêje "îsnanî reculanî" dîsa "reculanî" bi tenê bes e. Li vir nîvîskar dixwaze rewşa hejmarên Erebî û navdêrê pey wan bi awayê rêzimanî bide nasîn, ew jî, ji bilî yek û diduyan ku bi navdêrê pey xwe re nayên, dibin sê beşan de dicivin: 1. ji sisiya heyanî dehan e, navdêrê pey van timî bi dengdara i, î tê,

ceza´ ûş-şertê cumlekî şertî ye(789) îbtîdaî ye la me'helle leha mîn el-e'rabî, lî ma merre (790).

Lefziyetun (791) **we ma'newiyetun:** (792)
Tu bizan! Caîz e (di) "lefziyetun"ê de e'erabê selase: (793) emma ref'en (794) bê weku bibêjî "lefziyetun" (795) îsmekî mufred î nekîre ye, lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku bedel e ji bo "mîet"unê. Bedel ul-ba'd e ji ber kullê (796) ve bi mula'heza (797) teqdîma (798) rebtê (799) li 'etfê, (800) yan bedel el-kull e (801) ji ber kullê ve bi mula'heza teqdîma 'etfê li rebtê. (802) Yan xeber e ji bo mubtedaekî me'hzûf ku "hiye" (803) ye, yan "ba'duha" (804) ye bi şertê kespa (805) te´nîsê (806) ji mudafu îleyhiyê xwe bikit.

---

pirane ye û dibe taybetgêr ji bo wan.
2. ji yazdehan heyanînot û nehan e, navdêrê pey van jî dibe taybetgêr ji wan re û her bi dengdara " e" tê û tekane ye.
3. sed û hezar in ku navdêrê wan jî taybetgêr e û her bi dengdara "i,î" û tekane tê. (44)
789. cumlekî şertî ye: hevokekî mercî ye
790. lî ma merre: ji ber sedemê ku li pêş, di biwara netewngbariya hevokê destpêkî de, bihûrî.
791. lefziyetun: bi devikî, berbiçav
792. we ma'newiyetun: û wateyî, rêzimanî
793. e'erabê selase: sê cure / awayên tewangeyê, yanî bi sê awaya têtе xwendin: bi nîşana kirdebariyê, ya servebariyê û ya balvedêriyê.
794. emma ref'en: heçî cara ku bi nîşana kirdebariyê (dengdara u, un, yên din) be.
795. lefziyetun: li vir "un" nîşana kirdebariyê ye.
796. kull: tev, giş t, hemû
797. mula'heze: lênêrîn, hizirandin, fikirandin, hesibandin
798. teqdîm: bipêşxistin, lipêşhatin, bipêşketin, pêşniyar kirin, danenasîn
799. rebt: girêdan, hevgirtin, hevgirêdan
800. Bi mula'heza teqdîma rebtê li 'etfê: yanî ku em pevgirêdanê berî bi servedanê ve hisab bikin hingê dibe berguhêrê hinî ji ber giştî ve, çiku em pêşî wê dikin nasniyar ji "mîet" ê re ku beşek jê ye û hêja "me'newiyetun" didin bi ser ve ku hê dibe giş.
801. Bedel ul kull : berguhêrê giştî
802. bi mula'heza teqdîma 'etfê li rebtê: yanî ku em pêşî "me'newiyetun"ê bi ser "lefziyetun"ê ve bidin hê bi tewînin û bi hev ve girêdin hingê dibe berguhêrê giştî ji hemûyan re.
803. hiye: pronava kesa sêyemîn e, ango ew pîrek
804. ba'duha: peyva "ba'duha" ya jêketî, yanî hinek ji wan sed tewangeyan.
805. kesp: girtin, rahîştin, peydakirin, bidestxistin
806. te´nîs : mê, mêkanetî, yanî ji ber ku bêjeya "lefziyetun" mêkane ye divê serwer jî mê be încar eger bêjeya "ba'd" bi balvedêrê xwe ku "ha" ye bibe mêkane hingê "lefziyetun" kare bibe pêgir jî, nexwe çênabe.

Yan mebteda ye xeber muqedder û muqeddem e, (807) teqdîra kelamê (808) mînha lefziyetun (809).
Emma nesben (810) bê weku bibêjî "lefziyeten" îsmekî mufred î nekîre ye, lefz mensûb nesbe bi fet'h e bê weku 'halê ji fa'ilê carr û mecrûran e ku "fî en-ne'hwî" ye. (811) Yan ji demîra mustetir di "mîetun"ê de ye, (812) yan mef'ûl e ji bo fi'leke muqedder ku e'enî (813) ye li mezhebê Besriyan. Cumlekî mufessîre ye ji bo mîetunê la me'helle leha mîn el-e'rabî li nik Cumhûrî, yan me'helle merfû' li nik Şelûbînî, (814) lewra li nik wî cumleê mufessîre tab'ê (815) metbû'ê (816) xwe ye ku mufesser e (817).
Emma cerren (818) bê weku bibêjî "lefziyetîn", îsmekî mufred î nekîre ye. Lefz mecrûr bi cerra cîwarê, (819) teqdîr (820) merfû' yan mensûb lî î'htîmalatîn mezkûretîn (821) her wekî hatiye di Qur'anê da "we wede'nakum canîbe et-Tûrî el-eymenî" (822). Li kullê teqdîran (823) demîr tê de mustetir e eger dê ya'a nisbetê (824) bit; caîz e ku ya'a mesderiyetê (825) bit.

---

807. **muqeddem**: li pêş, lipêşhatî, bipêşketî
808. **teqdîra kelamê**: yanî esl û bingehê hevokê me
809. **mînha lefziyetun**: yê berbiçav ji wan sedan, li vir "lefziyetun" dibe serwer û pêgirê wê jî "mînha"ya nepenî ye.
810. **emma nesben**: ango heçî gava ku bi nîşana servebariyê bê xwendin.
811. **fî en- ne'hwî**: bêjeya "fî en-ne'hwî" ku li pêş bihûrî, yanî di rêzimanî de.
812. **mîetun de ye**: ew pironava ku di "mîetun"a bi wateya "me'dûdetun" de ye.
813. **e'enî**: ango, yanî, ez qest dikim, mebest pê
814. **Şelûbîn**: rêzimannasekî Ereban yê navdar e, li rûpelê 13 binêre!
815. **tabi'**: peyrew, yanî tewangeya wan mîna hev e.
816. **metbû'**: pêşrew, yê ku meriv dide pey rêça wî û xwe dişibihînê.
817. **mufesser**: yê ku tê şirovekirin, şirovekirî
818. **emma cerren**: yanî gava ku bi nîşana balvedêriyê (i, î) bê xwendin.
819. **cîwar**: cînar, yanî ji ber ku bêjeya cînar ku "'amîlîn" e bi zêr e ew jî dibe bi zêr (î, i)
820. **teqdîr**: nepenî, li vir bingeh, esil
821. **Lî î'htîmalatîn mezkûretîn**: yanî ji ber wan sedemên ku li pêş di biwara xwendina "lefziyetun"ê bi nîşana kirdebarî û servebariyê de, hatin gotin.
822. **We we'ednakum canîb et-Tûr îl-eymenî**: Ev ayeteke (riste) Quranê ye ku tê de Yezdan ji Mûsa Pêxember (A. S.= 'eleyhî es-Selam) û Benî îsraîliyan (cuhûyan) re dibêje: "me bi we re aliyê rastê yê çiyayê Tûr soz dabû. Li vir bêjeya "el-eymenî" dibe diyargîn ji "canîbe" re û gere bi dengdara "e" bihatina xwendin lê ji ber ku cînarê wê "et-Tûrî" bi dengdara "î" hatiye ew jî mîna wê bi "î" yê tê xwendin (45).
823. **li kullê teqdîran**: yanî çi bi awayê kirdebarî çi bi yê servebarî û çi jî bi yê balvedêriyê be bila bibe her pronav tê de veşartiye.
824. **nisbet**: wardiyarî, cihdiyarî, ew xurdepêşa "y"(ی) ku cih û bingehî diyar dike.
825. **mesderiyet**: yanî "ya"a raderî ku radertiya bêjeyê dide nîşandan.

"We me'newiyetun" 'etfa bi ser "lefziyetun"ê (ve) ye, terkîba wê mîslê (826) terkîba "lefziyetun"ê (827) ye re´sen bî re´sîn.
Fe el-lefziyetu mînha 'ela derbeynî: "fa"a (828) 'atîfe ye yan tefsîlî ye yan fesî'hî ye, mebniyê lefz el-fet'h e.
"El-lefziyetu" îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb edatê te'rîfê, lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku mubteda ye sûreten, sîfet e ji bo mubtedaekî me'hzûf (ku) "el-'ewamîl ul-lefziyetu"(829) ye 'heqîqeten. "mîn"ê (830) teb'îdiye (831) mebniyê lefz es-sukûn e.
"ha" îsmekî mufred î me'rîfe ye bi sebeb demariyetê; demîr e, bariz e, muttesil e, mebniyê lefz es-sukûn e eger "elîf" (832) esliye bit yan mebniyê lefz el-fet'h e eger "elîf" ji bo ferqê (833) bit.
Me'helle mecrûrê bi "min"ê cerre bi kesr e carr û mecrûr zerfê musteqerr mute'elliqê bi îsmufa'ilekî me'rîfe ve ye ku "el-'hasîletun" e. Me'helle merfû' ref'e bi demm e bê weku sîfet e ji bo "el-lefziyetu"wê. 'Amil di ref'a sîfetî da me'hellen 'amilê mewsûfî ye. Yan carr û mecrûr zerfê musteqerr mute'elliqê bi îsmufa'ilekî mensûb î nekîre ve ye. Yan fi'la madî medxûlê bi "qed"ê (834) me'helle mensûb bê weku 'halê ji fa'ilê wê (835) ye, eger dê "ya"a nisbetê bit yan ji nefsa wê bi xwe (836) ye eger "ya"a mesderyetê (837) bit. 'Amildi nesba 'halî da me'hellen 'amilê zû el-'halî ye.
"E la derbeynî"(838) "'ela"ê carr e mebniyê lefz es-sukûn e (839). "Derbeynî" îsmekî musenna î nekîre ye; lefz mecrûrê bi "'ela"ê cerre bi "ya"ê (840)

---

826. mîsl: weke, mîna, fena, layî
827. mislê terkîba lefziyetun: yanî wek awayê tewangeya "lefziyetun"ê ye.
828. fa: herfa "f" ya pêşiya "fe el-lefziyetu".
829. el-'ewamîl ul-lefziyetu: tewangdêrên berbiçav
830. min: yanî daçeka zêrger ya pêşiya "mînha" yê
831. teb'îdiye: dabeşî, hindeyî, cureyî
832. elîf: yanî tîpa dawiya "ha" (ﻫ)ê ji bingehê bêjeyê be.
833. ferq: cudahî, yanî ger tîpa "a" (ا) ya dawiya "ha" (ﻫ)ê ji bo cudahiya navbera mê û nêran be.
834. medxûlê bi qedê: ku daçeka "qed" li pêşiya wê be.
835. wê: yanî "el-lefziyetun"
836. ji nefsa wê bixwe: yanî yan rewşdarê kirdeyê wê ye yan jî rewşdarê wê bi xwe ye.
837. mesderiyet : ango gava herfa "y" (ﻱ) ê nîşana raderiyê be hingê rewşdêrê wê bi xwe ye.
838. 'ela derbeynî: li ser du beşa ye, dibe du beş.
839. 'elaê carr e mebniyê lefz es-sukûn e: yanî peyvika "'ela" daçeka zêrger î netewangbar e û bi rawestekê tê bilêvkirin bê weku di dawiya wê de tîpa dengdar nayê.
840. cerre bi "ya"ê: ango nîşana zêrbarî û xwdîbariya wê bi herfa "y" (ﻱ)ê ye. Ji xwe nivîskar di zurûfê de dabû zanîn ku nişana kirdebariyê di dualan de bî "à" (ا) û ya servebarî û balvedêriyê ji bi "y "(ﻱ)ê ye.

carr û mecrûr zerfê musteqerr mute'elliqê bi "'heseletun" (841) yan bi "'hasîletun"ê ve ye; me'helle merfû' ref'e bi demm e bê weku xeber e ji bo mubtedaî. "nûn" (842) 'îwed e (843) ji ber 'hereke we tenwînên di mufredî da. Ev mubteda´ digel xeberê xwe cumlekî îsmî ye 'etfa li ser cumleê îsmî yê muteqeddîme ve ye, eger dê "fa"a 'atîfe bit, (844) yan îbtîdaî ye eger dê "fa"a tefsîliye bit, (845) yan cewaba şertekî me'hzûf e (846) eger dê "fa"a fesîhiye bit (847).

Teqdîra kelamê: "îza înqesemet el-'ewamîlu îla lefziyetîn we me'newiyetîn (848) fe el-lefziyetu mînha 'ela ed-derbeynî" (849).

'îza" zerfek ji zurûfê zemanî ye, (850) mebniyê lefz es-sukûn e, me'helle mensûb nesbe bi teqdîra "fê" (851) bê weku mef'ûlu fîhî ye ji bo ceza uş - şertê li nik esse'hî.

"înqesemet (852) fi'la madî ye "ta" 'elametê te´nîsê ye (853), "el-'ewamîlu" (854) fa'ilê wê ye. "îla"ê carr e (855) "lefziyetîn" mecrûrê pê ye (856); "we me'newiyetîn" 'etfun 'ela "lefziyetîn" (857), carr û mecrûr zerfê lexw mete'elliqê bi "înqesemet" ve ye.

---

841. 'heselet-un: lêkera bûn, û çêbûn

842. nûn: tîpa "n" (ن) ya di "derbeyn" (ضربين) de.

843. îwed: cihgir, ji dêl ve, ji pêl ve

844. eger dê "fa" a 'atîfe bit: ango gava "f" ji bo gihanek be hingê bi ser hevokê pêşiya xwe ve tê dayîn, di ya çapkirî de di şûna bit de "bî" ye.

845. eger dê "fa" a tefsîliye bit: dema ku "f" ya rewankar û beyankar be, hingê dibe hevokê destpêkî.

846. cewaba şertekî me'hzûf: mercîxwazek e ji bo daçeka mercê ya nexwanê.

847. eger dê "fa"a fesî'hiye bit: yanî ger "f'a me ji bo rewanbêjî û petîdariyê bit hingê dibe merc'xwaz.

848. îza înqesemet el-'ewamîlu îla lefziyetîn we me'newiyetîn: gava tewangdêr bi bal berbiçavî û rêzimanî ve bêne dabeşkirin.

849. fe el-lefziyetu mînha 'ela derbeynî: ji nav wan herdu beşan yên berbiçav jî dibin du par.

850. zerfek ji zurûfê zemanî ye: yek ji hokerên demkî (demî) ye.

851. teqdîra "fê": daçeka "f" (ف) ya nepenî nîşana servebariya hokeran e.

852. înqesemet: dabeşbû, parevebû

853. 'ta"'elametê te´nîsê ye: paşdaçeka "t" (ت) ya paşiya "înqesemet" (أنقسمت) nîşana mêyiyê (mêkane) ye.

854. el-'ewamîlu: piraneya 'amil e yanî tewangdêr.

855. îlaê carr e: yanî peyvika "îla", ya di "îla lefziyetîn" de, daçeka zêrger e.

856. lefziyetîn mecrûrê pê ye: yanî bêjeya "lefziyetîn" pê hatiye bi zêr kirin.

857. 'etfun 'ela lefziyetîn: yanî bêjeya "me'newiyetîn" jî bi zêr e çiku ew jî bi ser bêjeya "lefziyetîn" ve tê dayîn, yanî digihîje wê û bi "îla"ê bi zêr dibe.

Ev "înqesemet" digel ma 'emîle fîhiyê (858) xwe cumlekî fi'lî ye bê weku fi'l uş-şert e ji bo "îza"ê. Hem di te'wîla mesderî da (859) me'helle mecrûr cerre bi kesr e bê weku mudafu îleyhî ye ji bo "îza"ê.
Weha reng e 'hukmê (860) cumleê weku waqi' bibit (861) di pey "îz" (862) we "îza" (863) we "'heysu" (864) we "'heysuma" (865) we "beyne"(866) we "beynema"(867). Hem di pey "lemma"ê (868) şertiye li nik Ebû 'Eliyê Farisî. Fi'l uş-şert digel ceza uş-şertê cumlekî şertî ye, îbtîdaî ye (869) la me'helle leha mîn el-e'erabî.

Sema'iyetun we qiyasiyetun:

Tu bizan! Terkîba(870) "sema'iyetun we qiyasiyetun" mîslê terkîba "lefziyetun we me'newiyetun" e re'sen bî re'sîn. Caîz e ku xeberê be'de xeber bit (871) ji bo "fe el-lefziyetu" lakîn racî'h bedel e(872) ji bo "'ela ed-derbeynî", lewra esl (873) di kelaman da 'edem (874) teqdîr e (875)

Fe es-sema'iyetu mînha e'hedun we tîsû'ne 'amîlen: (876)

Tu bizan! Terkîba "fe es-sema'iyetu mînha" mîslê terkîba "fe el-lefziyetu mînha" ye re'sen bî re'sîn (877).

---

858. **ma 'emîle fîhî**: yanî peyvên ku lêkera "înqesemet" wan tewandiye.
859. **te'wîla mesderî da**: ango dikeve cihê raderî û dibe wek navdarê xwerû.
860. **'hukm**: bandorî, te'sîr, li vir rewşa tewangehî.
861. **waqi' bibit**: bikeve, bê, bibe
862. **îz** : (إذ) dema, wextê
863. **we îza** : û îza (إذا) gava, dema, wextê
864. **we 'heysu**: û 'heysu (حيث) li kû, li kuderê, li kurê
865. **'heysuma**: (حيثما) li kû, li kur, li kuderê
866. **beyne**: (بين) navber, navberîka, dema, gava.
867. **beynema**: (بينما) navbera, dema, gava, qala van di rûpelê 63'an de bihûrî.
868. **lemma**: çi gava, dema, wextê. Ev her heftên han hokerê mercî ne; ji ber ku rewşa wan li pêş bihûrî pêwîst nake em li vir zêde li ser wan rawestin.
869. **cumlekî şertî ye, îbtîdaî ye**: hevokekî mercî û yê destpêkî ye.
870. **terkîb**: hevdudanî li vir tewange.
871. **xeberê be'de xeber** : piştî "'ela ed-derbeynî" dibe pêgirê duyemîn ji bo "fe el-lefziyetu".
872. **racî'h bedel e**: ango ya qenctir ew e ku bibe nasniyar ji "'ela derbeynî" re
873. **esl**: binyat. bingeh.
874. **'edem**: nebûn, nekirin, bê, ne, tune.
875. **Lewra esil di kelaman da 'edem teqdîr e**: çiku bingeh di hevok û gotinan de ew e ku tiştek ji wan nepenî nebe û tewangeya wan jî li gor peyvên heyî bête diyar kirin.
876. **fe es-sema'iyetu mînha e'hedun we tîs'ûne 'amîlen**: heçîka tewangdêrên bihîstî, ji wan her sed tewangêran, not û yek heb in.
877. **mîslê terkîba fe el-lefziyetu ye re'sen bî re'sîn**: yanî tewangeya "fe es-sema'iyetu" eynî mîna ya "fe el-sefziyetu" ye bê guhertin; ji ber ku li pêş tewangeya"el-lefziyetu" bihûrî pêwîst nake li vir bê dubare kirin.

"E'hedun" (878) îsmekî mufred î nekîre ye, lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku xeber e ji bo mubtedaî bi mula'heza teqdîma 'etfê li rebtê. (879)

"Waw"a 'atîfe mebniyê lefz el-fet'h e. "Tîs'ûne" (880) îsmekî şubhê (881) cem'ê î nekîre ye, lefz merfû' ref'e bi wawê bê weku 'etfa li ser "e'hedun" ve ye. 'Amil di ref'a me'tûfî da lefzen 'amilê me'tûfu 'eleyhî ye. Lewra dibêjinê şubhê cem'ê bi sebeb muşabeheta (882) wê bi cem'a muzekkerê salim (883) ve sûreten. (884) Ne cem' e bi sebeb delaleta wê li 'ededekî mu'eyyen (885) bi xîlaf cem'an. (886) "Amîlen" îsmekî mufred î nekîre ye, lefz mensûb nesbe bi fet'h e bê weku temyîz e ji bo "e'hedun we tîs'ûne"(887).
'Amil di nesba temyîzê da lefzen 'amilê mumeyyezî ye, (888) yan nefsa wî bi xwe ye (889).
we el-qiyasiyetu mînha seb'etu 'ewamîle:
Tu bizan! Terkîba "we el-qiyasiyetu mînha"ê (890) mîslê terkîba "fe es-sema'iyetu mînha"ê ye (891).

---

878. **e'hed/un**: yek
879. **rebt**: girêdan, hevgirêdan
879. **bi mula'heza teqdîma 'etfê li rebtê**: hingê dibe pêgir gava pêşî "tîs'ûne" bi ser "e'hedun" ve bê dayîn, piştre bi hev ve bêne girêdin û bi hev re bibin pêgir ji "es-sema'iyetu" re.
880. **tîs'ûne**: not, nehwît, nod
881. **şubh**: mîna, weke, fena, layî.
882. **muşabehet**: mîna hev bûn, layî yek bûn, şibandin, mînandin.
883. **cem'a muzekkerê salim**: peraneya nêr î tekûz, ango neşikestî.
884. **sûreten**: berbiçav, bi şikl, yanî şiklê wê mîna ye piraneya nêr î tekûz.
885. **delalet**: dixwedegirtin, danezanîn, îzbatkirin, diyarkirin
885. **'eded**: hejmar
885. **mu'eyyen**: kufşe
885. **ne cem' e bi sebeb delaleta wê li 'ededekî mu'eyyen**: yanî ji ber ku "tîs'ûne" hejmareke kufşe di xwe de digre nabe pirane lê dîdara wê mîna pirane ye.
886. **bi xîlaf cem'an**: ango pirane hejmareke kufşe nîşannadin.
887 **temyîz e ji bo e'hedun we tîs'ûne**: yanî "e'hedun we tîs'ûne" kufşe dike û digerîne bi taybetî, bê weku bêje "not û neh tewangêr".
888. **mumeyyez**: yê ku tê taybetkirin, taybetgerandî, nemazedarbûyî, ango tewangêrê "'amîlen" yê "e'hedun we tîs'ûne" ye.
889. **nefsa wî bi xwe**: nefsa taybetgerandî, yanî tewangêr "ehdun we tîs'ûne" bi xwe ye.
890. **terkîba we el-qiyasiyetu mînha**: rewşa tewangeya hevokê "we el-qiyasiyetu mînha".
891. **mîslê terkîba fe es-sema'iyetu mînha ê ye**: ango weke rewşa tewangeya "es-sema'iyetu mînha" ye. Ji xwe şirovekar li pêş gotibû: " ya wê jî mîna ya 'fe el-lefziyetu" ye ku li pêş bi firehî bihûrî.

"Seb'etun" (892) îsmekî mufred î nekîre ye, muxesses e (893) bi sebeb îdafedana wê bi bal ma be'dê xwe ve ku 'ewamîle ye. (894) Lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku xeber e ji bo mubtedaî.
"'Ewamîle" îsmekî mecmû' î nekîre ye lefz mecrûr cerre bi feth e bê weku mudafu îleyhî ye we temyîz e ji bo seb'etuwê (895). Lewra dibêjinê cerre bi fet'h e çiku xeyrê munserif e (896) bi sebeb sîxa muntehaê cumû'an, (897) cerre û tenwîn daxilî ser nabin (898) îlla (899) linik "elîf laman" yan bi îdafê wekî niha "merertu bî el-e'hmerî" (900) we "bî E'hmedî kum" (901) dibêjî.

Tu bizan! Sîxa (902) muntehaê cumû'an jî heft in: mefa'îlu,(903) mefa'îilu,(904) fe'alîlu (905), fe'alîilu (906), fewa'îlu (907), efa'îlu (908), efa'îilu(909). Ev mubteda digel xeberê xwe cumlekî îsmî ye 'etfa bi ser cumleê îsmiyê muteqeddîme ve ye, la me'helle leha mîn el-e'erabî.

---

892. **seb'etun**: heft, heft heb in.
893. **muxesses**: taybetbûyî ye lê binavkirî nîne çiku nasdêrê wê nebinavkirî ye.
894. **'ewamîle**: piraneya "'amil" e, yanî tewangêr.
895. **seb'etuwê**: peyva seb'etu ku bi wateya heft e, di çapek din de "seb'etu yê" ye.
896. **xeyrê munserif**: netewînbar (diptotes)
896. **lewra dibêjinê cerre bi fet'h e çiku xeyrê munserif e**: nivîskar wek ku ji xwendevanan pirsek bê hesab dike û bi xwe jî bersiva wê dide. Gelo çima hate gotin: "cerre bi fet'h e" digel ku eslê cerrê gere bi kesrê be? Wî bersiv da: "belê lê ev "ewamile', ji ber ku piraneya piraneyê ye loma jî dibe netewînbar (diptotes) û ji xwe ew jî bi zêr (dengdara "î, i") û bi tenwînê (en, în, un: ٍ ,ٍ) nayê".
897. **sîxa muntehaê cumû'an**: piraneya piraneyê, piraneya duyemîn ji bo piraneya şikestî
898. **daxilî ser nabin**: yanî pê re nayên, nakevin ser.
899. **îlla**: bil, ji blî, xeyn, xeynî.
900. **merertu bî el-e'hmerî**: ez di ber sor de bihûrîm, li vir zêr bi sedem "el-"ê hatiye digel ku netewînbar e jî.
901. **we bî E'hmedî kum**: û ez di ber Ehmedê we de jî bihûrîm, li vir jî "E'hmed"bi bal pronava "kum" ve hatiye dayîn ku loma bûye "E'hmedî".
902. **sîxa**: kêşa, kêşana, qalibê, di çapek din de "sîxê" ye yanî sîxên, sîxeyên.
903. **mefa'îlu**: (مفاعل = مساجد) mesacid piraneya mescid e, yanî mizgeft, camî.
904. **mefa'îilu**: (مفعيل = مصابيح) mesabî'h piraneya mîsba'h e yanî çira, qendîl, lembe.
905. **fe'alîlu**: (فعالل = دراهم) derahîm piraneya dîrhem e, yanî dirav, pere.
906. **fe'alîlu**: (فعاليل = دنانير) denanîr piraneya dînar e, yanî zêrê bi sikke, sîke.
907. **fewa'îlu**: (فوعل = كواثب) kewaîb piraneya kelb e, anî xemgîn.
908. **efa'îlu**: (أفاعل = أكالب) ekalîb piraneya kelb e, yanî kûçik, heywanê goştxwer
909. **efa'îilu**: (أفاعيل = أناعيم) "ena'îm" piraneya "ne'em" e,yanî deve, mî, yan jî dewar (baqorî). (46)

We el-me'newiyetu mînha 'ededanî: (910) "waw"a 'atîfe (911) mebniyê lefz el-fet'h e. (912)
"El-me'newiyetu" îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb edatê te'rîfê, lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku mubteda ye.
"Mînha" (913) carr û mecrûr zerfê musteqerr mute'elliqê bi îsmufa'ilekî me'hzûf ve ye ku el-'hasîletun e. Me'helle merfû' ref'e bi demm e bê weku sîfet e ji bo mubtedaî. Yan mute'elliqê bi "qed 'heselet" (914) ve ye yan bi 'hasîletunê ve ye bê weku 'hal e ji bo mubtedaî.
"'Ededanî" (915) îsmekî musenna (916) î nekîre ye, lefz merfû' ref'e bi "elîf"ê(917) bê weku xeber e ji bo mubtedaî.
"Nûn" (918) 'îwed e ji ber 'hereke we tenwînê di mufredî da. Ev mubteda´ digel xeberê xwe cumlekî îsmî ye 'etfa bi ser cumleê îsmiyê muteqeddîme ve ye (919) la me'helle leha mîn el-e'erabî.
Tu bizan! Demîra "fe el-lefziyetu mînha (920) we el-me'enewiyetu mînha"ê (921) raci'ê bi bal "mîetun"ê ve ye (922); derer nakit tefkîka (923) demîrê di sanî da(924), bi sebeb wucûda qerînê (925).
Emma demîra "fe es-sema'iyetu mînha we el-qiyasiyetu mînha"ê (926) raci'ê

---

910. **We el-me'newiyetu mînha 'ededanî:** û tawangdêrên wateyî ji nav wan gişan du heb in.
911. **wawa 'atîfe:** herfa "w" (و) ji bo gihanek e, di ya çapkirî de "wawa 'atîfe ye" ye.
912. **mebniyê lefz el-fet'h e:** netewangbar e û dengdara "e" distîne, anî dibe "we".
913. **mînha:** jê, ji wan, ji nav wan
914. **qed 'heselet:** lêkera bûn tevî pêşdaçeka "qed" yanî bêguman çêbûye, eseyî çêbûye.
915. **'ededanî:** du heb, du kes, dido
916. **musenna´:** dual, cotane
917. **ref'e bi elîfê:** yanî nîşana kirdebariya wê "elîf" dengdara dirêj "à", ye.
918. **nûn:** yanî "n" (ن) ya di dawiya "'ededanî" (عددان) de.
919. **cumleê îsmî yê muteqeddîme:** yanî hevokê navdêrî yê bihûrî ku "el-qiyasiyetu" ye.
920. **fe el-lefziyetu mînha:** heçîka tewangdêrên berbiçav ji wan sedan.
921. **we el-me'enewiyetu mînha:** û yên rêzimanî ji wan her sedan, ango mebest bi "ha" ya di "mînha" de sed e.
922. **raci'ê bi bal mîetunê ve ye:** yanî mebest bi "ha"a herdu "mînha"yan jî "mîetun" e.
923. **tefkîk:** cudabûn, veqetandin, bê weku bêjeyeke din têkeve nav wan.
924. **derer nakit tefkîka demîrê di sanî de:** ev weke bersiva pirsekê ye, " ma gelo cudabûna "ha"ya "we el-me'enwiyetu mînha" bi "fe el-lefziyetu" zirarekî nade hevokî?"
925. **wucûd:** hebûn, peydabûn
925. **qerîne:** durûv, nîşan, nêzîkayî, têkilî, lêhatin
925. **bi sebeb wucûda qerînê:** ev bersiva nivîskar e, wî bi xwe li jor pirskir û vê bersivê jî da "na tişt nabe çiku qerîne heye", yanî nîşaneke ku wê mebestê dide zanîn heye.
926. **emma demîra fe es-sema'iyetu mînha. . t. d.:** bes pironava "ha"ê ya di "fe es-sema'iyetu mînha", tewangêrên bihîstî, "we el-qiyasiyetu mînha", yên pîvanber, de.

bi bal "lefzîeytun" ê ve ye, (927) yan bi bal "mîetun" ê ve ye (928) lakîn ê berê çêtir e (929) bi sebeb qa'îda (930) weku "îza dare ed-demîru beyne el-qerîbî we el-be'îdî(931) fe el-qerîbu ewla mîn el-be'îdî" (932).

We tetenewwe'û es-sema'iyetu mînha selasete 'eşere new'en: (933) "waw" a 'atîfe mebniyê lefz el-fet'h e.
"Tetenewwe'û" (934) 'amilê lefzî î qiyasî fi'la mudarî' mebnî ye ji bo fa'ilê (935) mewdû' e ji bo we'hdeta mu'ennesê xaîbe (936) di 'haletê ref'ê da. Lefz merfû' ref'e bi demm e 'amil di ref'a wê da lefzen 'amilê mezkûrî ye.
"Es-sema'iyetu" îsmekî mufred î me'rîfe ye bi sebeb edatê te'rîfê lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku fa'il e ji bo "tetenewwe'û" yê.
"Mînha"(937) carr û mecrûr zerfê musteqerr mute'elliqê bi îsmufa'ilekî me'rîfe ve ye ku "el-hasîletun" e bê weku sîfet e ji bo "es-sema'iyetu" yê (938).

---

927. raci'ê bi bal lefziyetunê ve ye: mebest bi "ha" a "mînha" ya wan lefziyetun e, yanî tewangdêrên bihîstî û pîvanber ji wanên berbiçav ...
928. yan bi bal mîetun ve ye: yanî hem çêdibe ku mebest pê "lefziyetun" be û dibe ku armanc pê "mîetun" bi xwe be jî.
929. lakîn ê berê çêtir e: yanî ku girêdayê bi "lefziyetun" ve be wê çêtir be.
930. qaîda: di çapekê de "qaîdê" ye; xuyaye ku ew rasttir e lê ya herî rast ew bû ku bigotina: "qaîdeyê weku".
931. îza: gava, dema, wextê.
931. dare: bigere, bibe, têkeve,
931. ed- demîru: pronav, cihnav
931. beyne: navbera, navbeyna
931. qerîb: nêzîk, berdest.
931. be'îd: dûr, dûredest
931. îza dare ed-demîru byen el-qerîbî we el-be'îdî: gava pronav têkeve nav bêjeyeke nêzîk û yeke dûr [ku dibe herdu jî bên qest kirin]
932. fe el-qerîbu ewla mîn el-be'îdî: (girtina, bêje)ya nêzîk çêtir e ji ya dûr.
933. We tetenewwe'û es-sema'iyetu mînha selasete 'eşere new'en: Yên bihîstî ji wan tewangdêrên berbiçav dibin sêzdeh beş.
934. tetenewwe'û: dabeş dibin, beş dibin, parêvedibin
935. mebnî ye ji bo fa'ilê: ango lebatî ye
936. Wehdet: tekane (mê)
936. mu'ennes: mê, mêkanê
936. xaîbe: nehazir, ne li civatê (mê)
936. we'hdeta mu'ennesê xaîbe: kesa sêyemîn
937. mînha: ji daçeka zêrger "mîn" û pironava "ha" pêkhatiye, yanî ji wan, jê.
938. es-sema'iyetuyê: di çapekê de "es-sema'iyetuwê" ye.

Yan mute'elliqê bi qed 'heselet ve ye yan bi 'hasîletunê ve ye bê weku 'hal e ji bo "es-sema'iyetu"yê.

"Selasete'eşere" (939) terkîbeke te'dadî ye (940) tedemmunî ye (941) herdu cuz´(942) mebniyê lefz el-fet'h e, (943) her wekî exewatê (944) xwe bi xeyr ji "îsna 'eşere"(945), cuz´ê ewwil(946) bi sebeb tewessutê(947), cuz´ê sanî(948) bi sebeb tedemmuna 'herfa 'etfê (949) bi sebeb teserrufa wê di wî da; (950) me'helle mensûb nesbe bi ref'a xafidê (951) ku "'ela" (952) ye. Lewra wekî 'herfa carre bête 'hezifkirin (953) mecrûr muxeyyer dibit bi nesbê(954) da weku texyîr (955) dîlaletî li 'halê wê bikit(956). Carna baqî dimînit (957) li ser eslê xwe wekî niha "lahe ebûke" (958) dibêjî.

---

939. **selasete 'eşere**: sêzdeh, deh û sisê.
940. **te'dadî**: hejmarî, jimartin, jimarî.
940. **terkîba te'dadî**: hevdudanî ye û dibe hokera jimarî
941. **tedemmunî**: binvegirtî, nixumî, sergirtî
942. **cuz´**: beş, par, perçe, şeq, felq.
943. **mebniyê lefz el-fet'h e**: herdu beş (selase û 'eşere) jî netewangbar in û bi ziberê (dengdara "e") tên bilêvkirin.
944. **exewat**: piraniya "uxt" e yanî xwuşk.
945. **îsna 'eşere**: duwazdeh, dozdeh, ango beşa pêşî ji vê ku "îsna" ye tewangbar e.
946. **cuz´ê ewwil**: beşa pêşî ku "selasete" ye.
947. **bi sebeb tewessutê**: ji ber navberîkiyê, yanî tev fena bêjeyekê tê hisabê ku loma jî dawiya wê, mîna herfa nîvê bêjeyê, netewangbar e.
948. **cuz´ê sanî**: beşa duyemîn, şeqê diduwa ku "'eşere" ye.
949. **bi sebeb tedemmuna 'herfa 'etfê**: ji ber ku "'eşere" di xwe de gihanekê digre gihanek jî netewangbar e nexwe ew jî dê bibe netewangbar.
950. **bi sebeb teserrufa wê di wî da**: yanî rewşa hevdudanê jimarî mîna ye ya wan bêjeyên ku bi gihanekê bi hev ve girêdayî ne.
951. **xafid**: daçeka zêrger.
952. **'ela**: li ser, li jor
953. **'hezifkirin**: jêbirin, jêxistin, yanî ne li berçav be.
954. **muxeyyer**: guhartî, guherandî
954. **muxeyyer dibit**: tê guhertin, tê guherandin.
954. **mecrûr muxeyyer dibit bi nesbê**: bêjeya me ya bi zêr (dengdara kurt "i") bi nîşana servebariyê tê guhertin, yanî dibe bi ziber (dengdara "e").
955. **texyîr**: guhertin, guhirandin.
956. **dîlalet**: danezanîn, îzbatkirin, diyarkirin, dixwedegirtin
956. **dîlaletî li 'halê wê bikit**: yanî rewşa wê diyarbike û bide zanîn.
957. **Baqî**: mayî.
957. **baqî dimînit** yanî naçe, li ber çav dimîne.
958. **lahe ebûke**: eslê wê "lillahî ebûke" ye yanî bi Xwedê bavê te ye; li vir daçeka zêrger, "l" (ل), jê çûye jî lê dîsa lahî bi zêr (dengdara "i") maye.

Carr û mecrûr zerfê lexw mute'elliqê bi tetenewwe'û ve ye; mecrûr bi tenê me'helle mensûb bê weku mef'ûlu bîhiyê xeyrê serî'h e ji bo tetenewwe'ûyê. Yan mute'elliqê bi îsmufa'ilekî nekîre ve ye, me'helle mensûb bê weku mef'ûlu mutleq e (959) ji bo tetenewwe'ûyê mecazen; (960) sîfet e ji bo mef'ûlu mutleqê 'heqîqiyê me'hzûf ku "tenewwu'en" (961) we "înqîsamen" e (962).
"new'en" (963) îsmekî mufred î nekîre ye lefz mensûb nesbe bi fet'h e bê weku temyîz e ji bo "selasete 'eşere"(964); 'amil di nesba temyîzê da lefzen 'amilê mezkûrî ye (965). Ev fi'l digel ma 'emîle fîhiyê xwe (966) cumlekî fi'lî ye 'etfa bi ser cumleê îsmiyê muteqeddîme ve ye, yan îbtîdaî ye (967) la me'helle leha mîn el-e'erabî (968).

En-new 'ul-ewwelu: (969) "en-new'û" îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb edatê te'erîfê; lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku mubteda ye."El-ewwelu" li wezna (970) "ef'elu"(971) eger dê "ef'el ut-tefdîl" bit (972), yan li wezna "few'elu" (973) eger dê "sîfet ul-muşebbeh" bit(974).

---

959. mef'ûlu mutleq: serveyê eseyî, serveyê serbest
960. mecazen: bi mînandî, bi mînahî
961. tenewwu'en: bi beş darî, bi parîtî, yanî serveyê serbest yê rasteqînî evê han e, çiku serveyê eseyî divê yan berbiçav û bi wateyî tev wek "tenewwu'en yan jî bi wateyî tenê, wek "înqîsamen" mîna lêkera xwe be.
962. înqîsamen: bi beşkirin, bi parîtî, bi beşdarî, ev nimûne ye ji bo serveyê eseyî ku wate eynî ya lêkerê ye lê bêje cuda ye, çiku "tenewwu'" û "înqîsam" yek maneyekê didin.
963. new'en: beş, par, pişk, tar.
964. selasete 'eşere: yanî taybetgêrê bêjeya "selasete 'eşere" (sêzdeh) ye.
965. mezkûr: yanî tewangdêrê wê yê "selasete 'eşere" bi xwe ye ku li pêş bihûrî.
966. ma 'emîle fîhî: bêjeyên ku ew lêker wan ditewîne.
967. îbtîdaî: destpêkî
968. **la me'helle leha mîn el-e'erabî**: nayê tewandin, netewangbar e, riya tewangeyê tê de nîne.
969. En-new'u: beş, par, babet.
969. el-ewwelu: yekemîn, pêşî, yekem.
969. en-new'u el-ewwelu: beşa yekemîn, beşa pêşî.
970. wezn: kêş, pîvan.
971. ef'elu (أفعل), ev kêşa kemper (bêhtirkir) e.
972. eger dê ef'el ut-tefdîl bit: ger ku "ewwelu" kemper be hingê li kêşa "ef'elu (أفعل) ye.
973. few'elu: (فوعل), ev kêşa rengdêrî ye (rengdêrê wesfîn e).
974. eger dê sîfet ul-muşebbeh bit: ango dema "ewwelu" rengdêr be hingê li kêşa few'elu (فَوْعَل) ye.

Muşteqqê ji "wewele" ye li nik esse'hî (975), yan ji " ewwele" ye yan jî ji "we'ele" ye li nik ba'dê (976). Lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku sîfet e ji bo mubtedaî.

'Hurûfun (977) cem'ukisre ye (978) nekîre ye, mukesserê ji 'herf/unê (979) ye her wekî fulûsun ji felsê (980). Lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku xeber e ji bo mubtedaî. Ev mubteda' digel xeberê xwe cumlekî îsmiye îbtîdaî ye la me'helle leha mîn el-e'erabî.
Tu bizan! Cem' jî li du qisman (981) e: muse'h'he'h e (982) ku bîna'a wa'hidê tê de neşikestiye(983); ji qebîla sîfetê carî 'ela xeyrî men hiye lehu (984). Ew jî ji bo muzekkeran e (985) yan ji bo mu'ennesan e (986),

---

975. **wewele li nik esse'hî**: dîtana eseyî û rasttir ew e ku bêjeya "ewwel" ji "wewel"ê hatibe afirandin.
976. **yan ewwele yan jî ji we'ele ye li nik be'dê**: yanî li gor hin dîtinan jî ew ji yek ji vanên han hatiye afirandin.
977. **'hurûf**: piraneya 'herf e
978. **cem'ukisre**: di rêzimana Erebî de, li gor hejmara xwe, du cure pirane hene:
1 "cem'u qille", piraneya hindik, ku ji sisiya heyanî dehan ye,
2 "cem'u kîsre", piraneya xilbe ye ku ji dehan û hevraztir e. (47)
979. **mukesser**: şikestî, bê weku ne li gor qaîde hatibe, di Erebî de piraneya tekûz heye ku ji bo nêra "ûn, în" (ين،ون) û ji bo mêya jî "àt" (آت) digihê paşiya wê û ya şikestî heye ku di bêjeyê bi xwe de guhertin çêdibe mîna vêderê. (48)
979. **mukesserê ji 'herf/unê ye**: yanî ji bo piraneyê guhertin di "'herf" de çêbûye bûye "'hurûf"
980. **fulûs ji felsê yanî** mîna "fulus" ku piraneya "fels" e, yanî qurûş
981. **qism**: beş, par, pişk
982. **muse'h'he'h**: tekûz, rast, durust, li qaîde
983. **bîna'**: avayî, binyat, bingeh
983. **wa'hid**: tekane, yekere, tek
983. **bîna'a wa'hidê tê da neşikestiye**: ango piraneya tekûz ewa ku guhertin nakeve binyata tekaneya wê û bi tenê bi lêzêdekirina hin tîpan çêdibe.
984. **carî**: herek, çûyî, herikî, li vir hatî
984. **'ela**: li ser
984. **men**: kesê, ewê
984. **hiye**: ew, ji bo mêkane û tiştan
984. **lehu**: jê re, ji bo wî, ji wî re
984. **sîfetê carî 'ela xeyrî men hiye lehu**: yanî ew diyargîn e ji bo kesê ku ew eseyî ne jê re ye, ango di şûna ku yek bêje tekaneyê tekûz dibêje piraneya tekûz lê esil yê ku tekûz dimîne tekane bi xwe ye.
985. **muzekkeran**: ji bo nêran, yanî piraneya tekûz î nêr
986. **muennesan**: ji bo mêyan, yanî piraneya tekûz î mê

ewwel (987) dê bi "waw" û "nûn"an bit (988) di 'haletê ref'ê de (989) bi "ya" û "nûn"an bit (990) di 'haletê nesb û cerrê de (991). Sanî (992) dê bi "elîf" û "tê" bit (993) mutleqen (994), merfû' bit bi demme (995) mensûb û mecrûr bit bi kesre (996); hem "salim" (997) jî dibêjinê.
Yan cem'a mukesser e (998) ku bîna'a wa'hidê tê de şikestiye (999) wekî niha "rîcalun" (1000) we "ezmanun" (1001) dibêjî di sulasî da (1002), "derahîmun (1003) we "qeratîsun" (1004) dibêjî di ruba'î da (1005).
Cem'a muse'h'he'h mutleqa (1006) hem çar wezn (1007) ji cem'a mukesser jî ku "ef'elu" (1008) we "îf'elu" (1009), ef'elet (1010), fi'letu" (1011) cem'u qille (1012)

---

987. ewwel: pêşî, yekemîn, mebest pê piraneya tekûz î nêr e
988. dê bi "waw" û "nûn"an bit: di zimanê Erebî de gava piraneya tekûz î nêr kirdebar be, hingê (ون = ûn) bi dawiya tekaneyê ve dizeliqe; mîna "muslîmûne" (مسلمون). (49)
989. di 'haletê ref'ê de: yanî gava kirdebar be çawa li jor jî hat gotin.
990. Bi "ya" û "nûn"an bit: yan wê piraneya tekûz î nêr bi "y" û "n" (ين) ê bê gava ku servebar û xwedîbar be, mîna "muslimîne" (مسلمين). (49)
991. di 'haletê nesb û cerrê de: yanî gava xwedîbar û servebar be.
992. sanî: duyemîn, mebest pê piraneya tekûz î mê ye.
993. dê bi "elîf" û "tê" bit: di zimanê Erebî de piraneya tekûz î mê jî "á" û "t" (آت) tê paşiya tekaneyî, mîna "muslîmat" (مسلمات). (49)
994. mutleqen: çi kirdebar be çi servebar be û çi jî xwedîbar be her "at" (آت) e.
995. merfû' bit bi demme: yanî wê her "at" bit lê gava ew piraneya me kirdebar be wê bi pêşbe, mîna "muslîmatun" (مسلمات). (49)
996. mensûb û mecrûr bit bi kesre: lê gava servebar yan xwedîbar be hingê wê bi zêr be, weki niha "muslîmatîn" (مسلمات). (49)
997. salim: tekûz, sax, nejar, ev jî navekî piraneya tekûz e.
998. cem'a mukesser: piraneya şikestî, ya ne li qaîde.
999. bîna'a wa'hidî tê de şikestiye: yanî ew piraneya ku bingeha tekaneyê wê hatibe guhertin.
1000. rîcalun: ango mîna "rîcal" ku piraneya "recul" e yanî zilam, mêr.
1001. **ezmanun:** mîna "ezman" ku piraneya "zeman" e yanî dem, wext, heyam.
1002. sulasî: sêtîpî, mebest pê ew navdêrê ku sê tîpên wî yên bêdeng hebin.
1003. derahîmun: mîna "derahîm" ku piraneya "dîrhem"ê ye yanî dirav, pere.
1004. qeratîsun: mîna "qeratîs" ku piraneya "qîrtas" e, yanî kaxiz.
1005. ruba'î: çarherfî mebest pê ew navdêrê ku çar herfên wî yên bêdeng hebin.
1006. cem'a muse'h'he'h mutleqa: yanî piraneya tekûz çi mê çi nêr.
1007. wezn: kêş, berkêş.
1008. ef'elu: yanî ew piraneya ku tê ber kêşa "ef'elu" (أفعل)
1009. îf'elu: piraneya ku tê ber kêşa "îf'elu" (إفعل)
1010. ef'elet: piraneya ku tê ber kêşa "ef'elet" (أفعلت)
1011. fi'letu: piraneya ku tê ber kêşa "fi'letu" (فعلت)
1012. cem'u qille: piraneya hindik, piraneya kêm

dibêjinê ji bo qilleta (1013) medlûlê (1014) wan ku "'eşre" (1015) we ma dûnê "'eşeran" e (1016). îstî'mala (1017) wan di ma fewqê (1018) wan de mecaz e (1019) mu'htacê bi bal qerînê ye (1020). Ma 'edaê wan (1021) cem'u kisre (1022) dibêjinê ji bo kisreta medlûlê wan (1023) ku ma fewqê 'eşere ye (1024). îstî'mala wan di 'eşere we ma dûnê 'eşere da mecaz e mu'htacê bi bal qerînê ye.

Tecurr ul-îsme: (1025) "tecurru" 'amilê lefzî î qiyasî fi'la mudari' mebnî ye ji bo fa'ilê (1026) mewdû' e ji bo we'hdeta muennesê xaîbe (1027) di 'haletê ref'ê da. Lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku fa'il e ji bo "tecurru"wê. (1028) 'Amil di ref'a fa'ilî da me'hellen 'amilê lefzî î qiyasî ku "tecurru" ye. "El-îsm" îsmekî mufred î me'rîfe ye bi sebeb edatê te'rîfê; lefz mensûb nesbe bi fet'h e bê weku mef'ûlu bîhiyê serî'h e ji bo "tecerru"yê.
Tu bizan! Mef'ûlat (1029) pênc in: mef'ûlu mutleq (1030), mef'lu bîhî, (1031) we mef'ûlu fîhî (1032), we mef'ûlu lehu (1033), we mef'ûlu me'ehu (1034).

1013. qillet: hindik, kêm.
1014. medlûl: têgirtî, têxistî, keteber, bi berketî, yanî ji ber ku hejmareke hindik dikeve ber piraneyê loma jê re piraneya hindik tê gotin.
1015. 'eşere: deh
1016. ma dûnê 'eşere: bin dehan, yanî piraneya hindik ji dehan û berjêr di xwe de digre.
1017. îstî'mal: bikaranîn, xebitandin.
1018. ma fewq: raserî, mebest pê raserî dehan ye, ji dehan û hefraz.
1019. mecaz e: mînandî ye, yanî ne li gor qaîdeyê xwe tê.
1020. mu'htacê bi bal qerînê ve ye: dirûv û nîşanek divê ta ku ji bo raserî dehan bê bikaranîn.
1021. ma 'edaê wan: dervayî wanên me got.
1022. cem'u kisre: piraneya xilbeyî, yanî ji bilî vanên me gotî yên din giş piraneya xilbeyî ne.
1023. kisreta medlûlê wan: yanî hejmara ku di xwe de digrin pir e.
1024. ma fewqê 'eşere: raserî dehan, ji dehan û hefraz.
1025. Tecurr ul-îsme: navdêr bi zêr dike, digerîne nasdêr
1026. mebnî ye ji bo fa'ilê: angolebatî ye, çalak e (aktîv form)
1027. we'hdeta muennesê xaîbe: kesa sêyemîn
1028. tecurruwê: lêkera "teccuru" bi zêr digerîne û dike nasdêr, di çapekê de "tecurru yê" ye.
1029. mef'ûlat: piraneya mef'ûl yanî serve ye û pênc cure serve hene.
1030. mef'ûlu mutleq: serveyê eseyî, yê serbest.
1031. mef'ûlu bîhî: serveyê yekser
1032. mef'ûlu fîhî: serveyê neyekser
1033. mef'ûlu lehu: serveyê sedemî, yê hoyî
1034. mef'ûlu me'ehu: serveyê digelî/tebayî

Ne'hw (1035) derebtu zeyden we 'emren yewm el-cum'etî emam el-emîrî fî darîhî derben şedîden te´dîben lehu (1036).
Ev fi'l digel ma 'emîle fîhiyê (1037) xwe cumlekî fi'lî ye, me'helle merfû' ref'e bi demm e bê weku sîfet e ji bo "'hurûfun"ê. Lewra caiz e wesfa nekiran bi cumleê xeberiye (1038).
Feqet (1039) "fa" a (1040) fesîhî ye, mebniyê lefz el-fet'h e. "Qet" (1041) îsmek ji esma´ ul-ef'alê rafî'e ye, (1042) mebniyê lefz es-sukûn e. Me'helle merfû' ref'e bi demm e bê weku mubteda ye fa'ilê xwe (1043) tê de mustetir e bi îstîtareke wacib (1044) ku "ente" ye.
"Ente"(1045) mebniyê lefz ul-fet'h e me'helle merfû' ref'e bi demm e bê weku fa'il e ji bo "qet"ê, saddun mesedd el-xeber (1046) bi sebeb temambûna kelamê bi wê her wekî bi xeberê, (1047) yan la me'helle leha mîn el-e'rabî. "Ente" fa'ilê wê ye her wekî emrê ye (1048).

1035. ne'hw: mîna, weke, li vir mînak
1036. derebtu: min lêda, "dereb" lêker e "tu" pronava kesê/a yekemîn e û dibe kirde.
1036. Zeyden: navê lehengê çîrokên "Benî hîlaliyan" e û serveyê yekser e.
1036. we 'Emren: digel 'Emrê, ev jî navê lehengekî çîrokê ye û serveyê tebayî ye.
1036. yewm el-cum'etî: roja înê, ev mînaka serveyê neyekser e.
1036. emam el-Emîrî: li pêşberî mîr, ev jî mînaka serveyê neyekser e.
1036. fî darîhî: di hundurûyê wî de, ev jî mînaka serveyê neyekser e.
1036. derben şedîden: derbeke bi şid, lêdaneke tûj, ev mînaka serveyê eseyî (serbest) ye.
1036. te´dîben lehu: ji bo edeb, ji bo perwerdekarî, ev mînaka serveyê hoyî (sedemî) ye.
1037. ma 'emîle fîhî: yê ku pê têne tewandin, tewandî.
1038. cumleê xeberiye: hevokê gotinbêjî, hevokê gotinê (îddîa).
1039. feqet: bi tenê, tenê. tiq û tenê.
1040. fa: ango "fe"(ف)ya serê "feqet"ê.
1041. qet: bêjeya "qet"(قط) tenê, tucarî, qet.
1042. esma ul-ef'alê rafî'e: baneşanên kirdexwaz, di Erebî de hinek baneşan hene ku mîna lêkeran navdêrê pey xwe yan ji bo kirde (nominative), yan jî ji bo serve (accusative) ditewînin. Ev "qet" jî yek ji wanên ku ji bo kirde ditewîne, ango kirdexwaz e. (50)
1043. fa'ilê xwe: yanî kirdeyê wê tê de veşartiye, her çendî baneşan di zimanê Erebî de navdêr in jî lê ji ber ku wek lêkeran tewandinê dikin digel ku li pêş gotibû "serwer e" jî, dîsa rabû got: "kirdeyê wê", ne ku "pêgir (xeber)ê wê".
1044. îstîtareke wacib: veşartineke pêwîstî, bê ku divê veşartî be.
1045. ente: pronava kesê duyemîn e yanî tu.
1046. saddun mesedd el-xeber: yanî ketiye cihê pêgirî, çiku "qet" navdêr e û navdêr jî dibin serwer û pêgir ditewînin ne kirde.
1047. her wekî bi xeberê: yanî çawa hevok bi pêgirî temamdibe wusa bi "ente"ya veşartî jî temamdibe loma jî em dibên dikeve cihê wî.
1048. her wekî emrê: yanî mîna raweya fermanî netewangbar e lê kirde jê re tê ku li vir "ente" ye.

Yan me'helle mensûb nasbe bi fet'h e bê weku mef'ûlu mutleq e ji bo fi'leke muqedder. Teqdîra kelamê(1049) "îza cerret el-'hurûfu el-îsme el-wa'hîde (1050) fentehî (1051) mîn (1052) en terfe'e(1053) ew tensîbe (1054) ew teczîme," (1055) we mîn (1056) en tecurre bîha îsmeynî (1057) fe sa'îden (1058) bî dûnî tewssutî 'herf îl-'etfî. (1059) Li kullê teqdîran (1060) ceza uş-şert e jibo fi'l uş-şerteke muqedder.(1061) Fi'l uş-şert digel ceza uş-şertê cumlekî şertî ye îbtîdaî ye la me'helle leha mîn el-e'erabî.

We hiye seb'ete 'eşere 'herfen: (1062) "waw"a 'atîfe mebniyê lefz el-fet'h e. "Hiye" (1063) îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb demariyetê, demîr bariz e (1064) merfû' î munfesil e (1065), mebniyê lefz el-fet'h e me'helle merfû' ref'e bi demm e bê weku mubteda ye.

1049. **teqdîra kelamê**: yanî eslê hevokî, bingehagotinê.
1050. **iza**: çi dema, gava.
1050. **cerret**: bi zêr (genitive) tewand.
1050. **el-'hurûfu**: piraneya 'herf e, li vir mebest pê daçekên zêrger e.
1050. **el-îsme**: yanî nevdêr
1050. **el-wa'hîde**: bi tenê, yekî tenê
1050. **îza cerret el-'hurûfu el-îsme el-wa'hîde**: gava daçekên zêrger navekî tenê bi zêr tewandin.
1051. **fe-ntehî**: dur bibe, neke, jê bireve, meke.
1052. **mîn**: ji
1053. **en terfe'e**: ku tu bi pêş bitewînî.
1054. **ew tensîbe**: yan jî ku tu bi ziber bitewînî.
1055. **ew teczîme**: yan jî tu bi rawestek bitewînî.
1056. **we mîn**: û dîsa bireve ji.
1057. **en tecurre bîha îsmeynî**: ku tu pê du navdêran bi zêr bitewînî.
1058. **fe sa'îden**: yan zêdetir ji diduyan
1059. **bî dûnî tewessutî 'herfî el-'etfî**: bê ku gihanek têkeve navbera wan. yanî gava gihanek hebe çend navdêr jî bi yek daçekekê têne tewandin lê gava nebe nayêne tewandin.
1060. **li kullê teqdîran**: li gor her rewşê, yanî çi serwer û pêgir be, çi netewangbar be û çi serveyê serbest be her "feqet"a me mercîxwaz e ji bo merdêkereke nepenî.
1061. **fi'l uş-şerta muqedder**: merclêkera nepenî.
1062. **we hiye**: û ew
1062. **seb'ete'eşere**: hivdeh, deh û heft
1062. **'herfen**: tîp (pît) in
1063. **hiye**: pronava kesa sêyemîn e, hem ji bo piraneya tiştan jî tê bikaranîn yanî ew daçekên ku navdêran bi zêr ditewînin hivdeh heb in.
1064. **demîra bariz**: pronava eşkere
1065. **munfesil**: cuda, veqetandî.

"Seb'ete 'eşere" terkîbeke te'dadî ye (1066) tedemmunî ye (1067), herdu cuz´(1068) mebniyê lefz el-fet'h e, me'helle merfû' ref'e bi demm e bê weku xeber e ji bo mubtedaî.
"'herfen" îsmekî mufred î nekîre ye lefz mensûb nesbe bi fet'h e bê weku temyîz e ji bo "seb'ete 'eşere", 'amil di nesba temyîzî da lefzen 'amilê mumeyyezî ye (1069). Ev mubteda digel xeberê xwe cumlekî îsmî ye 'etfa bi ser cumleê îsmiyê muteqeddîme ve ye ku "en-new'ul-ewwelu"ye (1070). Yan îbtîdaî ye la me'helle leha mîn el-e'rabî.

El-bau li-lîlsaqî: (1071) "el-bau" îsmekî mufred î me'erîfe ye bi sebeb edatê te'rîfê, lewra fi'l û 'herf eger lefz ji wan murad(1072) bî îsm in, diseli'hin (1073) bibin mubteda û xeber, wekî niha "derebe fi'lu madîn" (1074) we "enne lit-te´kîdî" (1075) dibêjî; ey (1076) haza el-lefzu (1077) fi'lu madîn (1078) we haza el-lefzu (1079) lit-te´kîdî (1080). Lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku mubteda ye.
"Lî-lîlsaqî" (1081) carr û mecrûr zerfê musteqerr me'helle merfû' ref'e bi demm e bê weku xeber e ji bo mubtedaî. Ev mubteda digel xeberê xwe cumlekî îsmî ye, îbtîdaî ye la me'helle leha mîn el-e'erabî.

1066. terkîbeke te'dadî ye: hevdudaniyeke hejmarî ye, yanî du bêjeyên hejmarê ne û bi hev ve hatine danîn.
1067. tedemmunî ye: servegirtî, nixumandî, binvegirtî, yanî gihanekeke nepenî li wir heye û li gor wê dibe "seb'ete we 'eşere" deh û heft (hivdeh).
1068. cuz´: beş, perçe, par, yanî hem "seb'ete" û hem jî "eşere".
1069. mumeyyez: taybetgerandî, nemazedarbûyî.
1070. en-new'u el-ewwelu: ev hevok li pêş derbasbû, ango beşa yekemîn.
1071. el-bau li-lîlsaqî: daçeka zêrger, "bê" (ب) ji bo zeliqandin û pê ve girtin (girêdan) tê, yanî wê maneyê dide.
1072. murad: mebest, armanc, yanî ger mebest bi lêker û daçekan bêjeya wan be.
1073. diseli'hin: dibin, çêdibin, yanî karin bibin serwer û pêgir, çiku ew navdêr in.
1074. **derebe fi'lu madîn**: yanî bêjeya "derebe" lêkera dema raborî ye, li vir mebest bi "derebe" ew bêje ye ku bûye serwer (nomînal subjekt).
1075. enne lit- te´kîdî: yani bêjeya "enne" ji bo sexbirîtiyê û eseyîtiyê ye, li vir mebest bi "enne" bêje ye û loma jî bûye serwer.
1076. ey: yanî, ango, her wekî li pêş jî bihûrî ev peyvik ji zimanên îranî ketiye nav zimanê Erebî. Li vir şirovekarê me herdu hevokên bihûrî bi 'Erebî şirovedike û rewşa tewangeya wan dide nasîn.
1077. haza el-lefzu: ev bêje, ev peyv, mebest pê "derebe" ye.
1078. fi'lu madîn: lêkera raborî ye.
1079. we haza el-lefzu: û ev bêje, ev pevik, mebest pê "enne" ye.
1080. lît-te´kîdî: ji bo eseyîtî û sextiyê ye.
1081. lil-îlsaqî: ji bo zeliqandin û pê ve girtin e.

Yan "el-ba´u" îsmekî me'rife ye bi sebeb edatê te'rifê lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku bedel e ji ber me'hellê "seb'ete 'eş ere" (1082). Lewra tabi'ê mebniyê tabi'ê me'hellî ye (1083); bedel el-ba'd e (1084) ji ber kullê ve (1085). Yan mubteda ye xeber me'hzûf e (1086) ku "mînha" ye (1087), yan xeber e ji bo mubtedaekî me'hzûf ku "e'heduha" ye (1088), yan ba'duha" ye (1089). Yan mef'ûl e ji bo fi'leke meqedder (1090) ku "e'nî" ye (1091).
"Li-lîlsaqî" car û mecrûr zerfê musteqerr, me'helle mensûb yan merfû' bê weku sîfet e yan 'hal e ji bo "el-bau"yê bi te´wîla (1092) kewna (1093) wê (1094) musneden îleyhî (1095) yan bîhî (1096).
Ne'hw bîhî daun: (1097) "ne'hw" îsmekî nekîre ye, muxesses e bi sebeb îdafedana wê bi bal ma be'dê xwe ve ku cumle ye (1098). Lefz merfû' ref'e bi demm e bê weku xeber e ji bo mubtedaekî me'hzûf bi 'hezfeke caîzî (1099) ku "mîsaluhu" ye (1100); "mîsalu" mubteda ye "ha" (1101) mudafu îleyhî ye. Ev mubteda digel xeberê xwe cumlekî îsmî ye la me'helle leha mîn el-e'rabî.

1082. **me'hellê seb'ete 'eşere**: yanî bedêl e ji ber cihê "seb'ete 'eşere" ve çiku bêje bi xwe nayê tewandin û tewangeha wê ji bin ve ye.
1083. **lewra tabi'ê mebniyî tabi'ê me'hellî ye**: çiku gava bêjeyek bibe peyrew ji bêjeyeke netewangbar re ew li gor ketina ber cihê wê tê tewandin, loma jî nivîskar got: bedêl e ji ber cihê "seb'ete 'eşere" ve.
1084. **bedel el-be'd e**: berguhêrê hinî (hindeyî) ye, yanî yek yan jî hinek ji wan gişan.
1085. **kull**: hemû, giş, tev, yanî yek ji wan hivde daçekên zêrger "ba" (ب) e.
1086. **me'hzûf**: winda, çûyî, jêketî, yanî dibe ku "el-bau" serwer (nominal subjekt) be û pêgir (predikat)ê wê peyvikeke ne li ber çav, "mînha", be.
1087. **mînha**: jê, ji wan, mebest pê ji wan hivde daçekên zêrger e.
1088. **e'heduha**: yek ji wan hivde daçekan, yanî dibe ku "el-bau" bibe pêgir (predicative) ji bo serwerekî (nominal subjekt) ne li berçav ku "e'heduha" yan jî "ba'duha" ye.
1089. **ba'duha**: hinek ji wan / yek ji wan hivdeh daçekan
1090. **fi'leke muqedder**: lêkereke nepenî
1091. **e'nî**: yanî, mebest pê, ango ew lêker "e'nî" ye
1092. **te´wîl**: yanî ku bê guhertin, cihguher
1903. **kewn**: bûyîn, bûn
1094. **wê**: mebest pê "bî" ye, di hin çapan de "kewna baê" ye.
1095. **musneden îleyhî**: yê ku kiryar bi ser ve tê dayîn yanî serwer, kirdeyê navdêrî
1096. **bîhî**: mebest pê "musnedu bîhî" ye, ku kiryar pê digihîje serwerî, yanî pêgir.
1097. **ne'hw**: mîna, weke, bibal ve, mînak
1097. **bîhî**: pê ve, pê re
1097. **da´**: êş, jan
1097 **nehw bîhî daun**: mînaka wê ev hevokê ha ye, yanî êş pê ve ye, nexweş e
1098. **bi sebeb îdafedana wê bi bal ma be'dê xwe ve ku cumle ye**: ji ber ku bi bal wî hevokê piştxwe ve, ku "bihî daun" e, hatiye dayîn loma geriyaye taybetî.
1099. **caîzî**: herênebayî, nepêwîstî, ango kare bibe û kare nebe jî.
1100. **mîsaluhu**: mînaka wî, nimûça wî, mestereya wî, nimûneya wî.
1101. **ha**: yanî "hu"ya di paşya "mîsaluhu" de.

Tu bizan! Carna mubteda tête 'hezif kirin li nik qiyama (1102) qerîneyeke 'haliye (1103) yan meqaliye (1104) cewazen (1105) wekî niha di êre da (1106), yan wucûben wekî niha li nik qet'a ne'etê ji men'ûtî (1107). Bi ref'ê (1108) ji bo med'hê (1109) yan zemmê (1110) wekî niha dibêjin "el-'hemdu li-lahî ehl ul- 'hemdî" (1111), ey huwe ehl ul-'hemdî; we "e'ûzû bîl-lahî mîn eş-şeytanî er- recîmu (1112), ey huwe er-recîmu" (1113); li nik ê weku (1114) digerînin mexsûs bi med'hê yan bi zemmê (1115); xeber e ji bo mubtedakî me'hzûf ku "huwe" ye (1116). Yan "ne'hw" lefz mensûb nesbe bi fet'h e bê weku mef'ûlu mutleq e ji bo fi'leke muqedder ku "un'hw" ye (1117).

1102 qiyam: rabûn, li vir hebûn, çêbûn, peydabûn

1103. qerîneyeke 'halî ye: dirûv û nîşaneke rewşînî, yanî rewş dide zanîn ku mebest pê ew e, weke kesê ku li esmana li hîvê digere, bêje: " wa ye" yanî "hîv wa ye" li vir peyva "hîv" serwer e û winda ye ji lê ev yek ji cih û rewşê tê zanîn. (51)

1104 yan meqaliye: yanî dirûv û nîşaneke devikî mîna "men"a di "haza men " (ew kî ye) de. Eslê wê "haza men huwe", ew kî ye, "ye" huwe" serwer e û jê çûye lê peyvika "men" dide zanîn ku ew jê ketî ye. (51)

1105. cewazen: bi durustayî, erêbayî, yanî ne bi pêwîstî

1106. di êre da: di vir de, yanî di "bîhî daun" de

1107. qet': birîn, jêdûrkirin

1107. ne't: xuyadar, diyargîn

1107. menû't: diyargînkirî, xuyadarkirî, pesindayî

1107. li nik qet'a ne'tê ji men'ûtê: yanî gava xuyadar ji xuyadarkirî veqetiyayî û jê dûr be.

1108. bi ref'ê: yanî hingê bi nîşana kirdebariyê, ku li vir dengdara "u" ye, tê xwendin û wateya pesn yan jî avêtin û jê xeberdanê dide.

1109. med'h: pesn, pesindan, fort dan

1110. zemm: avêtin, jêxeberdan, kêmxistin, pîskirin, yanî gava diyargîn ji bo pesindan yan jî avêtin û jê xeberdanê ji diyargînkiriyê xwe bê qetandin hingê çûyîna serwerî pêwîst e.

1111. el-'hemdu lî-lahî: pesn û şêkr ji bo Yezdan e, ev mînaka pesnê ye.

1111. ehl ul-'hemdî: eslê wê "huwe ehl ul-'hemdî", her ew e laîqê (berbêjê) pesnê, li vir "huwe" ku serwer e çûye da ku nekeve navbera 'hemd (pesn) û li-lah (Xwedê). (51)

1112. e'ûzû billahî mîn eş-Şeytanî er-recîmu: ez xwe bi (alîkariya) Yezdan ji Ehremen (Şeytan)ê ricimandî (kevirkirî, kevirdayî) diparêzim, ev mînaka pîskirinê ye.

1113. ey huwe er- recîmu: yanî eslê wê ev bûye lê "huwe" jê çûye da ku nekeve navbera "Şeytan" û "recîm". (51)

1114. ê weku: yê ku, kesê ku

1115. mexsûs bi med'hê yan bi zemê: yanî li cem wê dîtina ku dibêjin "er- recîm" û "ehl ul 'hemd" bi pesindan û pîskirinê hatiye nemazekirin.

1116. huwe: pronava kesê sêyemîn e

1117. un'hw: raweya fermanî ye, yanî berê xwe bidê, pê ve here, mînak bide.

"Un'hw" 'amilê lefzî î qiyasî fi'la mudari' mebnî ye ji bo fa'ilê mewdû' e ji bo mutekellim û we'hdehu (1118) di 'haletê ref'ê da, teqdîr merfû' ref'e bi demm e 'amil di ref'a wê da teqdîren (1119) 'amilê mezkûrî ye (1120).

Tu bizan! Fi'l jî carna têtе 'hezifkirin cewazen(1121) wekî niha "Zeyden" (1122) dibêjî ji bo qailê(1123) weku dibêjî: " men edrebe"(1124). Yan wucûben wekî niha li nik babê ma edmere 'amîluhu (1125) 'ela şerîtetî et-tefsîrî (1126), wekî niha "îza es-semmau înşeqqet (1127) dibêjî. Hem carna cumle pêkve jî têtе 'hezifkirin, qaîm (1128) dibit di meqamê(1129) wî "ne'em" (1130), wekî niha "ne'em" dibjin di cewaba (1131) qaîlê weku dibjî: "e qame Zeydun" (1132) we "e Zeydun qaîmun" (1133).
"Ba" (1134) 'amilê lefzî î sema'î 'herfek ji hurûfê carr e, wadi'î wed'a wê kiriye (1135) ji bo îlsaqa (1136) 'heqîqî, mebniyê lefz el-kesr e.

1118. mutekellîmu we'hdehu: kesê/a yekemîn.
1119. teqdîren: nepenî, nitirandi, yanî tewangêrê nepenî.
1120. 'amilê mezkûrî: tewangdêrê ku li pêş di rîpelê 7'an de bihûrî.
1121. cewazen: bi erêbayî, herênebayî, ne bi pêwîstî, ango dibe ku bibe û dibe ku nebe jî.
1122. Zeyden: Zeyd navê lehengê navdar yê çirokên Benî Hilaliyan e,
1123. qaîl: kesê dibêje, şorkir, gotingo/bêj, peyvgo.
1124. men edrebe: wî li kê da? Yanî bersiva vê pirsê ku "Zeyden" e dibe serve ji lêkera "edrebe"ya jêketî re, eslê wê "edrebe Zeyden" e, wî li Zeydê da.
1125. bab: beş, babet, mijar.
1125. ma: ew, ewê, maê.
1125. edmere: diveşêre, dixe hundur, vedişêre.
1125. babê ma edmere 'amîluhu: ango di wê beşa ku tewangdêrê wan têtе veşartin.
1126. şerît: şert, merc,
1126. et-tefsîr: rave, şirove.
1126. 'ela şerîtetî et-tefsîrî: yanî bi şertê ku raveya wî hebe hingê lêker ji holê radibe.
1127. îza es-semau înşeqqet: gava esman ker bû, bû du şeq, li vir eslê wê "îza înşeqqet es-semau înşeqqet" lêkera pêşî ku "înşeqqet" e çûye, "înşeqqeta" dawî rave ye ji bo ya pêşî û wê bi me (xwendevanan) dide zanîn.
1128. qaîm: rabûn, li vir dikeve
1129. meqam: cih, war, dews, şûn
1130. ne'em: belê, erê, wusa ye, were ye, weha ye
1131. cewab: bersiv.
1132. e qame Zeydun: ma Zeyd rabûye? Ev mînak e ji bo hevokê lêkerî
1133. e Zeydun qaîmun: gelo Zeyd ji piya ye? Ev mînak e ji bo hevokê navdêrî. Gava bersiva van hevokan bi "ne'em"ê tê dayîn ev hevok jê dikevin.
1134. ba': tîpa "b" (ب)ya di bîhî (ابجد) de
1135. wadi'î wed'a wê kiriye: ango daniyanî ew daniye
1136. îlsaq: zeliqandin, pê ve girtin

"Ha"(1137) îsmekî mufred î me'rîfe ye bi sebeb demariyetê, demîr e, bariz e, mecrûr e, mettesil e, mebniyê lefz el-kesr e. Lewra mudmer bi î'tîbar (1138) ma qeblê xwe (1139) li du qisman e: muttesil (in) bê weku mu'htacê bi bal ma qeblê xwe ve ne (1140) di lefzê da; yan munfesil (in) ku bi xîlaf wê ye (1141). Bi î'tîbar e'erabê (1142) li sê qisman e: merfû' e we mensûb e we mecrûr e.

Herduwên ewwel(1143) muttesil jî dibin we munfesil jî dibin(1144); salis (1145) dê muttesil bit feqet (1146). Eqsamê (1147) wan geriyan pênc: (1148) merfû' î muttesil (1149) we munfesil (1150), we mensûb î muttesil (1151) we munfesil (1152), mecrûr î muttesil (1153) feqet (1154); fe'elyeke bî el-îstîxracî (1155).

1137. ha: pronava "hî"(ه) ya di bîhî de

1138. bi î'tîbar: li gor, bi awayê

1139. ma qeblê xwe: tiştê pêşiya xwe, bêjeya beriya xwe

1140. mu'htac: hewce, pêdivê

1140. mu'htacê bi bal ma qeblê xwe ve ne: yanî ew pronavên ku ji bo bilêvkirinê pêwîstiya wan bi bêjeya pêşiya wan ve hebe ew yên zeliqandî û pêvegirtî ne, mîna "tu"(تـ)ya di "derebtu" (ضربتُ) de . (52)

1141. bi xîlaf wê ye: ne wek wê ye ango pronavên veqetandî jî ewên ku pêwîstiya wan bi bêjeya pêşiya wan tine û bi serê xwe tên bilêvkirin, mîna "huwe" (هو), ente (أنتَ) û yên din. (52) Di çapekê de "bi xîlaf wan e" ye.

1142. bi î'tîbar e'erabê: yanî pronav li gor bêjeya pêşiya xwe du beş in lê li gor û bi awayê tewangeyê dibin sê beş.

1143. herduwên ewwel: ku yên kirdebar (nominative) û servebar (accusative) in.

1144. muttesil jî dibin we munfesil jî dibin: hem pêv û zeliqandî û hem jî cuda û veqetandî tên

1145. salis: sêyemîn, angoya sisiya ku ya xwedîbar (genitive) e.

1146. dê muttesil bit feqet: bi tenê zeliqandî û pêvegirtî tê

1147. eqsam: piraneya "qism" e yanî beş.

1148. eqsamê wan geriyan pênc: yanî hemû bûne pênc beş.

1149. merfû' î muttesil: 1 kirdebar (nomînative) û pêve wekî niha "elîf" (à=ا) a di dualan de, mînak: derebá (ضربا) wan lêda; "waw" (w=و) a di piraneyan de, mînak: derebû (ضربو) wan lêda û "t" (تـ) ya ku nîşana kesê duyemîn e, mînak: derebte (ضربتَ) te lêda. (52)

1150. we munfesil : 2 kirdebar û cuda ye wekî niha ena (أنا) ez, huwe (هو) ew.

1151. mensûb î muttesil: 3 servebar û pê ve wek "k"(ك) ya "derebeke" (ضربكَ) . (52)

1152. we munfesil: 4 servebar (accusative) î cuda ye, wekî niha pronava "iyyake" (إياكَ), ya te. (52)

1153. mecrûr î muttesil: 5 zêrbar û pêve wekî niha "ya"(ي)a di e'cebenî (أعجبني) de. (52)

1154. feqet: bi tenê, yanî pronava nasdêr bitenê zeliqandî (pêve) tê, cuda nayê.

1155. fe'eleyke : nexwe li ser te ye, "eleyke" yek ji baneşanan e lê fena lêkerekê kar dike.

1155. bî el-îstîxracî: bi deranînê ji hev qetandinê

1155. fe'eleyke bî el-îstîxracî: derxistin û rêzkirina wan jî li ser te

Me'helle mecrûrê bi "ba"ê cerre bi kesr e carr û mecrûr zerfê musteqerr, me'helle merfû' ref'e bi demm e bê weku xeber e ji bo mubtedaî. Muexxer (1156) û muqeddem bûye ji bo texsîsa (1157) "daun"a mubteda, (1158) wucûben (1159).

Temmet (1160)

Eşhedu en la îlahe îllellah(1161) we eşhedu enne seyyîdena Mu'hemmeden resûlullah (1162), sellellahu 'elyehî we sellem (1163).

1156. muexxer: paşvemayî, bipaşketî, lipeyhatî

1157. texsîs: taybetmendî, taybetbûn

1158. dauna mubteda: yanî ji bo ku bêjeya "daun"a serwer ya di "bîhî daun" de bike bêjeyeke taybetî. Di ya çapkirî de weha ye: "tes'hî'ha daun mubteda wucûben" lê xuyaye ku wê şaşiyek tê de hebe.

1159. wucûben: bi pêwîstî, bivê nevê

1160. temmet: qediya, temambû, kutabû, dawî hat

1161. eşhedu en la îlahe îllellah: ez bawer dikim û dibêjim (şahdeyî didim) ku ji Xwedê pêve tu Yezdanekî din tune (Xwedê bê hevrê û bê heval e).

1162. we eşhedu enne seyyîdena mu'hemmeden resûlullahî: û ez ji dil û can bawer dikim û dibêjim (şahdeyî didim, tesdîq û herê dikim) ku mezinê me, Muhemmed, qasid û pêxemberê Xwedê ye.

1163. sellellahu 'eleyhî we sellem: mîhrîvanî û aştiya Yezdan lê be.

TERMÊN RÊZIMANÎ

'aîd (عائد = relative/pronoun): pronava hevgirêdanê
'alimiyet (عالمية = intellect): zanayî, bihişî, bifehmî
'amil (عامل = regent, operative): tewangêr, tewangdêr
'amilê lefzî (عامل لفظي = explicit-/formel regent): tewngdêrê berbiçav
'amilê ma'newî (عامل معنوي = logical regent): tewangdêrê rêzimanî/wateyî
'amilê qiyasî (عامل قياسي = analogical regent): tewangdê pîvanbar /qiyaskirî,hevşêweyî
'amilê sema'î (عامل سمعي = analytical regent): tewangdêrê lêkolînnasî /bihîstî, lêkolînî, pevrêzanî (qaîdeyên rêzimanî ku bi daçek û lipeyhevrêzkirinê, çêdibin)
'atîfe (عاطفه = conjunction, copulative): gihanek
bariz (بارز = prominent): eşker e, diyar, xwuyakirî
bedel (بدل = permutative): nasniyar, berguhêr
bedel el-be'd (بدل البعض = permutative of the part): nasniyarê hindeyî, berguhêrê hinî
bedel el-îş tîmal (بدل أشتمال = permutative of implication): nasniyarê /berguhêrê vegirtî
bedel el-kull (بدل الكل = permutative of the whole): nasniyarê tevayî berguhêrê giştî
bed el el-xelet (بدل الغلط = permutative of the error): nasniyarê/berguhêrê şaş
besîtî (بسيطي = simple): sadekarî, hêsayî, sadeyî
bîna' (بناء = formation): avahî, avayî, avakirin, (rêzimanî) netewangbarî
caîz el-îstîtare (جائز الأستتاره = concievable latent): veşartina nepêwîstî
camid (جامد = aplastic, primitive): navdêrê sade/xwerû
carr (جار = preposition): zêrger, daçeka zêrger
cazim (جازم: جازمة = apocopative): rawestdêr, rawestgêr
cem' (جمع = plural): pirane, pirhejmar
cem' el-muzekker es-salim (جمع المذكر السالم = maskuline saund plural): piraneya nêr î tekûz (sererast)
cem' el-mukesser (جمع المكسر = broken plural): piraneya şikestî,
cem' el-muse'h'he'h (جمع المصحح = sound plural): piraneya tekûz/sererast

cem'ul-kisre (جمع الكثرة = plural of multitude): piraneya xilbeyî, ya ji dehan û hevraz
cem'ul-qîlle (جمع القلة = plural of paucity): piraneya hindik, ya ji dehan û berjêr/binê dehan
cerre (جرّ = genitive case): rewşa xweyîtî, nîşana rewş a xwedîkarî û ya zêrbariyê
cewab el-qesem (جواب القسم = complement of the oath): bersiva sondê, sond
cewab eş-şert (جواب الشرط = apodosis): bersiva egerê/mercê
cezaî (جزائي = conditional): mercîxwazî, egerxwazî, şert
ceza uş-şert (جزاء الشرط = apodosis): bersiva egerê/mercê
cezm (جزم = apocopate, jussive): rawestbarî
cezme (جزمة = apocopation): rawestek, seknok
cumle (جملة = sentence, proposition): hevok, cumle
cumleyê fi'liye (el-cumle el-fi'liye: الجملة الفعلية = verbal sentence): hevokê lêkerî
cumleyê îsmiye (el-cumle el-îsmiye: الجملة الأسمية = nominal sentence): hevokê navdêrî
cumleyê înşaî (el-cumle el-înşaiye: الجملة الانشائي = apotative sentence): hevokê daxwaziyê
cumleyê muste'nîfe (el-cumle el-muste'nîfe : الجملة المستأنفه = inceptive sentence): hevokê destpêkî
cumleyê şertiye (el-cumle eş-şertiye: الجملة الشرطية = conditional clause): hevokê mercî, hevokê egerî
cumleyê xeberiye (el-cumle el-xeberiye: الجملة الخبريه = enunciativity sentence): hevokê gotinî, hevokê gotinê/xeberbêjî
cumleyê zerfiye (el-cumle ez-zerfîye: الجملة الظرفية = local sentence): hevokê hokerî
cuz' (جزأ = part, member): beş, par, perçe, hin
dîlalet (دلالة = indication, leading): dixwedegirtin, danezanîn, îzbatkirin, diyarkirin, danensîn
demariyet (ضمارية = pronounation): pronavî, pronavîtî
demîr (ضمير = pronoun): pronav, cihnav
demîra bariz (ضمير بارز = pronominent): pironava eşkere/diyar
demîr eş-şe'n (ضمير الشأن = correlator, pronoun in the fact): pronava nenas, pronava rewşê
demîra munfesil (ضمير منفصل = detached/separate pronoun): pronava cuda/veqetandî
demîra muttesil (ضمير متصل = attached/connected pronoun,): pronava zeliqandî/pêve

demm/e (ضمة = the vowel "u"): pêş (dengdara kurt "u")
e'erab (أعراب = syntactic): tewang, tewange
e'erabê selase (أعراب ثلاثه =syntactic of the three case): hersê tewange-yên tevgerzaniyê (kirdebarî, servebarî, û zêrbarî yan jî xwedîkarî)
edat eş-şert(أدات الشرط = conditional particle): daçeka mercê
edat (elîf-lam) et-te'rîf (أدات التعريف: Ul= article): veqetandek, zêder, daçeka binavkirinê
ef'al et-tamme (أفعال التامة = the absolute/ complate verb): lêkerên têrbar
ef' elet-tefdîl (أفعل التفضيل = elative / comparative / superlative / adjektive): kemper, lapekemper, berhevdan
'elem (علم = proper name): serenav (bernas, navê kesî)
'elemiyet (علمية = being a proper name): serenavîtî, navê kesî
esl-î (أصل = rule, original form, radical): binyat, bingeh, esil, hîm, xîm
esma ul-ef'al/er-rafi'e (أسماء الأفعال / الرافعه = interjektions): baneşana kirde-xwaz
esma ul-îş arat (اسماء الأشارات = demonstrative pronoun): pronavên nîşandanê / pêşkar
et-tabi'/tabi' p. tewabi' (التابع / توابع = appositive, sequens, fellower): peyrew, peye
'etf (عطف = apposition): gihandin, girêdan, biservedan
'etfu beyan (عطف بيان = explantory apposition): beyankar, diyardêr
'ewamil/'amîle (عوامل ج عاملة = regent, operative) tewangdêr
fa'il (فاعل = subject) kirde
fesî'hî/ye (فصيحي/ فصيحيه =chestely, elequantly): petîdar/î, rewanbêjî, beyankar/î
feth/e (فتح/ فتحه = the vowel "e"): ziber (dengdara kurt "e")
fi'l (فعل = verb) lêker
fi'la 'am (فعل عام = general verb): lêkera giş tî/ tevahî (bûn, kirin, û yên din)
fi'l **el-madî** (فعل الماضي = past tense, perfect): lêkera dema raborî
fi'l el-mudari' (فعل المضارع = imperfect): lêkera dudemî, lêkera dema niha û ya dema bê
fi'l el-muqedder (فعل المقدر = implicit verb): lêkera nepenî
fi'l uş-şert (فعل الشرط = protatis sentece): merclêker, lêkera mercê
'hal (حال = denotative of state, condition): rewş, rewşîn, rewşdiyar, rewşdêr
'hereke (حركة = vowel): serûber, zêrûziber, dengdara kurt
'herf (حرف = consonant, letter, word, particle): tîp (pît), daçek, gihanek pêş- û pêş danî ,veqetandek, gihandek
'herf el-cerr (حرف الجر = preposition): daçeka zêrger/ bizêrkirinê/ zêrê

'herf el-'etf (حرف العطف = conjunction): gihanek
'herf el-îstîfham (حرف الاستفهام = interrogative particle): pronava pirsê
'herf el-mudare'e (حرف المضارعة = aoristic letter): pêşdaçek, pêşdanî
'herf en-nefî (حرف النفي = negative particle): pironava neyînîyê
'herf en-nîda (حرف النداء = vocative particle): daçeka hodengê/ bangê
'herf et-te'rîf (حرف التعريف = article): veqetandek, zêder
'hezf (حذف = elision, supression): çûyîn, ketin, windabûn
'hurûf el-muş ebbehe bî el-fi'l(حروف المشبهة بالفعل = conjuntions particles): gihandekên lêkerbar
'hukm (حكم = predicament, virtual): ferwerî, bandorî, (rêzimanî) biwar, rewş, war
îbtîdaî (إبتدائي = inceptive, inchoativel): destpêkî
îdafe (إضافة = prefixon, annexation, addition): lêzêdekirin, nasandin, pêvedanîn, tarîfkarî, îzafe
îfrad (إفراد = individuality, singular, number): tekaneyî, tekîtî
îlex (إلخ = etc/ et cetera): ta dawî
înşaî (إنشائي = originative, appotative): daxwazî, daxwazwerî, viyanî
îsm (إسم = noun, substantive): nav, navdêr
îsm înne (إسم إن = noun of inna, nominal subject): kirdeya navdêrî
îsmufa'il (إسم فاعل = active participle): parenga çalak, taybetnavê çalak
îsmumef'ûl (إسم مفعول = passive particple): parenga neçalak, taybetnavê neçalak
îstî'ane (إستعانه = help): alîkarî, alîkarîxwazî
'îwed (عوض = compensation, substitute): cihgir, ji pêl ve, şûngir
îxbarî (إخباري = enunciatory): xeberbêjî, gotinî, gotinbêjî
kelam (كلام = sentence, clause, prose): gotin, komek, nîvhevok, ş orkirin, axaftin, xeberdan, riste
kelîme (كلمة = word): bêje, peyv, gotin, kelîme
kesr (كسر = the vowel "i"): zêr (dengdara kurt "î,i")
la me'helle leha mînel-e'rab (لا محل لهامن الاعراب = indeclinable): nayê tewandin, netewangbar e
lefz (لفظ = expression, uttarence, word, explicit): gotin, peyv, bilêvkirin, zaravêtin
lefz el-fet'h (لفظ الفتح = explicit vowel "e", expression with vowel "e"): bi zîberê (dengdara kurt "e") tê bilêvkirinê
lefzî (لفظي = explicital, literal, expressed, formel): berbiçav, bêjewî
lexw (لغو = in operative, non-essential): tewş, bêkêr, bêrê, rabiwêj, rabûyî, netêrker, neçalak

mebnî (مبني = indeclinable, uninfected): netewangbar
mebnî el-'aridî (مبني العارضي = accidental of indeclinable): netewangbarê lêpeydabûyî
mebnî el-esl (مبني الأصل = essential of indeclinable): netewangbarê eslî û bingehî
mebnî fa'il (مبني فاعل = actîve form): lêkera lebatî, lêkera çalak
mebniyê lefz ed-demm (مبني لفظ الضم = indeclinable and utter with vowel "u"): netewangbar e û bi pêş (dengdara kurt"u") tê bilêvkirin
mebniyê lefz el-fet'h e (مبني لفظ الفتح = indeclinable and utter with vowel "e"): netewangbar e û bi zîberê ango "e" yê têbilêvkirin
mebniyê lefz el-kesr e (مبني لفظ الكسر = indeclinable and utter with vowel "i"): netewangbar e û bilêvkirina wî bi zêr (dengdara kurt "i, î") e
mebniyê lefz es-sikûn e (مبني لفظ السكون = indeclinable and utter with non vowel): netewangbar e û bi rawestekê tê bilêvkirin, (di dawiya wê de tîpa dengdar nayê û dema gotinê li ser tê rawetandin).
mebnî ul-fet'h (مبني الفتح = indeclinable with vowel "e") netewangbar e û bi zîberê, "e", tê bilêvkirin
mecmû' (مجموع = plural): pirane, pirhejmar
mecrûr (مجرور = noun in the genitive): navdêrê xwedîbar/ bi zêr
mecrûrî muttesil(مجرور متصل = attached pronoun in the genitive): pronava xwedîbar î pêve (zeliqandî)
meczûm (مجزوم = verb in the apocopate, jussive of the imperfect): lêkera bi rawestek
medmûm (مضموم = with vowel "u"): bi pêş (dengdara "u")
mef'ûl (مفعول = object): serve
mef'ûl bihî (serî'h)(مفعول به/ صريح =direct object): serveyê yekser
mef'ûl bihî xeyr serî'h (مفعول به غير صريح = indirect object): serveyê ne-yekser
mef'ûlu fihî=mefûlu bihî xeyrê serî'h(مفعول فيه=مفعول به غير صريح = adverbial object, accusative of the time and place): serveyê neyekser
mef'ûl lehu (مفعول له = causative object): serveyê hoyî, serveyê sedemî
mef'ûl me'ehu (مفعول معه = concomitate object): serveyê tebayî
mef'ûl mutleq (مفعول مطلق = absolute object): serveyê serbest, serveyê eseyî/ bêbend, serveyê misoger
me'helle (محل = place in inflection): şûn, dews, cih, bineh, ji bin ve
me'hellî (محلي = in place of, insteade of): şûnwarî, bingehî, binvehî, ji pêl, ji dêl ve,
me'hzûf (محذوف = curtailed): ketî, çûyî, jêketî, hekanî, winda, nexwuya
melfûz (ملفوظ = pronounced, ejected): ji dev avêtî, gotî, bilêvkirî
me'mûl (معمول = regimen): tewandî, tewangegir

me'na (معنى = idea, meaning, sense): wate, mane
me'newî (معنوي = ideal, logical): rêzimanî, wateyî
me'rîfe (معرفة = definate, determinate): binavkirî, naskirî, nasdar
mensûb (منصوب = noun in accusative, verb in subjunctive): bi nîşana servebariyê, ziberbar, bi ziber
mensûbat (منصوبات = subjunctive particle): ziberkêş
mensûb î munfesil (منصوب منفصل = detached pronoun in the accusative): pronava servebar î cuda (veqetandî)
